RENGARENK UMUTLAR DERNEĞİ

**Koma Nivîskaran**
Necla Korkmaz
Yeter Erel Tuma
Şerefhan Aydın
Alper Yalçın

**Weşan**
Rengarenk Umutlar Derneği
Nisan 2021, Diyarbakır

**Wergêr**
Serkan Delidere

**Weşanxane-Sêvirandin**
A Grafik Creative Solutions

Uluslararası İnsan Hakları Çerçevesine Uyumun İzlenmesi için ETKİNİZ AB PROGRAMI

"Ev weşan di çarçoveya "Bernameya YE Etkiniz" de, bi piştevaniya Yekitiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Hêviyên Rengîn(Rengareng Umutlar Derneği) berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake."

# ZAROKBÛNA LI NAVA SÛRAN

## Rapora Raçavkirina Mafê Lîstina Zarokan Li Nava Sûran

Ziya Gökalp Mah. Lale Sokak No: 14
Sur, Diyarbakır

info@rengarenkumutlar.org

www.rengarenkumutlar.org

+90 (543) 629 68 44

info@rengarenkumutlar.org
www.rengarenkumutlar.org
+90 (543) 629 68 44
@rengarenkumutla
rengarenkumutlardernegi
RengarenkUmutlarDernegi

# NAVEROK

SPASÎ ........ 8

PÊŞGOTIN ........ 10

DESTPÊK........ 12

1. METODOLOJIYA LÊKOLÎNÊ ........ 14

1.1. Armanc û Nimûneyên Lêkolînê ........ 14

1.2. Teknîkên Berhevkirina Daneyan û Analîza Wê ........ 15

1.3. Sînordarî û Zehmetiyên Lêkolînê ........ 16

2. WEKE MAFEKÎ ÇARÇOVEYA MAFÊ LÎSTINÊ,
WEKE HEMWELATIYEK ZAROK Û MAFÊ BAJAR........17

2.1. Prosesa Bipêşketina Mafên Zarokan ........17

2.1.1. Zarok û Mafê Bajêr ........ 18

2.2. Mafê Lîstinê Di Plansaziyên Stratejîk Ên Şaredariya
Navçeya Sûrê ya Diyarbekirê De ........23

2.3. Prosesa Veguherîna Bajariyî ya Li Nava Sûran Di Navbeyna
Salên 2010-2020an û Têkiliya Wê Ligel Mafê Lîstinê ........27

2.3.1. Di Konteksta Mafê Lîstinê De Nirxandina Plansaziyên Îmara Sûrê ........29

2.4. Rewşa Heyî Ya Parkên Lîstinê û Wesfên Wan ........33

2.4.1. Di Konteksta Mafên Zarokan De Nirxandina Parkên Zarokan Ên Li Nava Sûran........34

# NAVEROK


3. LI NAVA SÛRAN HALÊ LÎSTIKÊ ........ 44

3.1. Taybetmendiyên Demografîk Ên Beşdaran ........ 45

3.2. Mafê Lîstinê Li Malê ........ 48

3.3. Têkiliya Kolanan bi Mafên Lîstikê re bi Awayê Qada Giştî û Qada Cihî ........ 55

3.3.1.Nêzîkahîtêdanên Şêniyên Taxan ên derbarê Wê ku Kuçeyan bi Awayê Qada Lîstikê Bi Kar Tînin ........ 70

3.3.2. Nirxandina Qadên Lîstikê di Çarçoveya Zayendiya Civakî de ........ 72

3.3.3. Tiştê Li Taxa Xwe Herî Zêde Hez Jê Dikim ........ 74

3.3.4. Ku Min li Taxa Xwe Qadên Lîstikê Ava Bikirana ........ 76

ENCAM û PÊŞNIYAR ........ 80

BI FOTOYAN QADÊN LÎSTINA ZAROKAN LI NAVA SÛRAN: Park û Kuçe ........ 85

PÊVEK ........ 90

ÇAVKANÎ ........ 95

Çavkaniyên Elektronîk ........ 96

# LÎSTEYA TABLOYAN


Tabloya 1. Tabloya analîzê ya rapora plansazî û çalakiyên stratejîk ........ 26

Tabloya 2. Tabloya lêkolînê ya qadên şênkahî yên aktîf û komên lîstikê yên zarokan li nava sûran ........ 31

Tabloya 3. Tabloya lêkolîna qadî ya pêşdibistanan, tesîsên civakî û çandî ........ 32

Tabloya 4. Tabloya taxên ku beşdarên anketê lê dijîn ........ 45

Tabloya 5. Tabloya zayendiyê ya zarokên beşdarî anketê bûne ........ 45

Tabloya 6. Tabloya zayendiyê ya beşdarên mulaqatê ........ 45

Tabloya 7. Tabloya taxên ku beşdarên mulaqatê lê dijîn ........ 46

Tabloya 8. Dabeşiya zayendî li gorî temenê beşdarên anketê ........ 46

Tabloya 9. Rewşa perwerdeyê ya beşdarên anketê ........ 47

Tabloya 10. Agahiyên şêniyên malê yên beşdarên anketê ........ 47

Tabloya 11. Agahiya rewşa berastengiyê ya beşdaran ........ 48

Tabloya 12. Agahiya nasnameya etnîk a beşdarên anketê ........ 48

Tabloya 13. Agahiya bê ka li malê çawa wext derbas dikin ........ 49

Tabloya 14. Agahî li ser ciyê lîstikên li malê ........ 49

Tabloya 15. Sedemên nelîstina lîstikan li malê ........ 49

Tabloya 16. Agahiya bê ka li malê herî zêde bi kî re wext derbas dikin ........ 51

Tabloya 17. Agahî li ser wextderbaskirina dê û bavan bi zarokan re ........ 51

Tabloya 18. Agahiya lîstik û pêlîstokên ku herî zêde dilîzin ........ 52

Tabloya 19. Dabeşiya çeprast li gorî zayendiyê ya lîstik û pêlîstokên ku herî zêde tên bikaranîn ........ 53

Tabloya 20. Agahiya bê ka li malê gava lîstikê dilîzin qeza derbas dikin an na ........ 53

Tabloya 21. Statîstîka qezayên nav malê yên zarokan ........ 55

Tabloya 22. Tabloya derbarê parkên li kolanan ........ 55

Tabloya 23. Tabloya komên lîstikê li yên parkan ........ 56

Tabloya 24. Tabloya derbarê bikaranîna parkan de ... 56
Tabloya 25. Sedema bikarneanîna parkan ... 56
Tabloya 26. Tabloya wextderbaskirinê li derve ... 57
Tabloya 27. Tabloya derbarê wextderbaskirina li derve de ... 57
Tabloya 28. Tabloya derbarê qadên ajotina pisqilêtan de ... 57
Tabloya 29. Tabloya çeprast a wextê li derve ya li gor zayendê ... 58
Tabloya 30. Sedemên nekarîna derbaskirina wext li derve ... 58
Tabloya 31. Tabloya çeprast a wextderbasnekirina li derve li gorî zayendiyê ... 59
Tabloya 32. Tu di kîjan saetan de derdikevî derve ... 62
Tabloya 33. Tabloya tu tim li vir dilîstî ... 63
Tabloya 34. Tabloya sedemên guherîna qadên lîstikê ... 63
Tabloya 35. Tabloya qadên ku lê dilîstin ... 64
Tabloya 36. Tabloya bê ka gava li derve lîstikê dilîzin qeza derbas dikin an na ... 66
Tabloya 37. Tabloya cureyên qezayan ku li derve dikin ... 68
Tabloya 38. Tabloya bê ka li taxê qurs/atolye hene yan na ... 68
Tabloya 39. Tabloya qurs/atolyeyên heyî ... 68
Tabloya 40. Tabloya beşdariya di qurs/atolyeyan ... 69
Tabloya 41. Mekanîzmayên gilîkirinê ... 69
Tabloya 42. Tabloya tiştên ku li taxê herî zêde hez jê dikim ... 75
Tabloya 43. Nifûsa tevahî ya li gorî salan a taxên nava sûran ... 90
Tabloya 44. Lîsteya kontrolê ya qadên lîstikê ... 91

# LÎSTEYA FOTOYAN

Fotoyê 1. Nêzîkahiya parkan bo kolanên sereke ....36
Fotoyê 2. Nebûna şirîtên ewlehiyê û bariyeran li qadên xeternak ....37
Fotoyê 3. Rîskên ji ber tesisata elektrîkê ....38
Fotoyê 4. Deverên ku talûkeya wan a hilweşînê hene ....39
Fotoyê 5. Xwegihandina pêdiviyên bingehîn li parkan ....40
Fotoyê 6. Parkên li qadên şênkahî ....40
Fotoyê 7. Rîsk û talûkeyên ku li qadên lîstikê hatine tespîtkirin ....42
Fotoyê 8. Koma lîstikê ya zarokan a Taxa Camii Kebirê ....85
Fotoyê 9. Koma lîstikê ya zarokan a İskender Paşayê ....85
Fotoyê 10. Parka lîstikê ya Taxa Dabanoğluyê ....86
Fotoyê 11. Parka lîstikê ya Taxa Ali Paşayê ....86
Fotoyê 12. Parka lîstikê ya Taxa Melik Ahmetê ....87
Fotoyê 13. Parka lîstikê ya Taxa Lalebeyê ....87
Fotoyê 14. Kuçeyek li Taxa Dabanoğluyê ....88
Fotoyê 15. Kuçeyek li Taxa Ziya Gökalpê ....88
Fotoyê 16. Kuçeyek li Taxa İskender Paşayê ....89

# LÎSTEYA XERÎTEYAN

Xerîteya 1. Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê ya ku piştî pevçûnan ji bo seynteran(qereqolan) hatine revîzekirin ....92
Xerîteya 2. Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê - Xerîteya qadên şênkahî ....93
Xerîteya 3. Xerîteya taxên nava sûran ....94

## SPASÎ

Ev rapora me ya ku li mafê lîstinê dikole, bi kedeke kolektîf hatiye amadekirin. Fikra xebata di vê qadê de helbet piştî pevçûnên salên 2015-2016an ên li nava sûran, ji ber binpêkirina mafên zarokan derketiye. Ji van, yek ji mafên ku herî zêde kes xwe lê nake xweyî jî mafê lîstinê ye. Ewilî em spasiyên xwe pêşkêşî E.Ezra Elbistana hevala xwe ya gelek hêja dikin ku fikra vê xebatê bi pêş xist û kir proje û kir ku ev xebat pêk were û em spasiyên xwe pêşkêşî Hatice Kapusuza xoşewîst dikin ku ligel kar û barên xwe yên zêde wext veqetand û bi pêşniyar û şîroveyên xwe yên li ser raporê alîkariya xebatê kir.

Di prosesa pandemiyê de ku tesîreke neyînî li jiyana hemû insanan kir, helbet vebijarkek ew bû ku em vê xebatê bi hin bernîşaneyan û bi belgeyên dîtbarî bir ê ve bibin –ku xebata belgekirina dîtbarî jî hat kirin-. Lê hingê dê bêyî bihîstina dengê kesên ku van pirsgirêkan dijîn yanê bêyî bihîstina dengê zarokan xebat bihata kirin, dê vê yekê jî bikira ku xebat kêm bimîne û dê dengê subjeyên xwedî maf ku esas divê bipeyivin, nehata bihîstin. Loma me rîskên tenduristiyê dan ber çavên xwe û bi hemû tevdîrên xwe xebata qadî meşand. Em ji ber keda wan û fedakariya wan spasiyên xwe pêşkêşî Ciwan Aytaş, Duriye Erel, Asiye Turfan, Gulan Yaklav, Firdevs Yılmaz, Yusuf Ekin, Derya Akman, Dilan Erel, Bawer Arslan, Nurşin Arslaner, Sultan Bilen, Hasan Güler û Rohat Kaya dikin ku di xebatên qadî de cî girtin. Spas ji Dilan Taşdemirê û kedkarên Komeleya Hêviyên Rengîn(Rengarenk Umutlar Derneği) re ku di her asta xebatê de destek û ked dan.

Di çarçoveya mafê lîstinê yê zarokan de, di navbera salên 2010-2020an de, me çapemeniyê sehî kir lê ji bo hin salan em negihan daneyên li ser qezayên zarokan ên di dema lîstina li malê û li derve de. Weqfa Koç û Alîkariya Insanî(GİYAV) van daneyan bi me re par kir. Em spasiya wan dikin. Di vê prosesa pandemiyê de zarokan hevdîtina ligel me qebûl kirin, formên anketê bi awayeke samîmî dagirtin, ji me re wext veqetandin û beşdarî koma me ya nîvend bûn; dê û bavan zehmetî û tecrubeyên xwe yên li ser deverên lîstina zarokan a li malan û li derve bi me re par kirin. Em spasiyên xwe pêşkêşî wan dikin. Muxtarên taxan agahiyên xwe yên li ser qadên zarokan ên li taxên xwe bi me re par kirin. Em spasiya wan dikin. Muxtarê Taxa Ziya Gökalpê Muhsin Sanay ji me re bû referans ku em bi hêsanî xwe bigihînin muxtarên taxên dî. Em spasiyeke taybet jî ji bo wî pêşkêş dikin.



## PÊŞGOTIN

> "Lîstikên zarokan kakileke jiyanê ne. Hemû insan bi wan digihên, mezin dibin. Behreyên herî xweş û erênî yên insanan bi wan berz dibin."
> Friedrich Fröbel

Lîstik hêmayeke jêneger e bo pêşketina fizîkî, civakî, hişî û hestiyarî ya zarokan. Lîstik weke xwarin, tenduristî, vehewîn û perwerdeyê yek ji pêdiviyên herî bingehîn ên zarokan e, ev maf bi qanûnan jî di bin temînatê de ye. Peymana Li Ser Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî di xala 31. de mafê lîstikê yê zarokan pênase dike. Bi vê peymanê hatiye teahûdkirin ku mafê lîstinê yê zarokan li gorî polîtîka, bername û xizmetên welatekî dê bê parastin û bipêşxistin.

Bi çarçoveya ku peymanê daniye, wê yekê tîne bîra meriv ku ji bo mafê lîstinê divê plansaziyên bajaran jî li gorî zarokan bên danîn. Yekem şertê ewil ê vê yekê jî ew e ku divê zarok ne weke "mezinên siberojan", weke hemwelatiyên îroyîn bêne dîtin. Bi vê rastiya ku zarok hemwelatî ne, divê zarok di mekanîzmayên biryardanê de cî bigirin, di warê bajarên xwe de xwedî gotin bin û bibin subje ku karibin jiyanê bi hev re biafirînin.

Mafê lîstinê, ji bo jiyana li bajarvan a zarokan xwedî girîngiyeke mezin e. Lîstina zarokan yek ji gavên ewil e ji bo civakîbûna wan. Lîstik di warê hînbûnê û bipêşxistina têkiliyên civakî de alîkariya wan dike. Lîstina bi lîstikan, zarokan ji jiyanê re amade dike, wan hînî serkeftin û binkeftinê, têkbirin û têkçûnê dike, wan hîn dike ku gava di heyata wan de pirsgirêkek derkeve pêşberî wan karibin çareser bikin. Zarok gava bi lîstikê dilîzin xwe kifş dikin û karin taybetmendiyên xwe yên şexsî di lîstikê de nîşan bidin. Ligel vê rêgezên lîstikê, alavên ku têne bikaranîn, rêbaz û hwd. derheqê taybetmendiyên çandî yên civaka zarokan de agahî didin. Herman Nohl jî diyar dike ku lîstik jiyana derûnî ya zarokan e û çavkaniya hemû çandê ye û pê re bale dikêşe ser hevkarîgeriya bîra kolektîf û lîstikê. (wer. Temur: 2017)

Zarokatiyeke şad, yekser bi lîstina lîstikan ve girêdayî ye. Divê neyê jibîrkirin ku ferdên ku bi lîstina lîstikan zarokatiyeke şad derbas kirine, dê di dahatûyê de bibin insanên jêhatî ku karibin probleman çareser bikin û behreya wan a jiyanî bipêşketî be. Mixabin zarok nikarin bi awayeke wekhev xwe bigihînin fersendan. Hin zarok ji ber bilindbûna standardên jiyanî karin bi rehetî pêdiviyên xwe yên di warê lîstinê de bi cî bînin, lê hin zarok jî ji ber ku mercên welat an herêmên wan ne durist in û guncav nîn in, nikarin têra xwe ji mafê lîstinê fêde wergirin. Zarok xwedî behre ne ku karin li her derê û di her mercî de lîstikan baifirînin. Lê pêkanîna ciyê lîstinê yê biewle ewilî bi bicîanîna berpirsiyariyên dewletan, paşê jî yên mezinan pêkan e. Ji bo dabînkirina derfetên lîstinê û bipêşxistina van derfetan ji zarokan re, ligel berpirsiyariyên hikûmetan rolên girîng ên hemû pardarên weke rêxistinên pîşeyî û saziyên sivîl ku têkelî zarokan dibin, hene.

Lîstik weke xwarin, tenduristî, vehewîn û perwerdeyê yek ji pêdiviyên herî bingehîn ên zarokan e, ev maf bi qanûnan jî di bin temînatê de ye.

Yên di dema krîzan de bi awayê herî giran tesîr li wan dibin, zarok in. Lê yên ku herî kêm destek distînin jî zarok in. Fona Zarokan a Neteweyên Yekbûyî1 (UNICEF), diyar dike ku li cîhanê 41 milyon zarok hene ku ji neçarî di rewşên pevçûn, afat û rewşên derasayî yên din de dijîn û muhtacî alîkariya insanî ne. Di rewşên pevçûnê de, di afatên xwezayî û yên ji ber insanan de mafê lîstinê yê zarokan bi piranî nayê dîtin; lêbelê zarokên arasteyî trawmayê bûne ew kes in ku herî zêde pêdiviya wan bi lîstinê heye. Gelek saziyên alîkariyê, alîkariya insanî ya bingehîn di warê vehewîn û xwarinê de dikin, lê lîstin û perwerde bi piranî têne paşguhkirin. Em weke Komeleya Hêviyên Rengîn(Rengarenk Umutlar Derneği), ji bo zarokên ku di salên 2015 û 2016an de ji pevçûnên çekdarî yên giran ên li navçeya Sûra Diyarbekirê bibandor bûne, li ser esasên mafên zarokan; ji bo bipêşxistina behreya wan a jiyanî, ji bo bileztirkirina prosesa başbûna wan û ji bo bihêzkirina wan li hemberî hemû zehmetiyên jiyanî di hemû bernameyên xwe de lîstikê weke amûr bi kar tînin. Em weke komele lîstina bi lîstikan a zarokan weke maf, weke berpisiyarî qebûl dikin. Ji bo destekkirina bipêşketina zarokan, em dikin ku zarok bigihên deverên lîstinê yên biewle û lîstikên biewle. Çimkî em hayedar in ku heke zarok ji mafê lîstinê mehrûm bimînin, dê encamên cidî derkevin holê. Bi hêviya dinyayek ku zarok, zarokatiya xwe bi awayê zarokane lê bijîn...

**Komeleya Hêviyên Rengîn**
**(Rengârenk Umutlar Derneği)**




1-) https://www.unicef.org/turkeybas%C4%B1n b%C3%BCltenleri/unicef-%C3%A7at%C4%B1%C5%9Fma-ve-afetten-etkilenen-41-milyon-%C3%A7ocuki%C3%A7in-39-milyar-dolarl%C4%B1k-acil

## DESTPÊK

Mafê lîstinê ku me di konteksta mafên zarokan de hilda dest, mafeke gerdûnî ye ku ji bo hemû zarokan hatiye danîn. Lîstik ji bo bipêşketina hişî, fizîkî, hestiyarî û civakî ya zarokan xwedî roleke girîng e. Di heman deme de lîstik dike ku behreya wan a jiyanî û afirîneriya wan bi pêş bikeve. Dereli û Uludağ(2013), diyar kirine ku zarok bi rêya lîstikê beşdarî jiyana rojane dibin, lîstik dike ku zarok di dahatûya xwe de karibin bersiva daxwazên derdora xwe bidin û taybetmendiyên weke verastkirina hestan, beralîkirina stresê, xweparastinê bi lîstikê bi dest bixin.

Pratîka lîstina bi lîstikan; li gorî herêma cografîk, binyada olî, aborî û çandî ya civakên zarokan diguhere. Zarok him pêwendî û behreyên xwe, him jî dorhêla civakî û çandî û rolên civakî bi rêya lîstikê hîn dibin. Lê bipêşketina van, bi deverên hêja yên lîstinê û xwegihandina van pêkan e. Deverên lîstinê yên bo zarokan divê bipêşketina zarokan destek bikin û divê wisa bên sêwirandin ku bi awayê herî kêm bibin sebebên qezayan û birînbûnê. Divê deverên lîstinê ji bo her grubên temenan, li gorî pêdiviyên bipêşketina wan bên veavakirin. Deverên lîstinê yên ku bi awayeke baş hatine sêwirandin, jig elek aliyan ve karin fêde bigihînin zarokan. Zarok li wir hîn dibin ku bedenên xwe bi kar bînin, talûkeyan nas bikin û wan talûkeyan û tirsên xwe beralî bikin(Yılmaz û Bulur: 2002).



Lîstik weke amûrek ku bipêşketina zarokan destek dikin, bi pêşveçûna temen re him ji aliyê mekan ve, him jî ji aliyê çawaniyê ve vediguhere û dibe curbecur. Meriv kare qad û deverên lîstika zarokan wiha rêz bike; mal, kuçe, park, navendên danûstendinê ku çanda şahiyê bi mekanên girtî têne sînordarkirin û lîstikên ferazî ku roja îroyîn gelek zêde tên daxwazkirin. Lê her zarok bi awayeke wekhev nikarin xwe bigihînin deverên lîstinê. Di vî warî de astengiya ewilîn, mercên sosyo-ekonomîk in, bi gotineke zelaltir xizanî vê wekheviyê têk dibe. Ligel vê yekê, heke newekheviya di warê xwegihandina deverên lîstinê yên biqelîte li herêmekê pêk bê, ev ji aliyeke din ve sedemeke polîtîk jî nîşan dide.



Lîstik ji bo bipêşketina hişî, fizîkî, hestiyarî û civakî ya zarokan xwedî roleke girîng e. Di heman deme de lîstik dike ku behreya wan a jiyanî û afirîneriya wan bi pêş bikeve.

Em di vê xebatê de li mafê lîstinê yê zarokên ku li herêma Sûrê dijîn, dikolin; ligel tespîta rewşa heyî ya deverên lîstika zarokan, em dêhna xwe didin prosesên veguherîna radîkal a navbeyna salên 2010-2020an a herêma nava sûran, em dêhna xwe didin mercên fizîkî yên navçeyê, em dêhna xwe didin taybetmendiyên sosyo-ekonomîk û çandî yên navçeyê û em vana bi daneyên ku me li qadê bi dest xistiye, dinirxînin. Ev rapora ku li mafê lîstinê yê zarokên nava sûran dikole, ji çar beşên sereke pêk tê. Di beşa ewil de metodolojiya lêkolînê heye. Di vê beşê de; agahiyên weke rêbazên lêkolînê, hilbijartina nimûneyan, sînordarî, teknîkên analîzkirina daneyan cî digirin. Di beşa duyem de, çarçoveya teorîk a lêkolînê cî digire. Çarçoveya mafê lîstinê girêdayî mafên zarokan, prosesên sepandina li Tirkiyeyê û nimûneyên li dinyayê cî digirin. Planên stratejik û raporên xebatê yên Şaredariya Sûrê ku herêma nava sûran dihebîne û nimûneya xebatê ye, bernîşaneyên ku girêdayî mafên zarokan hatine diyarkirin; qadên lîstina zarokan, xebatên çandî, perwerdeyî û civakî yên bo zarokan hatine lêkolînkirin. Di bin sernivîseke din a heman beşê de jî prosesên veguherîna bajariyî yên ku di navbeyna salên 2010-2020an de pêk hatiye, plansaziya îmarê ya bajêr; tevahiya qadên şênkahî li nava sûran li gorî mewzûatê hatin berawirdîkirin. Ligel vê hatiye nirxandin ku ka piştî pevçûnên çekdarî yên navbeyna salên 2015-2016an avahiyên ku hatine xerakirin tesîreke çawa li qadên lîstina zarokan kirine. Dîsa bi îlhama standardên Entîtuya Standardên Tirk ên bi navê “Amûrên Qadên Lîstinê û Verastkirina Zemînê”, me hin bernîşane diyar kirin û qelîteya qadên lîstinê tespît kirin. Di beşa sêyem de; pirsgirêkên me yên lêkolînê, daneyên ku me ji formên anket û mulaqatan bi dest xist, grafîk û mulaqat hatine şîrovekirin. Di beşa dawîn de jî; bi rêya encamên xebatên qadî, pêşniyarin ji bo hemû aktorên di warê mafê lîstinê de hatine pêşkêşkirin.



# 1. METODOLOJIYA LÊKOLÎNÊ

Ev rapora ku “Mafê lîstinê yê zarokan li nava sûran” hildaye dest û ji aliyê Komeleya Hêviyên Rengîn(Renganrenk Umutlar Derneği) ve hatiye amadekirin, ji aliyê bernameya hîbeyê ya Yekîtiya Ewropayê ya ETKİNİZê ve hatiye destekkirin. Armanca xebatê ew e ku piştî midaxileyên pey veguherîna bajariyî û pevçûnên çekdarî yên navbeyna salên 2010-2020an ên li Sûra navçeya navendî ya Diyarbekirê, li gihîna zarokan bo mafê lîstinê, qelîteya qadên lîstinê û besbûna wan bikole. Di vê çarçoveyê de taxên nava sûran, ji aliyên qadên lîstina zarokan ve, bi rewşa civakî û mekanî/fizîkî hatine nirxandin.

Bi vê xebatê armanc ew e ku nemaze rêvebiriyên mehelî û wezareta hawîrdor û bajarvaniyê gava bajaran xerakirin an avakirin bila tesîrên van prosesan li ser zarokan paşguh nekin û bila di avakirina bajaran de polîtîkayên piştgir bo zarokan bisepînin, tê payîn ku ev xebat hindik be jî di vî warî de alîkariya van polîtîkayan bike.

## 1.1. Armanc û Nimûneyên Lêkolînê

Di vê xebata ku mafê lîstinê raçav kiriye de armanc ew e ku bi dane û bernîşaneyên bidestketî bê nîşandan ku:

- Ka ji bo zarokên nava sûran li malan qadên lîstinê hene yan na;
- Ka li taxên wan park û komên wan ên lîstikê hene yan na;
- Ka komên lîstinê li gorî standardên diyarkirî hatine avakirin an na;
- Ka qadên lîstinê kîjan rîskan dihundirînin;
- Ka tax an jî kuçe ji bo zarokan kîjan rîskan dihundirînin;
- Ka qadên lîstinê li gorî wekheviya zayendiya civakî û kategoriyên temenan in an na;
- Ka rayedaran berpirsiyariyên xwe yên di warê qadên lîstinan de bi cî anîne yan na.

Gerdûna lêkolînê ew tax in ku li Sûra navçeya navendî ya Diyarbekirê di navbeyna salên 2010-2020an de, piştî projeyên veguherîna bajariyî yên herêma nava sûran û piştî pevçûnên çekdarî yên navbeyna salên 2015-2016an hatin xerakirin û bi biryara îstîmlaqkirina lezgîn hatin valakirin, loma polîtîkayên bêinsanhiştinê tesîr li wan kir. Nimûneyên lêkolînê jî 115 zarok, 25 dê û bav, 4 muxtarên taxan, muxtarek ku hatiye hilbijartin lê ji peywir hatiye bidûrxistin û ezayeke muxtar ku ji 7 taxên (Ali Paşa, Lalebey, Cevat Paşa, İskender Paşa, Dabanoğlu, Ziya Gökalp, Cami Kebir) di bin tesîra pevçûnên çekdarî de mane.

Di xebata Raçavkirina Mafê Lîstinê de him teknîkên lêkolînê yên çendaniyî, him jî yên çawaniyî hatine bikaranîn. Qada lêkolînê bi 3 qonaxên cihê hatiye pêkanîn. Anketên ku bi 115 zarokan re hatine kirin, bi rêya nimûneyên tesadufî hatine hilbijartin. Di xebata koma nîvend a ligel 13 zarokan jî esas beşdariya bi dilxwazî bûye. Hevdîtinên bi kûrahî yên ligel 25

dê û bavan jî, bi rêya nimûneyên giloka berfê hatine diyarkirin. Di hevdîtinên bi kûrahî yên ligel 5 muxtar û ezayeke muxtar de jî rêbaza armancî hatiye bikaranîn.

Xebatên qadî di navbeyna tarîxên 04.02.2021-03.03.2021 de hatine kirin. Kesên ku di xebatên qadî de cî girtin, dilxwazên xwedî tecrube û pisporên qadê bûn ku berê di xebatên qadî yên Komeleya Hêviyên Rengîn(Rengarenk Umutlar Derneği) de cî girtibûn.

## 1.2. Teknîkên Berhevkirina Daneyan û Analîza Wê

Xebatên qadî ligel 115 zarokan bi formeke ankete ya ji 46 pirsan, ligel 25 dê û bavan bi mulaqateke ji 15 pirsên nîv-vesazkirî; ligel 6 muxtarên taxan bi mulqateke nîv-vesazkirî ya ji 7 pirsan û bi du xebatên komî yên nîvend hatine kirin. Forma ankete û pirsên bo hevdîtinên bi kûrahî, li ser xeta problemên bingehîn ên lêkolînê teşe girtine. Xebata ankete ligel zarokên bi temen 8-15 hatiye kirin. Di xebata ankete ya ligel zarokan de, di hilbijartina nimûneyan de girîngî pê hatiye dayîn ku zarok ji zayend, temen, taybetmendiyên fizîkî(bipêşketina cihê) û nasnameyên etnîk ên cuda bin. Her çiqas di hilbijartina nimûneyan de bi taybetî wekheviya zayendî girîng hatibe dîtin jî him ji ber pandemiyê, him jî ji ber qadên lîstinê yên li taxan asta wekheviyê ya daxwazkirî pêk nehatiye. Di mulaqatên ligel dê û bavan de jî, di serdanên malan de bi piranî dê li mal bûne, loma wekheviya zayendî pêk nehatiye. Ji nav zarokên ku ligel wan anket hatî kirin û temenên wan di navbeyna 12-15an de bûne, 13 zarokên dilxwaz hatine tespîtkirin(6 zarokên qîzîn, 7 zarokên lawîn), li avahiya komeleyê bêyî ku tenduristiya wan bikeve rîskê, li qadeke ewle, 2 xebatên komî yên nîvend ên cihê hatine meşandin. Li taxên ku hevdîtin lê pêk hatine, me xwe gihandiye muxtarên taxan; 5 muxtaran hevdîtinê qebûl kirine, li taxekê em negihane muxtar lê me ligel ezayê wî hevdîtinê kiriye, li taxekê jî muxtar ji ber pirsgirêkên xwe yên tenduristiyê hevdîtinê qebûl nekiriye û em negihane ezayên wî jî.

Daneyên ku ji anketan bi dest ketî, li programa analîza daneyan a bi navê SPSSyê hatine barkirin, tablo-grafîk hatine amadekirin û di beşa encaman de hatine ravekirin. Hevdîtinên bi kûrehî û xebatên komî yên nîvend, bi teknîkên dayen çawaniyî hatine ravekirin, bi destûra beşdaran dengên wan di cihaza qeydkirina dengan de hatine qeydkirin, di hevdîtinên bêyî destûra qeydê de nîşe hatine nivîsandin. Di xebata ankete de ji beşdaran nav û navnîşan nehatiye xwestin, di hevdîtinên bi kûrahî yên ligel dê û bavan de jî bêyî nivîsandina navan; temen, zayend û navên taxên wan hatine tomarkirin. Di hevdîtinên ligel muxtaran de nav, bêyî guherandinê hatine bikaranîn.

Daneyên talî yên di çarçoveya mafê lîstinê de(Plansaziya îmarê ya bi armanca parastina nava sûran, Plansaziya stratejiyê ya Şaredariya Sûrê û raporên xebatê, Belgeyên fermî yên Enstîtuya Standardên Tirk li ser çawaniya qadên lîstinê, raporên mehelî, neteweyî û navneteweyî, sehîkirinên çapemeniyê, Saziya Statîstîkan a Tirkiyeyê) di nava raporê de û di beşa çavkaniyan de cî girtine.

## 1.3. Sînordarî û Zehmetiyên Lêkolînê[2]

15 taxên navenda navçeya Sûra Diyarbekirê hene.2 Xebat bi navbeyna salên 2010-2020an ku veguherîna bajariyî hatiye destpêkirin û pevçûnên çekdarî yên li Sûra navçeya navendî pêk hatine û bi 7 taxan hatiye sînordarkirin. Ji aliyê din ve, ji ber pandemiyê him ji bo tenduristiya zarokan, him jî ya xebatkarên qadî nekeve rîskê nimûneyên xebatê hatine sînordarkirin.

Nêzîkî çar salan in ku em li ser navê Komeleya Hêviyên Rengîn(Rengarenk Umutlar Derneği) li nava sûran dixebitin, berî wê jî bi salên dûdirêj me li ser navê Kooperatîfa Jinan a Şewqa Hêviyê(Umut Işığı Kadın Kooperatifi) xebatên qadî dimeşînin, loma komele lig elek taxan tê zanîn; vê yekê kir ku hevdîtin û anket bi awayeke ewle pêk werin. Lê ji ber ku pandemî hebû û ji bo zarokan qedexeya derketina derve hebû, zehmet bû ku em xwe bigihînin zarokan.

Hevalên me yên ku xebata ankete meşandin, li kuçeyekê ji aliyê endamin rêxistineke îslamiya radîkal ve hatin şopandin, loma ji bo ku zarok û dê û bavên li wê taxê nexine bin rîskê xebatê bidawî kirin û ji neçarî qada xebatê terikandin.

Di dema danîna çarçoveya teorîk a xebatê de, yek ji çavkaniyên daneyî yên talî Plansaziya Stratejîk a Şaredariya Navçeya Sûrê û Raporên Şaredariyê yên Xebatê bûn lê em li ser websiteya şaredariyê negihanê. Ji ber vê me di çarçoveya mafê bidestxistina agahiyan de serî li Navenda Regihandinê ya Serokkomariyê(CİMER) da, di encamê de plansaziya stratejîk a 2007-2011 û 2020-2024an û raporên xebatê yên salên 2011, 2012, 2013, 2016, 2018, 2019an bo me şandin. Loma me nekariye hedefên di warê qada zarokan de û xebatên pêkhatî yên li gorî salan berawirdî bikin.



2-) Ji bo navên taxan û nifûsa wan a tevahî ya 10 salan û taxên ku xebat lê hatine kirin binêrin: Tabloya 43.

# 2. WEKE MAFEKÎ ÇARÇOVEYA MAFÊ LÎSTINÊ, WEKE HEMWELATIYEK ZAROK Û MAFÊ BAJAR

## 2.1. Prosesa Bipêşketina Mafên Zarokan[3]

Li Tirkiyeyê mekanîzmayên beşdariyê nîn in ku zarok derheqê bajarên xwe de fikrên xwe par bikin. Piraniya konseyên bajêr û meclîsên zarokan ku di bin banê hin şaredariyan de hatine avakirin, mixabin ji bo zarokan nayên maneya beşdariyeke "rasteqîn".

Bipêşketina mafên zarokan ku di çarçoveya mafên mirovan de tê dîtin, xwe dispêre tarîxeke nêzîk. Di destpêka sedsala 20. de du tevgerên kûrewî hene ku tesîr li mafên zarokan dikin. "The International Save the Children Allience" (Tifaqa Parastina Zarokan a Navneteweyî) ku ji aliyê Englantyne Jebbê reformperestê civakî yê îngîlîz ve di 1919an de hatiye avakirin û "Tevgera Bipêşketina Domdar" ku di destpêka salên 1970yî de derket holê, van du tevgeran pêk tînin. Di danezana bi pênc xalan de ku ji aliyê Tifaqa Parastina Zarokan a Nevneteweyî ve hat weşandin dihat gotin ku mafê her zarokî heye ku bijî, bigihê xwarinan, bê parastin û hemandin, bi awayeke tendurist mezin bibe û bêyî ku keda wî/wê bê mêtin debara xwe bike(Severcan, 2019). Ev xalên ku di vê danezanê de cî girtine, rê nîşanî belgeyên mafên zarokan dane. Danezana Mafên Zarokan a Cenevê ku bingeha Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî ye û di 1924an de hatiye weşandin û Tirkiyeyê jî di sala 1928an de îmze kiriye, ji van pênc xalan pêk tê.

Peymana Mafên Zarokan ku ji aliyê Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ve di 20ê Mijdara 1989an de hatiye qebûlkirin û belgeya referans a herî berfireh e di warê mafên zarokan de, ligel perspektîfa xwe ya berevaniyê ji bo zarokan çarçoveyeke azadker pêşkêş dike. Bi qasî "mafê parastinê", mafê beşdariyê" jî ji bo zarokan weke prensîbeke esas ê peymanê datîne holê. Tirkiyeyê di sala 1990î de Peymana Mafên Zarokan a NYyê erê kiriye, peymana ku di 1994an de hatiye îmzekirin di 27ê

3-) http://humanistburo.org/dosyalar/humdosya/BM%20CHK%20Genel%20Yorum%20No16%20-%20Ozel%20Sektor.pdf

Rêbendana 1995an de di Rojnameya Fermî de hatiye weşandin û bi qanûna bi hejmar 4058an di hiqûqa navxweyî de ciyê xwe girtiye.

Peyman, weke peymanên mafên mirovan di warê mafên zarokan de jî dewletên layen dixe bin mukelefiyên negatîf û pozîtîf. Meriv kare xulaseya van mukelefiyan weke "rêzgirtin, parastin û pêkanîn" terîf bike. Ev mukelefî3 bi kurtasî vana îfade dikin:

Mukelefiya rêzgirtinê... Tê wê maneyê ku divê dewlet binpêkirineke di warê mafê zarokan de rasterast an jî nerasterast hêsan neke, alîkarî van binpêkirinan neke û wan mikûn neke.

Mukelefiya Parastinê... Mukelefiya dewletan bo berevaniya mafên ku bi peymanê û bi protokolên vînî hatine temînatkirin li dijî binpêkirinên layenên sêyem, îfade dike.

Mukelefiya pêkanînê... ji bo ku zarok ji mafên xwe sûdê wergirin dewlet divê ji bo bikaranîna wan mafan hêsantir bike, wan mafan berbelav bike û bixe bin temînatê bi awayê pozîtîf hewl bide.

Hin sedemên din hene ji bo pûtepêdana mafên mirovî yên zarokan. Mînak;

• Asta civirîna zarokan dike ku di warê binpêkirinên mafên mirovan de bêhtir bişikên;

• Nêrînên zarokan hîn têra xwe nayên guhdarkirin;

• Piraniya zarokan nikarin di prosesên siyasî yên ku sekna hukûmetan a li ser mafên mirovan diyar dikin, cî bigirin û derfetên wan ên dengdanê nîn in;

• Zarok ji bo parastina mafên xwe yan jî li dijî binpêkirinên mafên xwe di warê serîlêdana rêyên qanûnî de gelek zehmetiyan dikêşin.

• Zarok nikarin xwe bigihînin saziyên ku mafên wan diparêzin jî.

Ji ber ku nêrînên zarokan nayên guhdarkirin, tesîra verastkirinên ji bo zarokan jî kêm dibe. Loma parêzvanên mafên zarok û mezinan hewl didin ku di qadên cihê de ji bo hay ji mafên zarokan hebin nîqaşan didin destpêkirin. Yek ji van qadên nîqaşê jî mafê bajêr ê zarokan e. Li Tirkiyeyê mekanîzmayên beşdariyê nîn in ku zarok derheqê bajarên xwe de fikrên xwe par bikin. Piraniya konseyên bajêr û meclîsên zarokan ku di bin banê hin şaredariyan de hatine avakirin, mixabin ji bo zarokan nayên maneya beşdariyeke "rasteqîn".

### 2.1.1.Zarok û Mafê Bajêr[4]

Li Tirkiyeyê, di sala 2014an de 1397 şaredarî hebûne û tenê di bin banê 190 hebên van de(li gorî hejmarên 2014an) konseyên bajêr hebûne. Tê dîtin ku di nav 190 konseyan de yê 130ên van xwedî meclîsên zarokan in(Dolu, 2014). Di qonaxa pêkhatina meclîsên zarokan ên heyî de pirsgirêkên cidî hene. Rêziknameyên meclîsên zarokan, xîtabî zarokan nakin. Ne mumkun e ku bigihên zarokên berasteng, zixan, penaber, ên bergirtî û yên pêdiviya wan bi

4-) https://www.esithaklar.org/wp-content/uploads/2021/02/Cocuk-Haklari-Komitesi-2001-2006.pdf

5-) Child Friendly Cities, "What is a Child Friendly City?",

> Heke meclîsên zarokan bi awayeke bibandor bêne plansazkirin, dê zarok karibin li bajarên xwe derheqê pirsgirêkan de tespîtan bikin û dê karibin bikin ku ev pirsgirêk bêne çareserkirin.

perwerdeya taybet heye. Rêzikname ti tiştek nabêje bê ka dê biryarên meclîsên zarokan ji bo meclîsên şaredariyê zarûrî ne yan an. Yanê ne diyar e ku dê biryarên zarokan bi kêrî çi bên û dê tesîrên wan çi bin(Özservet, 2018). Heke meclîsên zarokan bi awayeke bibandor bêne plansazkirin, dê zarok karibin li bajarên xwe derheqê pirsgirêkan de tespîtan bikin û dê karibin bikin ku ev pirsgirêk bêne çareserkirin.

Di sala 1996an de, li Stenbolê konferansa Habitat II hatiye lidarxistin, di xebata atolyeyê ya UNICEFê de, ji bo pênasekirina Mafên Zarokan li dinyaya ku bilez dibe bajar û ji bo gihîna hedefên van mafan tiştên divê bêne kirin, hatine nîqaşkirin. Bajarên Dostên Zarokan ku di encama konferansê de hatin weşandin, di vê çarçoveyê de yek ji gavên girîng î ewilîn e. Bajarên dostên zarokan ku bi vê konferansê derketin pêş, bi pênasekirina krîterên rêşander ên di warê bicîanîna mafên peymana mafên zarokan de biencam bûye. 12 serenavên ku ji aliyê UNICEFê ve hatin diyarkirin, derfetên hawîrdorî, mekanî, rêvebirî û civakî yên divê bajarên dostên zarokan bi cî bînin, pênase dikin û ji bo sepandinên cihê bûn rênîşander 5.

Ev serenav;

- Kanîna biryardana derheqê bajarê xwe de
- Karîna anîna ziman bê ka bajareke çawa dixwazin,
- Karîna beşdariya di malbatê, civakê û jiyana civakî,
- Karîna gihîna xizmetên bingehîn ên weke vehewîn, perwerde û tenduristî,
- Karîna bidestxistina ava paqij û sîstema kanalîzasyoneke birêkûpêk,
- Parastina li dijî tundî, mêtîngerî û îstîsmarê,
- Karîna meşa bi serbestî, bi tena serê xwe li kolanan,
- Karîna çêkirina hevalan û lîstina bi lîstikan,
- Hebûna qadên şênkahî ji bo nebat û heywanan,
- Jîna li hawîrdoreke paqij,
- Karîna beşdariya di çalakiyên çandî û civakî de,

> Mafê lîstinê, di çarçoveya mafên bingehîn de gava meriv lê mêze bike, di rêza pêşekiyan de li paş bê hiştin jî, jo bo tenduristî, civîrîn, perwerde û bikaranîna mafê beşdariyê, mafeke gelek girîng e.

- Bêyî ciyawaziya olî, zimanî, dahatûyê, zayendî, etnîk karina sûdewergirtina ji hemû serwîsên bajêr weke hemû bajariyan.6

Li Tirkiyeyê li ser zarok û mafê bajêr him di warê akademiyê de, him jî di warê saziyên sivîl de xebat zêde bûne, rêveberiyên mehelî jî di vî warî de gavine diavêjin. Projeya Bajarên Dostên Zarokan di navbera salên 2014-2015an de7 li şaredariyên weke Şaredariya Bajarê Mezin a Mersin û Manisayê, Şaredariya Bedlîsê, ya Giresunê, ya Lüleburgazê, ya Yüreğirê, ya Mamakê, ya İspirê, ya Bornovayê û ya Eyyübiyeyê hatiye meşandin. Lê piştî 2015an tê zanîn ku li hin rêveberiyên mehelî yên bajar û navçeyên din di vî warî de ked tê dayîn.8

Bi têgeha Bajarên Dostên Zarokan têkeliya zarok û bajaran, di çarçoveya mafên zarokan de lig elek welatan têne nîqaşkirin. Ev xebatên navneteweyî di heman demê de mafê lîstinê jî dikin mijara vê, li ser beşdariya zarokan di polîtîkayên bajêr û mekan û encamên sepandina van mînakan diafirînin. Hin ji van xebatan;

## Woonerf[6]

Ev sîstem verastkirina kuçeyan weke qadên lîstina zarokan dihundirîne. Colin Buchanan di sala 1963an de raporek amade kiriye ji bo Wezareta Veguhastinê û tê de bal kişandiye ser wê yekê ku herka trafîkê ya kartêker û xerabûna mekanê kuçeyan ji bo peyayan nakok in. Orjîna fikre bi eslê xwe îngîlîz e lê ya ku vê felsefeye veguherandiye rastiyê Holanda ye. Nick De Boerê holandî ji fikrê Colin Buchanan ê li ser trafik û peyayan sûdê wergirtiye û kuçeyin wiha sêwirandiye ku gava meriv tê de erebeyê biajo meriv bibêje qey li bexçeyekê diajo. Van kuçeyan, şêniyên kuçeyê û peyayan paşguh nekirine û zor dane ajokaran ku hêdî biçin û ji aliye De Boer ve weke “woonerf” hatiye binavkirin(Hand, 2007, yê neql dike: Tandoğan, 2014)

## Home Zone[7]

Bizava Home Zoneyê di 1998an de ji bo girîngiya lîstinê di pêşketina zarokan de û derfet û xizmetên lîstikê yên baştir, bi mebesta bîrewertirkirina di warê pêdiviya bi gihîna baş de, ji aliyê organizasyona ku weke Childrens Play Council (CPC) tê binavkirin ve li Îngîltereyê dest pê kiriye(Birstol City Council, 2003, yê neql dike Tandoğan, 2014)

Yek ji sepandinên din ên ji bo baştirkirina dorhêla fizîkî ya bajêr bo zarokan ew e ku qadên lîstina zarokan bên dabînkirin ku di serî de biemniyet û ewle bin û alîkariya pêşketina zarokan bikin û daxwaz û pêdiviyên zarokan bi cî bînin. Bi vê armancê ji aliyê saziyên weke U.S. Consumer Product Safety Commission (CPSC), National Program for Playground Safety (NPPS) ve prensîbên plansazî û sêirandinê hatin diyar kirin ku divê di sêwirandina qadên lîstina zarokan de li ber çavan bên girtin. Ji van prensîban yên ewilîn ewlehî û sêwirana

6-) https://beyond.istanbul/%C3%A7ocuk-dostu-kentler-i%CC%87%C3%A7in-mekansal-yakla%C5%9F%C4%B1mlar-7cb722560010

7-) Ji aliyê Komîteya Milî ya Tirkiyeyê ya IKEA û UNICEFê ve hatiye fînansekirin û bi koordinasyona Yekîtiya Şaredariyên Tirkiyeyê û Gerînendehiya Giştî ya Îdareyên Mehelî ya Wezareta Karên Navxweyî, Teşkîlata Rojhilatanavîn û Asyaya Rojava ya Bajar û Rêvebiriyên Herêmî yên Yekbûyî û Akademiya Rêvebiriyên Herêmî û Demokrasiyê ya Dinyayê hatiye pê.

li gorî temen in. Ji aliyê din ve, ji bo avakirina qadên lîstinê yên ewletir û berbendkirina qezayên ku li parkên lîstinê bi mirinê bi encam dibin, ji bo her ekîpmana lîstinê standard hatine diyarkirin. Çakıroğlu û Arslan diyar kirine ku di qonaxa hilberîn û avakirina EN 1176yê de, bi mebesta bicîanîna besbûna asgarî ya ewlehiyê ya ekîpman û raxêrên qadên lîstinê, li Ewropayê û welatên din ên pêşketî û li Tirkiyeyê jî tê sepandin(yê neql dike: Tandoğan, 2014)

## 2.2. Di Çarçoveya Mafên Zarokan De Mafê Lîstinê[8]

Ji ber ku zarok bi awayeke çalak nikarin beşdarî biryarên li ser bajarên xwe bibin, ev yek bi xwe re gelek binpêkirinên mafan jî tîne. Yek ji van mafan jî, yek ji mafên ku nayê dîtin, yanê mafê lîstinê ye. Ji ber ku mezin û dewlet rêzê nagirin ji bo mafê lîstinê yan jî ji ber ku ev weke mafekî nayê pênasekirin, dibe sedema nedîtinê.

Mafê lîstinê, gava mariv di çarçoveya mafên bingehîn de lê dinêre, di rêza pêşekiyan de li paş bê dîtin jî, ji bo tenduristiya zarokan, bipêşketina wan, perwerdeya wan û bikaranîna mafê beşdariyê mafekî gelek girîng e. Di vê çarçoveyê de pênaseya herî berfireh a mafê lîstinê di xala 31. a Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî de hatiye kirin;

Dewletên layen ji bo zarokan mafê bêhnvedanê, derbaskirina wextê vala, lîstinê û beşdariya di şahiyên(çalakiyên) li gorî temenên wan û bi awayeke serbest beşdariya di jiyana çandî û hunerî dê binasin.

Dewletên layen, mafê zarokan ê beşdariya bi temamî di jiyana çandî û hunerî de bi rêzgirtin dê binasin û hewes bidin zarokan û dê teşwîq bikin ku zarok wextên xwe yên vala derbas bikin, bêhna xwe vedin, bi awayeke guncav û bi fersendên wekhev beşdarî çalakiyên hunerî û çandî bibin.

Ji ber vê yekê divê dewlet, di çarçoceya van mukelefiyên xwe de, weke hemû xalên din, dabînkirina mercên hewce bo bicîanîna xala 31. jî berpirsiyariyê hilgirin û vê xalê pêk bînin. Mukelefiya ku Peymana Mafên Zarokan dixe stûyê dewletan, hincetên weke nekafîtiya çavkaniyan ku dê ji hêla otorîteyên gelemperiyê ve bên gotin jî, weke sedemên binpêkirinên mafan qebûl nake. Loma plansaziya xerckirinên gelemperiyê li gorî pêkanîna derfetên mafên zarokan, weke mukelefiyên dewletan tên hesibandin.

Peymana Mafên Zarokan a NYyê zarokan weke ferd dibîne û wan weke hemwelatî pênase dike. Li gorî xala 90. a Makezagona Komara Tirkiyey, peymanên navneteweyî weke rêgezên hiqûqa navîn kar dikin. Di vê çarçoveyê de, hemû xalên Peymana Mafên Zarokan a NYyê, di asta neteweyî de, di dema nirxandina mafên zarokan de divê weke xala referanseke sereke bê bibîranîn û sepandin.

---

8-) Şaredariya Navçeya Seferihisarê ya İzmirê bo vê nimûne ye. Seferihisarê, pênaseya Şaredariya Zarokan qebûl kiriye û li gorî vê xebatên xwe plan dike. Bo agahiyên bêhtir binêrin:http://seferihisar.bel.tr/cocuk-belediyesi/

Gava mafê lîstinê ji bo bipêşketina şexsî ya zarokan li ciyekî girîng bê danîn, divê neyê jibîrkirin ku lazim e ev bi nêrîneke totalîter bê nirxandin. Divê zarok bêyî şert û merc bigihên hemû mafên xwe. Tirkiyeyê, îhtiraz nîşanî xalên(17, 29, 30) zimanê zikmakî, kêmar û binyada etnîk ên Peymana Mafên Zarokan dane û nirxandina vê yekê di çarçoveya mafê lîstinê dejî gelek girîng e.

**Xala 17an:** Dewletên layên dê girîngiya amûrên ragihandina girseyî qebûl bikin û bikin ku zarok nemaze ji bo xweşiya civakî, derûnî û sincî û bipêşxistina tenduristiya bedenî û hişî karibin ji çavkaniyên cihê yên neteweyî û navneteweyî zanyarî û belgeyan berhev bikin.

Bi vê armancê dewletên layen:

- Dê amûrên ragihandina girseyî, ji bo fêdeya civakî û çandî ya zarokan û li gorî ruhê xala 29., ji bo belavkirina zanyarî û belgeyan teşwîq bikin;
- Dê ji bo hilberîn, guherîn û belavkirina van agahî û belgeyên bi vî rengî yên ji çavkaniyên cihê yên çandî, neteweyî û navneteweyî, hevkariya navneteweyî teşwîq bikin;
- Dê hilberîn û belavkirina kitêbên zarokan teşwîq bikin;
- Dê amûrên ragihandina girseyî, ji bo zarokên komên kêmar an gelên cihî, di warê pûtepêdana pêdiviyên wan ên zimanî de teşwîq bikin;
- Dê rêgezên di xalên 13. û 18. de li ber çavan bigirin û ji bo parastina zarokan li dijî zanyarî û belgeyên ku dê zirarê bidin xweşiya zarokan, bipêşxistina prensîbên beralîkirinê teşwîq bikin;

**Xala 29an:** Dewletên layen qebûl dikin ku dê perwerdeya zarokan li gorî armancên li jêr bin;

- Bi qasî mimkun be kesayetî û behreya zarokan, behreyên wan ên hişî û bedenî bên bipêşxistin;
- Rêza wan a bo mafên mirovan û serbestiyên bingehîn, prensîbên Şertên Neteweyên Yekbûyî bê bipêşxistin
- Rêza wan a bo dê û bavên wan, nasnameyên wan ên çandî, ziman û nirxên wan, nirxên neteweyî yên welatên ku zarok lê dijîn an ji wir in û şaristaniyên ji ya xwe cihê bê bipêşxistin;
- Rêza wan a bo dorhêla xwezayî bê bipêşxistin,

Dê ti hukmên vê xalê yan xala 28., bi şertê ku rêz li prensîbên fiqreya 1. a vê xalê bê girtin û perwerdeya van saziyan li gorî rêgezên asgarî yên dewletê bin, ji bo avakirin û birêvebirina saziyên hîndekariyê yên bi destê kesên rasteqîn û hiqûqî bi awayeke dijraber neyên ravekirin.

**Xala 30.:** Li dewletên ku kêmar yan jî gelên cihî yên ji nijad, ol ango zimanên cuda lê hene, zarokên ku ji komeke kêmar ango gelê cihî bin, tevî endamên civata komar ku aîdî wê ne, nabe ku mafê sûdwergirtina ji çanda xwe, baweriya bi ola xwe û sepandina wê û bikaranîna zimanê xwe bêpar bê hiştin.

Li Tirkiyeyê, gava di çarçoveya mukelefiya pozîtîf de ji bo gihîna mafê lîstinê yê zarokan xebatine plan bike, divê nifûsa pirrziman, pirrçand û ji binyadên etnîk ên cihê li ber çavan bigire û di vê çarçoveyê de tevbigere. Lê Tirkiye ji ber îhtirazên9 xwe yên dijî peymanê van mukelefiyên xwe yên pozîtîf hilnagire. Herêma nava sûran ku me xebata raçaviyê lê kir, herêmeke wiha ye ku piraniya nifûsa wê kurd in, zaravayên kurmancî û zazakî(kirmancî) lê têne axavtin. Gava zarok di serdema bipêşketinê de aktîvîteya ku herî zêde pê wext derbas dikin, yanê lîstikê bi zimanê xwe yê zikmakî nelîzin ev dibe sedem ku di serdema mezinbûnê de têkiliya wan a ligel zimanê wan ê zikmakî, çand û binyada wan a etnîk qels bibe. Ev jî di demeke dirêj de xetereyeke wiha jî dihundirîne ku zimanek, çandek û tarîxek bên jibîrkirin.

Mafê lîstinê gava girêdayî bipêşketina zarokan û mukelefiyên dewletê bê nirxandin, xwedî hêleke berfireh e. Lê ewilî ligel plansaziyên bajaran rasterast têkiliya wê heye. Ji bo çarçoveyeke biqelîte û berfireh li ser mafê lîstina li bajaran bê danîn jî, divê zarok di biryarên plansaziya bajaran de weke hemwelatî cî bigirin. Lê di plansaziyên bajaran de, ne tenê otorîteyên gelemperiyê, gelek aktor hene. Di nav van aktoran de odeyên pîşeyî, sendika, saziyên sivîl jî hene. Gava meriv di çarçoveya berpirsiyariyan de binirxîne bi qasî otorîteyên gelemperiyê, spartek û berpirsiyariyên mezinên din jî hene. Çimkî lîstina bi lîstikan ligel otorîteyên gelemperiyê ji aliyê mezinan ve jî weke mafekî nayê hizirîn. Lê girîngiya lîstinê bo bipêşketina zarokan, rastiyek e ku nabe meriv paşguh bike. Bi vê re jî, qadên ku herî zêde zarok jê sûdê werdigirin jî dîsa qadên lîstinê ne. Loma bitemînatkirina mafê lîstinê, di heman demê de tê maneya parastina mafê jiyînê yê zarokan jî.

## 2.2. Mafê Lîstinê Di Plansaziyên Stratejîk Ên Şaredariya Navçeya Sûrê ya Diyarbekirê De[9]

Divê her zarok xwedî qadan bin ku bipêşketina wan a fizîkî, derûnî û civakî bê destekkirin, karibin behreyên xwe kifş bikin û hunerên xwe bi pêş bixin. Di warê dabînkirina van mercan de bi qasî rêvebiriyên navendî berpisrisyariyên mezin di stûyê rêvebiriyên herêmî de ne jî.

> Gava zarok di serdema bipêşketinê de aktîvîteya ku herî zêde pê wext derbas dikin, yanê lîstikê bi zimanê xwe yê zikmakî nelîzin ev dibe sedem ku di serdema mezinbûnê de têkiliya wan a ligel zimanê wan ê zikmakî, çand û binyada wan a etnîk qels bibe. Ev jî di demeke dirêj de xetereyeke wiha jî dihundirîne ku zimanek, çandek û tarîxek bên jibîrkirin.

9-) Tirkiyeyê li hemberî xalên 17, 20 û 29. ên li ser zimanê zikmakî yên Peymana Mafên Zarokan îhtiraz nîşan daye.

Mafê zarokan heye ku li ser mijarên têkelî xwe nêrînên xwe îfade bikin(Peymana Mafên Zarokan 15). Bikaranîna vî mafî, heke mezin rê li ber zarokan vekin û bikin ku hay ji mafên xwe hebin, mumkun e. Li gorî peymanê mafê her zarokî heye ku ji bo bipêşxistina rewşa xwe ya heyî, ji bo bibe endameke aktîf û berpirsiyar a/ê civakê ji çavkaniyên hatî veqetandin sûdê werbigire(UNICEF, 1998:6-7) Ligel vê di xala 6an de tê gotin ku her zarok xwedî mafê jiyînê yê bingehîn e. Di xaline dî de tê gotin ku midaxileya fizîkî û derûnî li dijî zarokan qedexe ye.

Li gorî qanûnan berpirsiyariya rêvebiriyên herêmî ye ku mafên zarokan li ber çavan bigirin û derfetan ji bo zarokan dabîn bikin da ku karibin hebûna xwe pêk bînin; bikin ku ev derfet ewle bin, beralîker bin, perwerdeker bin, gava zarok bixwazin karibin bigihîninê û tendurist bin û hwd. û dîsa berpirsiyariya rêvebiriyên herêmî ye ku binesaziya wan deynin û xizmetan vesaz bikin. Divê rêvebiriyên herêmî rola herî mezin hilgirin ser milên xwe da ku zarok bi serbestî û bi awayeke aştiyane bijîn û karibin xwe bigihînin mafên xwe. Hewldanên di asta herêmî de û prosesa xebatan divê girêdayî plansaziya neteweyî bin. Weke din polîtîkayên dostên zarokan, ligel qadên fizîkî, divê qadên civakî û rêvebiriyê jî di heman demê de ji zarokan re vekin. Di asta herêmî û mehelî de, di warê her mijarên ku bi zarokan re elqedar in, divê beşdariya zarokan di rêvebiriyê de esas were girtin(Çakırer-Özservet, 2015).

> Li Gorî Qanûnan Berpirsiyariya Rêvebiriyên Herêmî Ye Ku Mafên Zarokan Li Ber Çavan Bigirin Û Derfetan Ji Bo Zarokan Dabîn Bikin Da Ku Karibin Hebûna Xwe Pêk Bînin; Bikin Ku Ev Derfet Ewle Bin, Beralîker Bin, Perwerdeker Bin, Gava Zarok Bixwazin Karibin Bigihîninê Û Tendurist Bin Û Hwd. Û Dîsa Berpirsiyariya Rêvebiriyên Herêmî Ye Ku Binesaziya Wan Deynin Û Xizmetan Vesaz Bikin.

Tê payîn ku rêvebiriyên herêmî; dînamîkên civakê, binyada wê, pêdiviyên wê, pêşekiyên wê û kodên civakî nas bike, ji bo çareserkirina pirsgirêkên heyî demildest çareseriyên bibandor û domdar hilberîne. Loma divê rêvebiriyên herêmî xwedî sîstemeke rêvebirinê ya çalak bin. Tê payîn ku belgeyên mafên zarokan û planên xebatên yên neteweyî/gerdûnî, belgeyên polîtîkayê yên ji bo zarokan di asta neteweyî de hatine amadekirin, bên sepandin.

Di vê beşa raporê de, nimûneya lêkolînê nava sûran e ku girêdayî Şaredariya Sûrê ye; plansaziyên stratejîk û raporên xebatê hatine lêkolînkirin ku ka mukelefiyên têkelî mafên zarokan ên ji peymanên gerdûnî ku Tirkiye jî layen e, çiqasî bi cî aniye. Wezareta Malbat û Polîtîkayên Civakî ji bo serdema 2013-2017an di Belgeya Stratejiyê ya Mafên Zarokan a Tirkiyeyê de û di planên xebatê de cî dan hedefên xwe, muhîm e ku ev neyê jibîrkirin.

Di plana xebatê ya vê belgeyê de;

**Armanca 1.** Di bin vê armancê de, di bin serenavê "Bipêşxistina rêza bo zarokan û çanda mafên zarokan" de Hedef 2 li ser "Bipêşxistin û sepandina bernameyên perwerdeyê li ser bingeha çanda 'rêza bo zarokan' roleke biçûk daye rêvebiriyên herêmî.[10]

**Armanca 2.** Serenaveke bi navê Beşdarkirina Hemû Zarokan Di Prosesên Biryardanê Yên Têkelî Mafên Zarokan heye, di hedefa 2. de "Avakirina meclîsên zarokan li Tirkiyeyê" heye û dîsa navê rêvebiriyên herêmî derbas dibe.

**Armanca 3.** Serenaveke bi navê Parastina Hawîrdora Zarokan Ku Lê Hatine Dinyayê û Lê Mezin Bûne û Çakkirina Dorhêla Fizîkî ya Zarokan heye, hedefa 3. çakkirina dorhêla fizîkî ya zarokan e, ji bo vê ev belge rol dide rêvebiriyên herêmî.10

Ji ber sînordariya xebatê, plansaziyên stratejik ên navbeyna 2010-2020an û raporên xebatê, peymanên ku hatine destnîşankirin esas hatine girtin û wisa lêkolîn hatiye kirin. Lê em li ser websîteya Şaredariya Sûrê û ya Serokatiya Strateji û Budçeyê ya girêdayî Serokkomariyê negihanê. Ji ber vê me serî li Navenda Regihandinê ya Serokkomariyê(CİMER) û Şaredariya Sûrê da, di encamê de du plansaziyên stratejîk ên 2007-2011 û 2020-2024an û 6 raporên xebatê yên salên navbeyna 2011 û 2019an bi dest me ketin. Loma me nekariye hedefên di warê qada zarokan de û xebatên pêkhatî yên li gorî salan berawirdî bikin. Plansaziyên stratejîk û raporên xebatê yên heyî, xizmetên ku ji bo zarokan hatine kirin bi rêbaza analîza naverokê hatine lêkolînkirin. Di vê xebatê de, li gorî armanca lêkolînê, awayê sehîkirina belgeyan hatiye bikaranîn ku girêdayî rêbeza analîza naverokê ye.

Plansaziyên stratejîk û raporên xebatê bi pirsên beralîker ên li jêr hatine analîzkirin:

1. Tê raberkirin ku ji bo bipêşketina zarokan dê qurs vebin?

2. Tê raberkirin ku derheqê mafê lîstinê de dê xebatên bîrewerkirinê bên kirin?

3. Tê raberkirin ku derheqê mafê bipêşketinê yê zarokan de dê xebat bên kirin?

4. Tê raberkirin ku ji bo avakirina qad û aktîvîteyên têkelî van mijaran dê ligel saziyên sivîl dê hevkarî bê kirin?

5. Derheqê zarokan de armanc, hedef û xebat tên diyarkirin?

6. Tê raberkirin ku ji bo avakirina qad û aktîvîteyên têkelî van mijaran de dê beşdariya zarok û malbatan hebe?

7. Tê raberkirin ku ji bo avakirina qad û aktîvîteyên têkelî van mijaran de, pêkanîna wan, lênihêrîna wan û bipêşxistina wan dê têra xwe budçe bê veqetandin?

8. Temînatê dide ku qad û aktîvîteyên têkelî van mijaran wiha bin ku hemû zarok bêyî ku di warê berastengiyê, rewşa sosyo-ekonomîk, ziman, ol, nasnameya zayendî, nasnameya çandî de bên ciyawazkirin, bi awayeke ku rêz li normên zayendiya civakî bê girtin?

9. Tê raberkirin ku di plansaziyên çolter û bajaran de qadên navborî mecbûrî bên rezervkirin?

10. Tê raberkirin ku ji bo qad û aktîvîteyên navborî dê standardên ewlehî û xwegihandinê hebin ango dê ev standart bên danîn?

10-) https://www.ailevecalisma.gov.tr/uploads/chgm/uploads/pages/yayinlar/ulusal-cocuk-haklari-strateji-belgesi-ve-eylem-plani.pdf

**Tabloya 1. Tabloya analîzê ya rapora plansazî û çalakiyên stratejîk**

| Göstergeler Stratejik Belgeler | Çocukların Gelişimini Destekleyecek Kurumlar | Farkındalık çalışmaları | Çocuğa yönelik Faaliyetler | STK'lar İle İşbirliği | Çocuk Odaklı Amaç | Çocuk Katılımı | Öngörülen Bütçe | Çeşitlilik ve ayrımcılık ilkeleri | Kentsel Planlamada Çocuk | Erişilebilirlik |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2007/2011 Stratejik Plan | Çocuk meclisi binası, sanat atölye binası, çocuk kütüphanesi, spor kulübü, eğitim destek evi | Yok | Çocuk festivalleri, çocuk öykü yarışmaları | Yerel Gündem 21 | 9 tane amaç belirlenmiştir. | Çocuk meclisleri | 998,311 YTL | Yok | Var | Yok |
| 2020/2024 Stratejik plan | Kitap kafelerin oluşturulması, Halk Eğitimi Merkezi işbirliğinde çocuk ve gençlerin gelişimine katkı sunacak kültürel ve sosyal kursların açılması, | Yok | Kültürel ve sosyal etkinliklerin düzenlenmesi | Yok | 5 tane amaç belirlenmiştir. | Yok | 3.000.000 TL | Yok | Yok | Yok |
| 2011 Faaliyet raporu | 2 Çocuk kütüphanesi, Sanat evi, tiyatro evi ve eğitim destek evi, Kürtçe kreş | Yok | Halk oyunları, tiyatro, müzik, resim | Dicle Fırat Kültür merkezi | Tehlike arz eden yapıların yıkılarak park ve yeşil alana dönüştürülmesi, Oyuncak evi projesi | Yok | 854.074,94 TL | Yok | Yok | Yok |
| 2012 Faaliyet raporu | 2 Çocuk kütüphanesi, Sanat evi, tiyatro evi ve eğitim destek evi ve 2 Kürtçe kreş | Yok | Halk oyunları, tiyatro, müzik, resim | Dicle Fırat Kültür merkezi, ÇAÇA ve DSM | Çocuk destek merkezi projesi | Yok | Belirtilmemiş | Yok | Yok | Yok |
| 2013 Faaliyet raporu | 2 Çocuk kütüphanesi, Sanat evi, tiyatro evi ve eğitim destek evi ve 2 Kürtçe kreş | Yok | Halk oyunları, tiyatro, müzik, resim | Dicle Fırat Kültür merkezi | Tehlike arz eden yapıların yıkılarak park ve yeşil alana dönüştürülmesi, | Yok | 940.000 TL | Yok | Yok | Yok |
| 2016 Faaliyet raporu | Çocuk kütüphanesi ve sanat evi | Yok | Yok | Yok | Yok | Yok | | Yok | Yok | Yok |
| 2018 Faaliyet raporu | 1 Çocuk kütüphanesi | Yok | Tiyatro, kültürel ve sportif faaliyetler | Yok | Yok | Yok | Belirtilmemiş | Yok | Yok | Yok |
| 2019 Faaliyet raporu | 1 Çocuk kütüphanesi | Yok | Tiyatro, sinema | Yok | Yok | Yok | Belirtilmemiş | Yok | Yok | Yok |

Weke ku di Tabloya 1. de jî xuya dike, di dokumentên ku hatine lêkolînkirin de ev hatine tespîtkirin:

- Di plansaziyên stratejîk de xebatên têkelî zarokan di bin serenavê Çand û Hunerê de cî girtine lê derheqê mafê zarokan de behsa yekeyek nayê kirin;
- Derheqê mafê lîstinê yê zarokan de ti xebatên bîrewerkirinê nayê kirin û ev yek weke hedef jî nehatiye diyarkirin;
- Saziyên ku bipêşketina zarokan destek dikin, bi pirtûkxaneyên zarokan, kreş û di hin salan de jî bi qursan hatine sînorkirin;
- Piştî 2016an ligel ti saziyeke sivîl hevkarî nehatiye kirin û xebatên destekkirina zarokan ligel saziyên gelemperiyê yên weke miftîtî, navendên perwerdeya gel û gerînendehiya perwerdeya milî hatine meşandin;
- Beyaneke eşekere nîne ku ka xebatên zarokan li gorî normên mafên zarokan û zayendiya civakî hatine amadekirin yan na;
- Derheqê ewlehiya zarokan de û derheqê gihîna qadên heyî de standart nehatine diyarkirin û ev yek weke hedef jî nehatine diyarkirin.

Tê dîtin ku plansaziyên stratejîk ên Şaredariya Sûrê bi perspektîfa mafên zarokan nehatiye amadekirin. Li nava sûran ku herêma lêkolînê ye, pevçûnên çekdarî yên giran ên salên 2015 û 2016an jig elek aliyan ve bûne sebebê tehrîbatên cidî. Pevçûn bûne sebebê gelek windahiyên cidî yên aborî, civakî, çandî, derûnî û jiyanî, ligel van qadên lîstinê yên heyî yên zarokan jî hatine tehrîbkirin. Di rewşeke wiha de Şaredariya Sûrê berpirsiyar e ku bi awayeke lezgîn qadên lîstina zarokan ava bike û qadên heyî çak bike û bike ku zarok bigihên yek ji mafên xwe yên herî bingehîn. Lê weke ku di tabloyê de jî xuya dike, gava meriv raporên xebatê yên sala 2016 û yên peyre û raporên berî 2016an muqayese dike, meriv kare bibêje ku di warê mafê lîstinê de pêşketinek na, berevajî wê paşketinek heye.

## 2.3. Prosesa Veguherîna Bajariyî ya Li Nava Sûran Di Navbeyna Salên 2010-2020an û Têkiliya Wê Ligel Mafê Lîstinê[11,12]

Bi taybetmendiyên xwe yên tarîxî û civakî ji aliyê nasnameya bajêr a Diyarbekirê ve sembola herî girîng sûr in. Navçeya nava sûran jî navê xwe ji vir stendiye. Weke qadeke jiyanê, nava sûran deverek wiha ye ku koçberî lê zêde pêk tê. Koçberiya li nava sûran, binyada civakî, çandî û aborî jî diguherînin û vediguherînin. Du şikestinên civakî pêk hatine ku li nava sûran bûne sedemên veguherîna binyadî. Yek ji van; di salên 1990î de li herêmên gundewar ên kurdan pevçûnên çekdarî pêk hatine û di encamê de koçberiyeke mecbûrî pêk hatiye.

> Koçberiya li nava sûran, binyada civakî, çandî û aborî jî diguherînin û vediguherînin.

11 http://www.tmmob.org.tr/yayin/tmmob-yikilan-kentler-raporu

12 https://www.stgm.org.tr/sites/default/files/2020-10/surda-goc-sonrasi-ebeveyn-cocuk-iliskisi.pdf; uzerindeki-etkisine-iliskin-gozlem-ve-tespit-raporu/;

Ya din jî; di salên 2015-2016an de pevçûnên çekdarî pêk hatine û piştî wê şikestin pêk hatine. Koçberiyên salên 1990î ji nişkê ve û mecbûrî li gundewaran pêk hatine. Malbatên ku ji xeynî awayê hilberîna kevneşopî ne xwedî amrazên hilberînê û mercên madî bûn, di jiyana bajaran de xizan bûn, ev jî bû sedem ku pirsgirêka wan a adapteyi bajêr jî kûrtir bibe. Weke qadeke jiyanê nava sûran, bi demê re ji ber koçberiyê bi bajarbûniya çelexwarî, xizanî û di heman demê de bi nasnameya xwe ya polîtîk derketiye pêş.

Herêma nava sûran, di salên 2015-2016an de demeke dirêj ji ber pevçûnên çekdarî û qedexeyên derketina derve, bi koçberiya mecbûrî û binpêkirinên mafên mirovan bûye rojev. Pevçûnan tenê insanan bêmal nehiştine, pê re xanî, mekanên tescîlkirî û vehûna civakî-çandî jî xisar dîtiye. Li gorî Rapora Bajarên Xerabûyî ya Yekîtiya Odeyên Mîmar û Endezyaran a Tirkiyeyê, 40 jê avahiyên tescîkirî, 247 jê yên hêjayî tescîlkirinê, tevde 4985 avahî hatine xerakirin. Heman rapor dibêje ku di nav avahiyên xisar dîtî ango xera bûyî de 3 dibistan jî hene. Berî pevçûnan projeyên veguherîna bajariyî rojev bûn û di dema pevçûnan de û piştî pevçûnan xerakirin berdewam bûn. Ev kiryar wê yekê jî nîşan dide ku dixwazin nasnameya polîtîk, civakî, çandî û binyada civakî ya nava sûran biguherînin.

Nava sûran xwedî gelek avahiyên biqelîte yên mîmarî û vehûna mekanî ya tarîxî ye. Di 2009an de Îdareya Xaniyên Tomerî û Walîtiya Diyarbekirê projeya Veguherîna Bajariyî dan destpêkirin. Di sala 2012an de Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê jî tev lê bû û xerakirina tarîxî hat plankirin. Bi protokola hat destnîşankirin, taxên Ali Paşa, Lale Bey, Cevat Paşa û Fatih Paşa weke herêmên pîlot hatin hilbijartin, bi kiryarên valakirin û xerakirinê liv an taxan prosesa xerakirinê hat destpêkirin. Lê şêniyên taxan li dijî vê xerakirinê li ber xwe dan, loma piştî hin xerakirinan, Şaredariya Bajarê Mezin neçar ma ku ji protokole vekişe û bi vê re prosesa xerakirinê rawestiya.

Herêmên di çarçoveya Projeya Veguherîna Bajariyî de him ji aliyê şêniyên taxan ve, him jî ji aliyê dînamîkên bajêr ve hatine nirxandin û hatiye diyarkirin ku plana xerakirinê ewqas pirralî ye ku divê tenê di konteksta mekanî de neyê dîtin. Piştî nirxandinan hatiye gotin ku dê bi xerakirinê vehûna dorhêlê, ya tarîxî, civakî û çandî jî xera bibe. Bi gotineke din, hatiye tespîtkirin ku plan plana veguhrandina demografiyê ye. Hema piştî pevçûnên salên 2015-2016an, projeya veguherîna bajariyî ya ku di sala 2012an de li taxên Ali Paşa û Lale Beyê nîvco mabû, dîsa berdewam bû û piştî demekê hema hema temamê herdu taxan hatin xerakirin. Him taxên tab'îê veguherîna bajariyî, him jî dorhêla nêz ku di bin tesîra pevçûnên çekdarî de maye, hatiye valakirin û xerakirin. Li şûna avahiyên ku hatine xerakirin, bi armanca bazirganiyê avahiyên nû hatine çêkirin.

Ji bo sepandina biyara veguherîna bajariyî, da ku tax bên valakirin rê û rêbazên cuda hatine bikaranîn. Şaredariyê û hêzên ewlekariyê şêniyên taxan tehdît kirine, şaredariyê bi awayeke qestî zibilan berhev nekiriye, kuçeyan paqij nekiriye û kanalîzasyonan xetimandiye da ku insan warên xwe biterikînin. Ji ber van û sedemên weke van, insan neçar mane ku ciyên xwe biguherînin û yên neguherandin jî di nav kavilan de jiyana xwe berdewam kirin, vê jî gelek pirsgirêkan derxist holê. Yên herî zêde di bin tesîra vê prosesê de man jî zarok û jin bûn. Li nava sûran, ji xeynî qadên di planên îmarê de cî girtine, qadeke din a lîstina zarokan jî kuçe

ne. Di prosesa hatî behskirin de zarok nikaribûn kuçeyan ji bo lîstinê bi kar bînin, ev li hêlekê; bû ku zarok nikaribûn derkevin kuçeyan. Di heman demê de şaredariyê avê, saziya ceyranê jî ceyranê birî û mercên berdewamiya jiyana civakî ji holê rabûn. Temamê vê prosesê, kir ku pirsgirêkên derûnî li zarokan peyde bibin. Derheqê vê prosesê de raporên lêkolînê hatin nivîsandin, di van raporan de hatiye diyarkirin ku koçberiya di dema pevçûnan de û ya piştî wê tesîrên neyînî li prosesa perwerdeyê ya zarokan û li têkiliya wan û dorhêlê kiriye.12

Zarokên li nava sûran ku piştî pevçûnên salên 2015-2016an ketin qilqalê, kuçeyên ku weke qada lîstinê bi kar dianîn, piştî wê nekarîne bi kar bînin. Piştî pevçûnan, di xebatên li nava sûran hatî kirin de jî girîngî bi zarokan nehatiye dayîn. Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê gelek caran hatiye revîzekirin lê teserûfek ji bo zarokan tê de cî negirtiye. Berevajî wê, piştî pevçûnên 2016an, bi revîzeyên Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê, qadeke tesîsa civakî ku zarok karibûn weke qada lîstikê bi kar bînin, 2 qadên tesîsê yên dibistanan ku qadên perwerde û lîstina zarokan bû, weke qereqolên polêsan hatin guherandin.13 Di 22.10.2012an de bi biryara Lijneya Wezîran temamê nava sûran li gorî qanûna 6306an weke qada bi rîska afete hat îlankirin û 21.03.2016an de bi biryara Lijneya Wezîran temamê nava sûran di çarçoveya îstîmlaqkirina lezgîn de hat qebûlkirin, piştî wê rîsk berdewam e ku şêniyên herêmê ji nişkê ve neçar bimînin û herêmê biterikînin.

### 2.3.1. Di Konteksta Mafê Lîstinê De Nirxandina Plansaziyên Îmara Sûrê[13]

> Zarokên li nava sûran ku piştî pevçûnên salên 2015-2016an ketin qilqalê, kuçeyên ku weke qada lîstinê bi kar dianîn, piştî wê nekarîne bi kar bînin.

Li gorî daneyên 2019an tevahiya nifûsa 15 taxên li nava sûran 38156 e.14 Tevahiya qada nava sûran jî hema hema 150 hektar, yanê 1500 donim e. Li gorî qanûna îmarê ya bi hejmar 3194an û rêziknameyên têkildar, li herêmên ku dê plana îmarê ya nû bê amadekirin, divê serê her kesekî herî kêm 10 m² qada şênkahî ya aktîf hebe. Qada şênkahî ya aktîf di plansaziyên îmarê de qadên weke park, bexçeyê zarokan, qadê lîstinê, qadên bêhnvedanê, yên gere, yên seyranê, yên şahiyê, qadên lîstinê yên rekreasyon û rekreaktîf in.

Li Tirkiyeyê qadên lîstikê yên zarokan, di plansaziyên îmarê de din av qadên ku weke qada şênkahî ya aktîf tên diyarkirin de cî digirin. Ji ber ku di plansaziyên îmarê de rasterast îbareyeke weke "dê qadên lîstina zarokan bên çêkirin" tuneye, di her qada şênkahî ya aktîf de qada lîstina zarokan nayê çêkirin. Tê dîtin ku di qanûna îmarê ya bi hejmar 3194an de û di rêziknameya li ser esasên çêkirina planên navborî de jî nêzîktêdayînek ku berê pêşîn zarokan bifikire tuneye.

Binêrin: Xerîteya 1- Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê

13-) https://www.diyarbakir.bel.tr/diyarbakir/genel-bilgiler/mahalle-nufus.html

Heke nava sûran herêmek ku ji avadaniyê re nû hatiba vekirin, li gorî qanûna îmarê ya bi hejmar 3194 û rêziknameyên têkildar, hewce bû ku ji bo nifûsa vê herêmê herî kêm 381 donim qada şênkahî ya aktîf bê veqetandin. Lê ji ber ku nava sûran di sala 1988an de weke Qada Sîtê ya Bajariyî hat îlankirin, qada lîstina zarokan a vir ango qada şênkahî ya aktîf di asteke kêm de ye. Ji bo qadên sîtê yên bajariyî li gorî avadaniya heyî Plansaziyên Îmarê Yên Bi Armanca Parastinê tên amadekirin.

Di Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê ya heyî de, li nava sûran 19 heb parsêl û berûberê sûran tê de, tevde qadeke bi qasî 117.792 $m^2$ weke qada şênkahî ya aktîf hatiye veqetandin. Hatiye dîtin ku tenê parsêlek rasterast weke Bexçeyê Zarokan(Taxa Hasırlıyê) hatiye veqetandin. Li gorî vê û li gorî Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê serê insanek hema hema 3.1 $m^2$ qada şênkahî ya aktîf dikeve. Qadên şênkahî yên berûberê sûran jî tevî van hesaban in. Lê ev der ji bo gelek avahiyan bi qasî mesafeya meşê nêz nînin. Yanê xwegihandin, ji ber mesafeyê zehmet e. Lê ji ber ku tevahiya nava sûran hatiye nirxandin, tevî van hesaban hatiye kirin. Li gorî rêziknameya avakirina planên mekanî mesafeya meşê ji bo qada şênkahî ya aktîf herî zêde 500 metre ye.

Parsêlên ku di Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê de weke qadên şênkahî yên aktîf hatine diyarkirin, di encama lêkolînê de hatiye tespîtkirin ku tenê krîterên asgarî yên qadên şênkahî bi cî anîne. Hin parsêl vala ne û li hin parsêl avahiyên taybet hatine çêkirin û bi armancên cuda hatine bikaranîn, yanê weke qadên şênkahî û qadên lîstina zarokan nayên bikaranîn.

Weke ku dê di tabloya jêrîn a 2. de jî bê dîtin, li 19 parsêl û berûberên sûran ku di Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê de weke qadên şênkahî yên aktîf hatine veqetandin, tenê sê komên lîstina zarokan hene. Hatiye tespîtkirin ku ji van du jê tên bikaranîn lê yek jê tehrîb bûye û ne di wî halî de ye ku bê bikaranîn. Weke din, şêniyên taxan du heb komên lîstina zarokan û şaredariyê jî komek çêkirine k udi Plansaziya Îmarê ya Bi Armanca Parastinê de tuneye. Ji van sê komên lîstina zarokan du jê tehrîb bûne û ne di wî halî de ne ku bên bikaranîn. Hatiye dîtin ku di yekê tenê de koma lîstina zarokan kare bê bikaranîn.

Di encama van lêkolînên qadî de, hatiye dîtin ku mîqdara qada şênkahî ya aktîf bo serê insanan li herêma nava sûran, ji 3.1 $m^2$yên ku li gorî Plansaziya Îmarê ya Bi Armanca Parastinê hatî diyarkirin, kêmtir e. Li berûberên sûran qada şênkahî ya aktîf û du heb qadên lîstina zarokan hene. Hatiye dîtin ku veguhastina bo van qadan, ji ber rêya rîngê(kolana fireh) ku sûran dorpêç dike, him tesîreke neyînî li veguhastina bo van qadan dike, him jî ewlehiya canî dixe rîskê.



Weke encam, li herêmeke ku qada şênkahî ya aktîf lê kêm e, ne pêkan e ku ji bo zarokan têra xwe qadên şahiyê û lîstinê bên veqetandin jî. Weke encama nirxandina giştî ya nava sûran, bikarneanîna parsêlên qadên şênkayî yên aktîf ku di Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê de cî girtine û avanekirina komên lîstina zarokan tercîheke polîtîk e, ligel vê tê hizirîn ku ev yek encama projeya veguherîna demografîk a nava sûran e.

## Tabloya 2.: Tabloya lêkolînê ya qadên şênkahî yên aktîf û komên lîstikê yên zarokan li nava sûran

| Hejmara Parsêlan | Cî | Tax | Qad (m2) | Weke qada şênkahî ya aktîf tê bikaranîn | Koma lîstina zarokan heye? |
|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Parka Anzeleyê | Melik Ahmet | 6925 | Erê | Tuneye |
| 2 | Kêleka Mizgefta İskender Paşayê | İskender Paşa | 873 | Erê | Heye(Nayê bikaranîn) |
| 3 | Kuçeya Uzunê | İskender Paşa | 276 | Na – Kargeha taybet | Tuneye |
| 4 | Kuçeya Telgrafhaneyê | İskender Paşa | 350 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 5 | Adaya bi hejmara 151 | Cami Nebi | 1085 | Na – Otoparka taybet | Tuneye |
| 6 | Kêleka Mizgefta Mezin | Cami Kebir | 225 | Na – Otoparka taybet | Tuneye |
| 7 | Adaya bi hejmar 639-640 | Lale Bey | 580 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 8 | Kêleka Dêra Dayîka Meryem | Lale Bey | 442 | Na – Avahiya taybet | Tuneye |
| 9 | Adaya bi hejmar 965(Herêma veguherîna bajariyî) | Lale Bey | 405 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 10 | Adaya bi hejmar 290(Herêma veguherîna bajariyî) | Ali Paşa | 373 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 11 | Adaya bi hejmar 472(Herêma veguherîna bajariyî) | Ali Paşa | 343 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 12 | Adaya bi hejmar 256 | Ali Paşa | 123 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 13 | Adaya bi hejmar 646 (Herêma pevçûnê) | Fatih Paşa | 1280 | Erê | Tuneye |
| 14 | Adaya bi hejmar 205 (Herêma pevçûnê) | Fatih Paşa | 680 | Na - Meydan | Tuneye |
| 15 | Adaya bi hejmar 244 (Herêma pevçûnê) | Hasırlı | 794 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 16 | Adaya bi hejmar 239 (Herêma pevçûnê) | Hasırlı | 347 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 17 | Adaya bi hejmar 229-505 (Herêma pevçûnê) | Hasırlı | 963 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 18 | Adaya bi hejmar 230 (Herêma pevçûnê) | Hasırlı | 562 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 19 | Karadeniz 2. Sok. (Herêma pevçûnê) | Hasırlı | 1700 | Na – Parsêla vala | Tuneye |
| 20 | Kuçeya Telgrafhaneyê | Cami Kebir | | Na | Heye(Nayê bikaranîn) |
| 21 | Pêşiya Dêra Surp Sarkis | Ali Paşa | 122 | Na | Heye(Nayê bikaranîn) |
| 22 | Adaya bi hejmar 156 | Dabanoğlu | | Erê | Heye- 1 Heb |
| 23 | Berûberê sûran- Herêma 1. | Ali Paşa, Lalebey, Melikahmet, İskenderpaşa, Cami Nebi, Cevatpaşa | 64.005 | Erê | Heye-2 heb |
| 24 | Berûberê sûran- Herêma 1. (Herêma pevçûnê) | Cemal Yılmaz, Hasırlı, Fatih Paşa, Dabanoğlu | 35.462 | Na-Qada vala | Tuneye |

Gava di konteksta mafê lîstinê de plansaziyên bajaran bên lêkolînkirin, divê kreş, pêşdibistan, tesîsên civakî, tesîsên çandî jî bi awayeke neyekser weke qadên lîstina zarokan bêne nirxandin. Weke di nirxandina qadên şênkahî yên aktîf li jor jî hatî gotin, heke nava sûran herêmeke ku nû ji avadaniyê re hatiba vekirin, li gorî rêziknameya avakirina planên mekanî ji bo her ferdek mecbûr diviya herî kêm 0,5 m² pêşdibistan, 0,75 m² qada tesîsên civakî û çandî bihata veqetandin. Yanê li gorî vê, di şertên normal de ji bo nifûsa li nava sûran dê hewceyî bi 19.000 m² pêşdibistan û 28.500 m² qada tesîsên civakî û çandî heba. Lê ji ber ku nava sûran qada sîtê ya bajariyî ye , ev rêje di asteke gelek nizim de ne. Di lêkolîna li nava sûran de, weke di Tabloya 3. de jî xuya dike, hatiye tespîtkirin ku mekanê çalakiyên civakî û çandî û di encamê de jî qadên lîstinê ku zarok karibin bi kar bînin tevde tenê sê mekan in.

### Tablo 3: Tabloya lêkolîna qadî ya pêşdibistanan, tesîsên civakî û çandî

| No | Adres | Nav | Çalakî |
|---|---|---|---|
| 1 | İskender Paşa Kuçeya Paluyê. No: 5 | Pirtûkxaneya Şaredariya Sûrê û Mala Zanyariyê | Çalak |
| 2 | Taxa Ziya Gökalp Kuçeya Yeşilê No:2 | Navenda Ciwanan û Hunerê ya Şaredariya Sûrê | Çalak |
| 3 | Taxa Cemal Yılmaz Kuçeya Şair Sırrıyê Ada: 247 Parsêl: 1 | Pirtûkxaneya Zarokan a Weqfa Perwerdeya Tirk a Şaredariya Sûrê | Çalak |



## 2.4. Rewşa Heyî Ya Parkên Lîstinê û Wesfên Wan

Parkên lîstikê, ligel ku yek ji wan qadan e ku zarok herî zêde lê wext derbas dikin, di heman deme de yek ji wan qadan e ku zarok herî zêde lê birîn dibin ango bi binpêkirinan re rû bir û dimînin. Ji ber vê yekê gelek girîng e ku parkên lîstikê ji bo zarokan ewle bin. Li Tirkiyeyê, li ser binpêkirinên ku zarok li qadên lîstikê pê re rû bir û dimînin yan jî li ser birînbûna wan daneyên statîstîkî tunene. Loma, ji bo fêmkirina cidiyeta asta birînbûna zarokan an jî binpêkirinên mafên zarokan li qadên lîstinê, daneyên statîstîkî yên welatên cuda hatine lêkolînkirin.

Rapora ku qezayên li qadên lîstinê yên li Îngîltereyê pêk tên dihundirîne, radigihîne ku her sal 40.000 zarok serî li nexweşxaneyan didin û %80yê van birînbûnan ji ber li erdê ketinê rû didin(URL-3, 2018, yên neql dikin: Sarıaslan-Senyen û Erdoğan, 2019). Heman rapor radigihîne ku zarok herî zêde ji hêlekanê dikevin û %20ê birînbûnan ji ber lêdana hêlekanê, asêmayîna dest û lingan pêk tê.

Tê diyarkirin ku di sala 2005an de li Îsraîlê %4ê li erdê ketinan ku midaxileya tibî diviyaye, li qadên lîstinê pêk hatine(Sethi et. jêgir, 2008 yên neqil dikin: Sarıaslan-Senyen û Erdoğan, 2019).

Li tevahiya welatên Yekîtiya Ewropayê her sal kêm zêde 5.600 zarok li qadên lîstinê li erdê dikevin û loma xizmeta tibî werdigirin. Birînbûnên ji ber ketinê, %72yê birînbûnên li qadên lîstinê tînin pê. (Sethi et. jêgir, 2008, yên neqil dikin: Sarıaslan-Senyen û Erdoğan, 2019).

Li Swêdê, li qadên lîstinê her sal hema hema 12.000 birînbûn pêk tên ku ev miqabilî %6ê birînbûnên zarokan in.(Sethi et. jêgir, 2008, yên neql dikin: Sarıaslan-Senyen û Erdoğan, 2019). Di salên 1995-1996an de, bûyerên birînbûnê yên li qadên lîstinê qewimîne, hema hema %55ên wan bi şikestin, cîderketin û şewşbûna hiş biencam dibin.

Li Koreyê di navbera salên 2011-2014an de li ser qezayên li qadên lîstinê pêk hatî, hatine lêkolînkirin da ku rîska trawmaya hişî û şikestinên lebatan derxe holê. Li gorî vê lêkolînê, %48,5ê 6110 zarokên 0-7 salî ku serî li nexweşxaneyan dane, ji ber ketinê birîn bûne(Bae et. jêgir, 2017, yên neql dikin: Sarıaslan-Senyen û Erdoğan, 2019). Rêjeya birînbûnên ji ber kaşûnê %40,5, yên ji ber hêlekanan %18 ne û %56,6ên van birînbûnan weke birînbûnên serî û stû hatine qeydkirin. Şewşiya hişî bi zarokên 0-2 salî û hêlekanan ve hatiye girêdan, şikestinên dest û piyan bi zarokên 3-7 salî û amrazên hilkişînê ve hatine têkildarkirin. Amrazên lîstinê yên ku dibin sebebê şikestinên ling û çîpan weke barên berwarî, benikên şidiyayî û trambolîn hatine diyarkirin.

Ev tecrubeyên ku li welatên cuda pêk hatine, li Tirkiyeyê jî kirine ku standardên derheqê qadên parkên lîstinê de derkevin holê. Standardên bi navê “Amrazên Qadên Lîstinê û Verastkirina Zemînê” yên Enstîtuya Standardên Tirk, ji hin standardên têkildarî parkên lîstinê û derdorên wan pêk tên.

Ev standard, li Enstîtuya Standardên Tirk wiha hatine veqetandin;

- Rêgezên ewlehiya giştî û rêbazên ceribandinê
- Rêgezên lêzêdekirî yên ewlehiya taybet ji bo hêlekanan û rêbazên ceribandinê
- Rêgezên lêzêdekirî yên ewlehiya taybet ji bo kaşûnan û rêbazên ceribandinê
- Rêgezên lêzêdekirî yên ewlehiya taybet ji bo sarsarokan û rêbazên ceribandinê
- Rêgezên lêzêdekirî yên ewlehiya taybet ji bo amrazên hejînê û rêbazên ceribandinê (Sarıaslan Senyen û Erdoğan, 2019).

Ev standard, divê di çarçoveya mukelefiyên pozîtîf ên dewletan ên girêdayî temînatkirina mafê jiyînê yê zarokan de bêne nirxandin. Dewlet mukelef in ku mafên zarokan biparêzin, bi cî bînin û rêz bigirin li wan. Di vê kontekstê de, her birînbûna li parkên zarokan ango xisara ji kesek din, divê di konteksta bicîneanîna mukelefiyên parastin û bicîanînê yên dewletê de werin nirxandin. Di heman demê de divê neyê jibîrkirin ku meriv kare ber li van binpêkirinan bigire.


## 2.4.1. Di Konteksta Mafên Zarokan De Nirxandina Parkên Zarokan Ên Li Nava Sûran

Divê neyê jibîrkirin ku standardên têkelî parkên zarokan, di çarçoveya mukelefiyên parastin û bicîanînê yên de mukelefiyên dewletê ne. Bi îlhama standardên TSEyê û xebatên akademik, bi rêya bernîşaneyên li jêr, lîsteya kontrole hatiye amadekirin. 6 parkên li nava sûran ku komên lîstinê lê hene, ji aliyê standardên di lîsteya kontrolê de hatine lêkolînkirin. Di vê lîsteya kontrolê de; gelek bernîşane hatine diyarkirin ku ka taybetmendiyên ciyên ku qadên lîstinê lê hatine avakirin çi ne, raxera zemînê çawa ye, avahiyên ku li qadên lîstinê bibin sedema rîskê çi ne, beralîkirinên lewha/tabelayan çawan in, prensîba wekheviyê ya zayendiya civakî pêk hatiye yan na, zarokên taybet karin bi kar bînin an na.

Di nava bernîşaneyan de pirsek heye ku dibêje li nêzîkî parkên lîstinê yan jî derdorên wan wesaîtên bizirx an jî qereqolên aîdî hêzên ewlekarî hene yan na. Di navbera salên 2015-2016an de pevçûnên çekdarî yên giran qewimîn, hingê hat angaştkirin ku hêzên ewlekariyê hin zarokan kuştine. Ev pirs, xwe dispêre paşperdeya vê yekê. Raporên gelek rêxistinên mafên mirovan hene ku dibêjin di navbeyna salên 2015-2016an de, di pevçûnên çekdarî yên li Diyarbekir û bajarên derdora wê de 123 zarok hatine kuştin û bi giranî berpirsiyarêb van hêzên ewlekariyê yên dewletê ne. Têkildarî zarokên ku di pevçûnên çekdarî de hatine kuştin, bi awayeke qestî lêpirsîn nayên kirin, destûr nadine saziyên bêalî da ku raçaviyê bikin û binpêkirinan tespît bikin. Raporên rêxistinên mafên mirovan jî gava li ber çavan tên girtin qineteke xurt peyde dibe ku ev îdîa rast in. Ev binpêkirin, tesîreke neyînî li têkiliya zarok û malbatan ligel hêzên ewlekariyê dikin. Di vê kontekstê de, tê hizirîn ku heke li derdora parkên lîstinê qereqol û wesaîtên bizirx hebin, ev dê tesîreke neyînî li zarok û malbatan bike ku parkan/qadên şênkahî bikarneynin, loma jî vê yekê din ava bernîşaneyan de cî girtiye.


Ewlehiya dorhêlê; serenavên weke derbasokên erebeyan li ser rêyên ku zarok pê de biçin parkên lîstinê, ewlehiya trafîkê, çal û înşaat, avahiyên ku dikin xera bibin, tesisata ceyranê dihundirîne.

Di vê kontekstê de, divê parkên zarokan li deverên ku kolanên sereke lê hene û zêde erebê lê têne bikaranîn, neyên avakirin; heke bê avakirin jî divê rêya peyayan, lembeyên trafîkê û



## Fotoyê 1.: Nêzîkahiya parkan bo kolanên sereke





Di lêkolîna qadî de hatiye raçavkirin ku ji 6 parkan sê heb li qadên ku kolanên sereke û trafîka erebeyan lê zêde ne, hatine avakirin; **li derdora van parkan rêya peyayan, lembeyên trafîkê û lewhayên hişyarker tuneye.**

Halbûkî li gorî daneyên sala 2019an ên Saziya Statîstîkê ya Tirkiyeyê di qezayên trafîkê de 574 zarokan jiyana xwe ji dest dane, 51.650 zarok jî birîndar bûne. Li Diyarbekirê jî, her çiqas li gorî temenên wan agahî tunebe jî, 43 kesan jiyana xwe ji dest dane, 4.299 kesa jî birîndar bûne. Divê neyê jibîrkirin ku kare ber li van binpêkirinan bê girtin û divê demildest tevdîrin bêne girtin.

## Fotoyê 2.: Nebûna şirîtên ewlehiyê û bariyeran li qadên xeternak





Ji 6 parkan, li nêzîkî çar hebên wan çal û qadên înşaatê ku karin bibin rîsk hene, lê li derdora sê hebên van ti şirîteke ewlehiyê yan jî bariyer nînin.

## Fotoyê 3.: Rîskên ji ber tesisata elektrîkê





Hatiye tespîtkirin ku di nav 6 parkan de, li du heban tesîsata ceyranê dibe sedema rîska mirinê.

**Fotoyê 4.: Deverên ku talûkeya wan a hilweşînê hene**
lewhayên hişyarker hebin.





Li nêzîkî temamê 6 parkan, avahiyine hebûn ku dikirin xera bibin.

Serenavê **xwegihandina pêdiviyên bingehîn li parkan**; mijarên weke ava vexwarinê ya paqij û tiwalet li derdora parkê, ronîkirin, sîber, qadên şênkahî, hijyen, qadên ku malbat jî lê wext derbas bikin dihundirîne. Raçaviya derheqê van sernavan de wiha ye;

### Fotoyê 5.: Xwegihandina pêdiviyên bingehîn li parkan



Di nava parkan de xizmetên ku pêdiviyên tiwalet û ava vexwarinê ya paqij dabîn bikin, nînin.

Tenê li parkekê, ku di fotoyê de xuya dike, tiwaletek hebû lê têketina vê tiwaletê jî ne ji bo zarokan bû, heta mezinan jî nikaribûn xwe bigihîninê.



### Fotoyê 6.: Parkên li qadên şênkahî

Ji 6 parkan 4 jê li qadeke şênkahî hatiye avakirin. Vê yekê dike ku qada ku zarok lê wext derbas bikin fireh be û malbatên zarokan jî ligel wan bibin.

Li ti parkê sîbereke têra xwe tuneye, li du parkan jî têra xwe ronî tuneye. Ev yek dibe asteng ku malbat û zarok parkan bi kar bînin. Nebûna sîberan, nemaze di mehên havînê de ji aliye tenduristiyê ve dibe sedema hin rîskan. Ji aliye bikaranîna malbatan ve, hatiye raçavkirin ku tenê du park li gorî ku malbat jî karibin lê wext derbas bikin hatine verastkirin.

Hatiye raçavkirin ku tenê parkeke lîstinê ji aliyê hîjyenê ve paqij e. Ev yek, nemaze di dema belavbûna vayrûsa COVID-19ê de divê weke rîskekê bê nirxandin.

## Nirxandina Parkên Lîstinê Ji Aliyê Rîskan Ve

Di bin vî serenavî de taybetmendiyên parkan ên li jêr hatî rêzkirin, hatine raçavkirin:

- Zemînên parkan ji bo derbeyan nerm in an na,
- Komên lîstinê durist hatine montekirin an na,
- Li gorî rîska ketina ji jor de hatine verastkirin an na,
- Cax an jî navberên di komên lîstinê de li gorî ku lebatên weke dest, pî, çîp an serî tê de asê nemîne hatine verastkirin an an,
- Komên lîstinê li gorî ku gava zarok ji dereke bilind bikevin nebe sedema birînbûnên cidî,
- Qoqizên tûj û derkenar baş hatine verastkirin da ku gava zarok li dereke biqelibin birîn nebin,
- Li parkên lîstinê, di dema pêkhatina binpêkirina mafên zarokan de mekanîzmayeke agahdariyê yan jî sepandinek heye yan na ku zarok serî lê bidin,
- Li derdora parkên lîstinê wesaîtên bizirx ên aîdî hêzên ewlekariyê yan jî qereqol hene yan na(Ewlehî, qutiya gilîkirinê, xeta îxbarê û weke din).

Rewşa heyî ya parkên nava sûran ku bi van standardan hatine nirxandin, îsaret îhmalkirina mafên zarokan dike.



### Fotoyê 7.: Rîsk û talûkeyên ku li qadên lîstikê hatine tespîtkirin



Gava parkeke zarokan bi van standardan bê nirxandin, rîskên ku dibe derkevin li ber çavan radixe. Ligel vê divê dewlet kontrolên birêkûpêk bike ku ka ev standard têne bicîanîn an na.

Weke ku di fotoyê de tê dîtin, di konteksta rîskan de li parkan ti standard nayên bicîanîn. Ligel vê, li ti parka lîstinê li dijî binpêkirina mafekî mekanîzmayek nîne ku zarok serî lê bidin(ewlehî, mekanîzmayên gilîkirinê).









Hatiye tespîtkirin ku ji 6 parkên lîstinê yên li nava sûran yek jî ne li gorî zarokên ku nabînin, nabihîzin û ji aliyê fizîkî ve berasteng in, hatine çêkirin. **Ji bo zarokên berasteng ti verastkirin nînin û ev, binpêkirina qedexeya ciyawaziyê tê hesibandin.** Hatiye tespîtkirin ku derheqê pîleya zehmetiya qadên lîstinê de û derheqê komên temenan de lewhayên agahdarkirinê nînin. Parkên lîstinê bi awayê ku zarokên qîzîn û lawîn karibin bi hev re lê bilîzin, hatine verastkirin. Ti park bi rêyên meşê û pisqilêtê nehatine destekkirin. Di vê kontekstê de, divê parkên lîstinê di çavan re bên derbaskirin û pêşî li birînbûn û binpêkirinên muhtemel bên girtin. Bi rastî jî rewşa heyî ya parkan, dibe sedem ku zarok parkan bi kar neynin. Ev rewş di encamên tablo 24 û tablo 25an de jî derdikeve holê.

# 3. LI NAVA SÛRAN HALÊ LÎSTIKÊ[15,16]

“Mafê lîstinê, tê wê maneyê ku mafê her kesî heye ku bi lîstikê bilîze. Di dema lîstikê de amûr û alavên me yan benik in, yan jî gog in. Mesela gava em bi gogê dilîzin, bi me re dixeyidin û dibêjin ‘meleyzin’. Destûrê nadin ku em bi lîstikan bilîzin.”15

Di salên 2015-2016an de bi destpêka pevçûnên çekdarî li nava sûran, li 6 taxan(Hasırlı, Cevat Paşa, Fatih Paşa, Dabanoğlu, Cemal Yılmaz, Savaş) qedexeya derketina derve hat îlankirin, vê yekê him xisareke madî/manewî gihand insanan, him jî xisareke cidî gihand vehûna tarîxî û fizîkî ya navçeyê û nirxên civakî-çandî. Insanên ku di nava pevçûnan de man, neçar man ku warên xwe biterikînin. Li gorî rapora 2016an a Yekîtiya Odeyên Mîmar û Endezyaran a Tirkiyeyê; piştî ku pevçûn bidawî bûn li 6 taxên qedexekirî hema hema nîvê nifûsê hatiye dercîkirin û bi biryara Îstimlaqkirina Lezgîn xerakirina qadên jiyanî bileztir bûye.16

Li navçeya Sûrê ya navendî ya Diyarbekirê, pevçûnên çekdarî yên ku di navbera salên 2015-2016an de qewimîn û qedexeyên derketina derve ku demeke dirêj berdewam bûn, bûn sedem ku insanên li nava sûran, gelek tişt winda bikin. Di vê prosesê de ji mezinan cihêtir, zarokan ji ber temenên xwe van kiryaran fêm nekirine û loma bêhtir di bin tesîrê de mane. Di heman demê de, ji ber qedexeyên derketina derve û pevçûnan, zarok demeke dirêj ji kuçeyên ku weke qadên lîstinê bi kar dianîn û ji prosesên perwerdeyê cihê mane.

Vê beşa xebatê, berê xwe dida van mijaran; piştî prosesên ku ji aliyê madî/manewî tesîreke giran li şêniyên nava sûran kirin, zarokên ku jiyana wan li nava sûran berdewam kir gihan mafê lîstinê yan na, qelîteya qadên lîstinê çawa bû û zehmetiyên ku dîtin çi bûn. Tablo û şîrove cî digirin ku qadên lîstinê yên zarokan ên li mal û li derve û qelîteya van qadan; cureyên qezayan ên ji ber mercên fizîkî yên qadên lîstinê, sekna dê û bavan û şêniyên taxan li hemberî mafê lîstina zarokan, dihundirînin. Ligel vê nêrîn û raçaviyên dê û bavan û muxtarên taxan derheqê vê mijarê de jî cî digirin.



15-) Ji xebata komî ya nîvend ku di 22 Şubat 2021an de ligel zarokên lawîn hatiye kirin

16-) http://www.tmmob.org.tr/yayin/tmmob-yikilan-kentler-raporu

## 3.1. Taybetmendiyên Demografîk Ên Beşdaran

**Tabloya 4.: Tabloya taxên ku beşdarên anketê lê dijîn**

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Ziya Gökalp | 15 | 13,0 |
| Lalebey | 15 | 13,0 |
| Cevat Paşa | 14 | 12,2 |
| Dabanoğlu | 19 | 16,5 |
| Iskender Paşa | 18 | 15,7 |
| Cami Kebir | 17 | 14,8 |
| Ali Paşa | 17 | 14,8 |
| **Tevde** | **115** | **100,0** |

Anket, li 7 taxan hatine kirin ku derheqê wan de biryara veguherîna bajariyî û îstimlaqkirina lezgîn hatine dayîn û pevçûnên navbera salên 2015-2016an ên li nava sûran û qedexeyên derketina derve tesîrê li wan kiriye yan jî ji ber vê hatine xerakirin lê bi temamî nehatine valakirin.

**Tabloya 5.: Tabloya zayendiyê ya zarokên beşdarî anketê bûne**

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Qîz | 53 | 46% |
| Law | 62 | 54% |
| **Tevde** | **115** | **100,0** |

Gava meriv dêhna xwe bide dabeşiya zayendiya beşdaran, meriv dibîne ku zarokên lawîn bi rêjeya %54 beşdar bûne. Di xebatê de her çiqas wekheviya zayendî esas hatibe girtin jî, ji ber ku hejmara zarokên qîzîn ji ya zarokên lawîn kêmtir bûye, hedefa wekheviyê pêk nehatiye.

**Tabloya 6.: Tabloya zayendiyê ya beşdarên mulaqatê**

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Jin | 21 | 84.0 |
| Mêr | 4 | 16.0 |
| **Tevde** | **25** | **100.0** |

Gava meriv li dabeşiya zayendî ya beşdarên mulaqatê mêze dike, meriv dibîne ku %84ên wan jin in. Sedemeke vê ev e ku di dema mulaqatan de bi piranî jin li malan bûne.

### Tabloya 7.: Tabloya taxên ku beşdarên mulaqatê lê dijîn

| | Mahalle | Görev |
|---|---|---|
| Muhsin Sanay | Ziya Gökalp | Muhtar |
| Abdullah Çetin | Lalebey | Muhtar |
| Mehmet Değer | Cevat Paşa | Muhtar |
| Abdullah Barbak | Dabanoğlu | Muhtar |
| Cengiz Ekici | Cami-Kebir | Muhtar (Görevden alınmış) |
| Bülent Uygun | İskender Paşa | Muhtar 1. Aza |

Ev xebata qadî li 7 taxan ligel 4 muxtaran, muxtarek ku hatiye hilbijartin lê paşê ji peywirê xwe hatiye bidûrxistin û li taxekê jî ji berk u muxtar ne amade bûye ligel ezayê wî yê yekem hatiye kirin. Li Taxa Ali Paşayê jî ji ber pirsgirêkên wan ên tenduristiyê ligel muxtar û eza hevdîtin pêk nehatiye.

### Tabloya 8.: Dabeşiya zayendî li gorî temenên beşdarên anketê

| | | | Zayend | | Tevde |
|---|---|---|---|---|---|
| | | | Qîz | Law | |
| Temenê we? | 8 Salî | Hejmar | 9 | 4 | 13 |
| | | Ji sedî | 69,2% | 30,8% | 100,0% |
| | 9 Salî | Hejmar | 5 | 8 | 13 |
| | | Ji sedî | 38,5% | 61,5% | 100,0% |
| | 10 Salî | Hejmar | 6 | 11 | 17 |
| | | Ji sedî | 35,3% | 64,7% | 100,0% |
| | 11 Salî | Hejmar | 9 | 11 | 20 |
| | | Ji sedî | 45,0% | 55,0% | 100,0% |
| | 12 Salî | Hejmar | 7 | 13 | 20 |
| | | Ji sedî | 35,0% | 65,0% | 100,0% |
| | 13 Salî | Hejmar | 3 | 10 | 13 |
| | | Ji sedî | 23,1% | 76,9% | 100,0% |
| | 14 Salî | Hejmar | 7 | 2 | 9 |
| | | Ji sedî | 77,8% | 22,2% | 100,0% |
| | 15 Salî | Hejmar | 7 | 3 | 10 |
| | | Ji sedî | 70,0% | 30,0% | 100,0% |
| Tevde Ji sedî | | Hejmar | 53 | 62 | 115 |
| | | 46,1% | 53,9% | 100,0% | |

Gava meriv li grafîka temen û zayendê ya başdaran mêze dike; meriv dibîne ku him zarokên qîzîn, him ên lawîn di navbeyna temenê 8-12 de ne. Ligel zarokên qîzîn ên 14-15 salî, anket li bexçeyên/hewşên malan hatine kirin. Bi piranî, qîz û lawên bi ser 12 salî re li taxên xwe wext derbas nakin. Yek ji sedemên herî bingehîn jî ew e ku qadên lîstinê xîtabî grûbên temenê wan nakin. Dê û bav û şêniyên taxan him ji ber ewlehiyê, him jî ji ber rolên zayendiya civakî erê nakin ku zarokên qîzîn ên bi ser 12an re li derve wext derbas bikin. Ev jî sedemeke din e. Beşdaran derheqê vê rewşê de wiha gotin;

> "Ji bo zarokên qîzîn derve gelek xeter e. Bifikire ku ez zarokê xwe yê lawîn bernadim derve, tu yê çawa zarokê xwe yê qîzîn çawa berdî derve? Ji aliyekî ve difikirim, dibêjim; baş e ku qîza min tuneye." (Jin, 51 Salî, Taxa Ali Paşayê)
>
> "Zarokên qîzîn ên biçûk jî li kuçeyên navber, li ber derê xwe karin bilîzîn. Zarokên qîzîn heye 10 saliya xwe karin derkevin derve lê malbatên zarokên ji 10î mezintir destûrê nadin" (Abdullah, Muxtarê Lalebeyê)

### Tabloya 9.: Rewşa perwerdeyê ya beşdarên anketê

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Dibistana seretayî | 40 | 34,8 |
| Dibistana navîn | 59 | 51,3 |
| Lîse | 12 | 10,4 |
| Naçe dibistanê | 4 | 3,5 |
| **Tevde** | **115** | **100,0** |

%96,5ê beşdaran diyar kirine ku li saziya perwerdeyê perwerdeya xwe didomînin, lê %3,5ê wan diyar kirine ku nadomînin. Beşdarek diyar kiriye ku ji ber sedemên aborî perwerdeya xwe nadomîne/nikare bidomîne; yekê diyar kiriye ku him ji ber sedemên aborî, him jî bi daxwaza xwe nadomîne, herdu beşdarên din jî diyar kirine ku ji ber ku berî ji Sûriyeyê bêne Tirkiyeyê neçûne dibistanê liv ir jî nikarin biçinê.

### Tabloya 10.: Agahiyên şêniyên malê yên beşdarên anketê

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| 3-5 kes | 42 | 37% |
| 6-8 | 57 | 50% |
| 9-11 | 12 | 10% |
| 12 û bi ser ve | 4 | 3% |
| **Tevde** | **115** | **100%** |

Gava meriv li hejmara şêniyên malan ên beşdaran mêze dike; meriv dibîne ku %50ên wan di navbeyna 6-8an de, %37ên wan di navbeyna 3-5an de, %10ên wan di navbeyna 9-11an de û %3ên wan bi ser 12an ve ne.

**Tabloya 11.: Agahiya rewşa berastengiyê ya beşdaran**

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 3 | 3,45 |
| Na | 112 | 96,55 |
| **Tevde** | **115** | **100,0** |

%3ê beşdaran, diyar kirine ku di warê dîtin, bihîstin û xeberdanê de berasteng in. Beşdarên me yê berasteng diyar kirine ku her roj nikarin li derve wext derbas bikin, gava dixwazin derkevin derve jî kesek ji malbatê bi wan re derdikeve.

**Tabloya 12.: Agahiya nasnameya etnîk a beşdarên anketê**

| | Sayı | Yüzde |
|---|---|---|
| Kurd | 93 | 83,0 |
| Tirk | 10 | 8,9 |
| Ereb | 2 | 1,8 |
| Dom | 1 | ,9 |
| Yên din | 5 | 4,5 |
| Nizane | 1 | ,9 |
| **Tevde** | **112** | **100,0** |

%83ê beşdaran nasnameya xwe ya etnîk weke kurd, %8,9ê wan weke tirk, %1,8ê wan weke ereb diyar kirine. %0,9ê beşdaran bersiva vê pirse nedane, %0,9ê wan jî diyar kirine ku nasnameya wan a etnîk Dom e17 û yê bi qasî van jî gotine ku bi nasnameya xwe ya etnîk nizanin. %4,5ê beşdaran jî, ji bo ku zaravayê zazakî(kirmanckî) yê zimanê kurdî bi kar tînin, nasnameya xwe ya etnîk weke zaza diyar kirine.

## 3.2. Mafê Lîstinê Li Malê[17]

Lîstik jî nebin, ma wê ji zaroktiya me çi bimîne?

Tolstoy

Mal, qada ewil e ku zarok lê dest bi lîstinê dikin. Mala ku weke qada ewil a lîstinê tê kifşkirin, bi demê re ji aliyê zarok zarokan de girêdayî temen û taybetmendiyên bipêşketinê vediguhere. Lîstikên ku her zarok di hundirê malê de bi pêş bixin û cureyên pêlîstokên zarokan ji mercên civakî-çandî û aborî yên malê serbixwe diyar nabin. Ligel vê guhêrbarên weke binyada mîmarî ya malê, mercên fizîkî, hejmara şêniyên malê jî tesîr li çanda lîstinê û aktîvîteyên li malê dikin.

17-) Komeke etnîk in ku ji gelên Roman in û li herêmê xwe weke "Dom" bi nav dikin

### Tabloya 13.: Agahiya bê ka li malê çawa wext derbas dikin[18]

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Lîstina bi pêlîstokan | 29 | 26% |
| Temaşekirina televîzyonê | 45 | 40% |
| Xwendina pirtûkan | 39 | 35% |
| Xebata dersan | 35 | 31% |
| Ez li ser înternetê wext derbas dikim | 24 | 21% |
| Yên din | 24 | 21% |
| Tevde | 196 | 173% |

%40ê beşdaran diyar kirine ku li malê televîzyonê temaşe dikin, %35ê wan diyar kirine ku pirtûkan dixxwînin, %31ê wan diyar kirine ku ders dixebitin, %26ê wan diyar kirine ku bi pêlîstokan dilîzin, %21ê wan diyar kirine kul i ser înternetê wext derbas dikin û yên di vebijarka yên din de cî girtine jî bi piranî qîz in û diyar kirine ku alîkariya dayîkên xwe dikin û li xwişk û birayên xwe yên biçûk mêze dikin. Zarokên lawîn jî diyar kirine ku bi piranî li ser tabletê bi lîstikan dilîzin û li ser înternetê wext derbas dikin.

### Tabloya 14.: Agahî li ser ciyê lîstikên li malê

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 59 | 52,2 |
| Na | 39 | 34,5 |
| Carna | 15 | 13,3 |
| Tevde | 113 | 100,0 |

Ji beşdaran hatiye pirsîn ka li malê qada wan a lîstinê heye yan na; %52,2yê wan diyar kirine ku karin li malê bilîzin, %34,5ê wan diyar kirine ku nikarin li malê bilîzin, %13,3ê wan jî diyar kirine ku carna karin bilîzin.

### Tabloya 15.: Sedemên nekarîna lîstinê li malê[19]

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Mal ji bo lîstinê ne guncav e | 19 | 41% |
| Dê û bavê min destûrê nadin | 5 | 11% |
| Xwişk û birayên min destûr nadin | 1 | 2% |
| Qet pêlîstokên min nînin | 11 | 24% |
| Ez êdî ne zarok im | 10 | 22% |
| Yên din | 12 | 26% |
| Tevde | 58 | 126% |

18-) Ji ber ku di vê pirsê de rêbaza bersivên pirayî hatiye bikaranîn, tevahiya wan %100 derbas dibe.

19-) Ji ber ku di vê pirsê de rêbaza bersivên pirayî hatiye bikaranîn, tevahiya wan %100 derbas dibe.

> Dibistan yek ji wan qadan e ku zarok herî zêde lê wext derbas dikin. Bi prosesa pandemiyê re ew hatin girtin û li gorî beriya pandemiyê zarok kêmtir derdikevin der, loma li malê bêhtir wext derbas dikin

%41ê beşdaran ku gotine nikarin li malê bilîzin, diyar kirine ku mercên fizîkî yên malê ne guncav e. Ji 115 zarokên ku beşdarî ankete bûne, 57ên wan tevî 6-8 şêniyên malê dijîn. Ligel vê agahiyê, ev encam mixabin ne ecêb e. Piraniya beşdarên ku vebijarka yên din îşaret kirine, ji zarokên qîzîn pêk tên. Zarokên qîzîn diyar kirine ku "Alîkariya dayîkên xwe dikin bo karûbarên malê, li xwişk û birayên xwe yên biçûk mêze dikin", loma nikarin li malê bilîzin. Zarokên lawîn jî diyar kirine ku li ser telefonê bi lîstikan dilîzin û televîzyonê temaşe dikin û wisa wext derbas dikin. %24ê beşdaran diyar kiriye ku qet pêlîstokên wan tuneye, %22ê wan jî diyar kiriye ku xwe "weke zarokan nabînin", loma jî li malê bi lîstikan nalîzin. %11ê beşdaran jî diyar kirine ku dê û bavên wan destûrê nadin ku li malê bilîzin.

Di xebata koma nîvend a ligel zarokên qîzîn de20 beşdarek sedema destûrnedana dayîka xwe wiha îfade kiriye: Li malê pêlîstokên me hene lê em nîv saetê dilîzin, çimkî diya min tê û dibêje 'Pêlîstokên xwe rake, malê ji hev nexe'. Di heman xebata nîvend de beşdarek ku diyar kiriye li malê pêlîstokên wê nînin, xwe wiha îfade kiriye: Li malê pêlîstokên min nînin. Em çarşevê diavêjin ser têla cilan(hilcoya zuhakirina cilan) û ji xwe re kon vedidin.

Dê û bavan, têkildarî qadên lîstina zarokan ên li malê wiha gotine:

*"Zarokên biçûk xwe bi xwe dilîzin. Bi balgîfan, mînderan... Kirlentên qenepeyan datînin ser hev û li ser wan teqle diavêjin. Ji xwe re dilîzin ha. Ji xwe re lîstikan çêdikin. Mala min ji bo lîstikê pirr ne guncav e, hewşa wê jî nîne lê dilîzin wisa li orteya rastê. Teqle diavêjin, ji xwe re tiştên weke yên Survivorê dilîzin. Ew e, ma dê çi bikin weke din."(Jin, 30 Salî, Taxa Lalebeyê)*

*"Mal biçûçik, ode sar in. Zarok bi balgîfên xwe dilîzin. Pêlîstokên wan nînin." (Mêr, 32 Salî, Taxa İskender Paşayê)*

*"Li malê cî tuneye. Li hewşê dilîzin. Bi gogê dilîzin, çavgirtînk heye, bi lîstikên wisa dilîzin yanê. Te dît ji ber ku pêlîstokên wan jî nînin..." (Jin, 40 Salî, Taxa Ziya Gökalpê)*

*"Di destpêka ewil a pandemiyê de, Komeleya Rengarenk Umutlarê ji bo ku li malê pê bilîzin êpê alav dan; hevîrê lîstinê, kaxizên karûbarên destan, karton, qelemên boyaxkirinê, pirtûk hebûn, boyaxên pastel, malzemeyên qirtasiyeyê dan.21 Demeke dirêj bi wan ve mijûl bûn. Gava ew alav jî qediyan ew jî li şûna xwe man, tiştek nekirin"(Jin, 51 Salî, Taxa Ali Paşayê)*

Akıllı û Dirikoç (2016) weke yek ji bernîşaneyên herî bingehîn ên ku mehrûmiya alavên lîstinê nîşan dide, nebûna pêlîstokên zarokan li malan îşaret dikin. Gava taybetmendiyên fizîkî yên malên nava sûran û asta dahata malbatan li ber çavan bê girtin, mimkun e ku

20-) Di 23.02.2021an de ligel 6 zarokên qîzîn ên 12-15 salî xebata nîvend hatiye kirin û li wir hatiye parvekirin.

21-) Di hefteyên ewil ên prosesa pandemiyê de ku derketina derve qedexe bû, Komeleya Rengarenk Umutlarê bi rêya telekonferansê xwe gihandibû zarokên ku fêde ji komeleyê werdigirtin, behsa vê xebatê tê kirin.

meriv bibêje mal ji bo zarokan derfeta lîstina bêpêlîstok jî dabîn nakin. Li malên ku zarok lê gelek in, ji ber ku derfetê ferdîbûna zarokan(mîna odeyek aîdî wan) tuneye, -nemaze zarokên lawîn- ji dêvla malê tercîh bikin ku li derve/kuçeyê dilîzin. Tê dîtin ku zarokên qîzîn bi pêlîstokan dilîzin, zarokên ku pêlîstokên wan tunebin jî bi malzemeyên malê dilîzin an jî bi lîstikên ku bêpêlîstok têne lîstin, wext derbas dikin.

### Tablo 16: Agahiya bê ka li malê herî zêde bi kî re wext derbas dikin

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Dê | 1 | ,9 |
| Bav | 3 | 2,8 |
| Et/Kek | 16 | 15,1 |
| Xwişk û bira | 71 | 67,0 |
| Ti kes | 10 | 9,4 |
| Yên din | 5 | 4,7 |
| **Tevde** | **106** | **100,0** |

%82,1ê beşdaran diyar kirine ku bi xwişk û birayên xwe re û bi etên xwe/kekên xwe re wext derbas dikin, %3,7ê wan diyar kirine ku bi dê-bavên xwe re wext derbas dikin. %9,4ê wan diyar kirine ku bi kesî re wext derbas nakin. Beşdarên ku vebijarka yên din îşaret kirine jî, diyar kirine ku bi xwarzan û birazanên xwe re yan jî bi zarokên xaltî, metik, xal û apan re wext derbas dikin.

### Tablo 17: Agahî li ser wextderbaskirina dê û bavan bi zarokan re ?

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 5 | 20,0 |
| Na | 13 | 52,0 |
| Carna | 7 | 28,0 |
| **Tevde** | **25** | **100,0** |

"Ez tenê pêdiviyên zarokan bi cî tînim. Ji ber paqijî, xwarin, karên malê, ji zarokan re wext namîne." (Jin, 32 Salî, Taxa Dabanoğluyê)

Di mulaqatên ligel dê û bavan de, %52ê beşdaran diyar kirine ku bi zarokên xwe re têra xwe wext derbas nakin, %28ê wan diyar kirine ku carna wext derbas dikin, %20ê wan jî diyar kirine ku bi zarokên xwe re wext derbas dikin.

Dê û bavan sedemên wextderbasnekirina bi zarokan re wiha anîne ziman:

*"Vê prosese, ji ber ku em tim li mal in, bistres û bi tengaviyê derbas dibe. Ji ber ku zarok tim li mal in nîqaş jî zêde bûn. Karên malê qet naqedin. Ji zarokan re wext namîne."*


*(Jin, 46 Salî, Taxa Cevat Paşayê)*

Dibistan yek ji wan qadan e ku zarok herî zêde lê wext derbas dikin. Bi prosesa pandemiyê re ew hatin girtin û li gorî beriya pandemiyê zarok kêmtır derdikevin der, loma li malê bêhtir wext derbas dikin. Dayîkên ku beşdarî mulaqatê bûne, tim diyar kirine ku di vê prosesê de barê wan girantir bûye, loma nikarin ji zarokên xwe re têra xwe wext veqetînin.

### Tabloya 18.: Agahiya lîstik û pêlîstokên ku herî zêde dilîzin[22]

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Lîstikên kompîtorê | 13 | 18% |
| Gog | 24 | 32% |
| Çek | 10 | 14% |
| Bebik | 16 | 22% |
| Xar | 2 | 3% |
| Qaq | 1 | 1% |
| Benik | 1 | 1% |
| Erebe | 13 | 18% |
| Yên din | 33 | 45% |
| Tevde | 113 | 153% |

%32ê beşdaran diyar kirine ku bi lîstikên ku bi gogê têne lîstin; %22ê wan bi bebikên lekî, %18ê wan bi erebeyên pêlîstok û lîstikên kompîtorê, %14ê wan jî bi çekên pêlîstok dilîzin.



22-) Ji ber ku di vê pirsê de rêbaza bersivên pirayî hatiye bikaranîn, tevahiya wan %100 derbas dibe

### Tabloya 19.: Dabeşiya çeprast li gorî zayendiyê ya lîstik û pêlîstokên ku herî zêde tên bikaranîn

| Lîstik/Pêlîstok | | Zayend | | |
|---|---|---|---|---|
| | | Qîz | Law | Tevde |
| Lîstikên kompîtorê | Hejmar | 2 | 11 | 13 |
| | Ji sedî | 15% | 85% | 100% |
| Gog | Hejmar | 4 | 20 | 24 |
| | Ji sedî | 17% | 83% | 100% |
| Çek | Hejmar | 1 | 9 | 10 |
| | Ji sedî | 10% | 90% | 100% |
| Bebik | Hejmar | 15 | 1 | 16 |
| | Ji sedî | 94% | 6% | 100% |
| Xar | Hejmar | 0 | 2 | 2 |
| | Ji sedî | 0% | 100% | 100% |
| Qaq | Hejmar | 0 | 1 | 1 |
| | Ji sedî | 0% | 100% | 100% |
| Benik | Hejmar | 1 | 0 | 1 |
| | Ji sedî | 100% | 0% | 100% |
| Erebe | Hejmar | 1 | 12 | 13 |
| | Ji sedî | 8% | 92% | 100% |
| Yên din | Hejmar | 15 | 17 | 32 |
| | Ji sedî | 45% | 52% | 100% |

Tê dîtin ku zarokên qîzîn li malê bi bebikên lekî, benik û lîstikên gogê wext derbas dikin, zarokên lawîn jî bi xaran, qaqan, erebeyên û çekên pêlîstok dilîzin. Li gorî vebikarka yên din zarokên qîzîn diyar kirine ku lîstikên weke çavgirtînk, hevgirtin, malîkanê ku ne hewceyî pêlîstokan in dilîzin, gava dilîzin jî malzemeyên weke alavên metbexê û balgîf, kirlentan vediguherînin pêlîstokan. Zarokên lawîn jî diyar kirine ku bi lîstikên weke şer/lihevxistin, lego, tiştanoka darikan û lîstikên kaxizan dilîzin, ligel van li ser tablet û telefonan jî bi lîstikan dilîzin. Tê dîtin ku lîstikên ku zarok tercîh dikin li gorî qalibên zayendiya civakî teşe digirin.

### Tabloya 20.: Agahiya bê ka li malê gava bi lîstikê dilîzin qeza derbas dikin an na ?

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 43 | 38,1 |
| Na | 70 | 61,9 |
| **Tevde** | **113** | **100,0** |

“Mal biçûk e...
Lê dîsa jî li malê dibezin. Bi ser yekê de televîzyon ket, yê qîza min jî linge wê şikiya.” (Jin, 49 Salî, Taxa Cami Kebirê)

%61,9ê beşdaran diyar kirine ku li malê qeza derbas nekirine, %38,1ê wan jî diyar kirine ku li malê qeza derbas kirine. Yên ku li malê qeza derbas kirine, diyar kirine ku cureyên qezayan wiha ne; ji derenceyan ketine, destê wan ketiye ber derî, li erdê ketine, dolaba cilan qelibiye, li mobîlyayan qelibîne. Hatiye diyarkirin ku piraniya qezayan di dema lîstinê de pêk hatiye.

Dê û bavan, li ser qezayên li malan ên zarokan vana ragihandine;

“Mal gelek biçûk e... Lê dîsa jî li malê dibezin. Bi ser yekê de televizyon ket, yê qîza min jî lingê wê şikiya.”

(Jin, 49 Salî, Taxa Cami Kebirê)

“Li malê derence hene, ji derenceyê ket. Li ser kolana sereke gava ku dilîst erebeyê li qîza min da, destê wê êşiya, hat pêçangkirin.” (Jin, 32 Salî, Taxa Dabanoğluyê)

“Gava dilîst, tiliya lawê min kete ber derî. Lawê min ê din jî gava çavgirtînkê dilîst çîpê wî ket ber derî.”(Mêr, 32 Salî, Taxa İskender Paşayê)

“Li mal bi hev re har dibin(li hev dixin), gava har dibin jî serê xwe li derekî dixin an jî dev û rûyê wan li derekî dikeve... Bivê nevê qezayên malan dibin. Yanê qezayên cidî nînin, hinekî diranên wan, lêvên wan xwînî dibin.” (Jin, 51 Salî, Taxa Ali Paşayê)

“Li malê derence hene, ji derenceyê ket. Li ser kolana sereke gava ku dilîst erebeyê li qîza min da, destê wê êşiya, hat pêçangkirin.” (Jin, 32 Salî, Taxa Dabanoğluyê

Di rapora UNICEFê ya 2012an de hatiye tespîtkirin zarokên ku li malê aktîvîteyên wan ên fizîkî hatine sînordarkirin û çalakiyên weke bazdan, qevaztin, lîstin û wd. li malê yan jî li dibistanê nekin/nikaribin bikin bi binpêkirina mafî re rû bi rû ne.(yê neql dike: Küçükali, 2015). Bi vê tespîtê, zarok ji ber pandemiyê nikarin biçin dibistanê û li gorî beriya pandemiyê kêmtir derdikevin derve, ev yek prosesên wan ên civakîbûnê û qadên lîstina wan sînordar dike, loma jî tesîreke neyînî li zarokan dike. Gava meriv li binyada mîmarî û mercên fizîkî yên malên nava sûran mêze dike, meriv dibîne ku mal jî ji bo zarokan ciyê lîstinê û xerckirina enerjiye nînin.

Qezayên ku li malan diqewimin, dibe ku bibin sedema mirina zarokan. Komeleya Gündem Çocukê23 di navbera salên 2011-2015an de Rapora Mafê Jiyînê yê Zarokan(2015)24 amade kiriye û raporê kiriye ku ev yek bê dîtin:

23-) Di Mijdara 2016an de bi biryarnameya 677an a di hukmê qanûnê de hat girtin, lê prosesa îtirazê berdewam e.

24-) https://www.raporlar.org/kategori/kurumlar/diger/gundem-cocuk/

**Tabloya 21.: Îstatîstîka qazayên nav malê yên zarokan**

| Sal | 2011 | 2012 | 2013 | 2014 | 2015 |
|---|---|---|---|---|---|
| Hejmar | 18 | 47 | 44 | 55 | 62 |

**Li gorî ku ji raporan tesbît dibe li Tirkiyeyê di navbera salên 2011-2015an de 226 zarokan di qazayên nav malê de jiyana xwe ji dest daye.** Lêbelê helbet divê neyê jibîrkirin ku ev rapor bi daneyên çapemeniyê û bi agahiyên rêxistinên civaka sivîl hatine nivîsîn. Loma tê texmînkirin ku mixabin ev reqem zêdetir in. Û dîsa divê neyê jibîrkirin ku bergiriya mafên jiyanî di nav berpirsiyariyên dewletê de ye.

## 3.3. Têkiliya Kolanan bi Mafên Lîstikê re bi Awayê Qada Giştî û Qada Cihî

Sûr, xwedî profîleke wisa ye ku salên 90î bi koçên zede,  cihê wê fireh bûye lê ji aliyê aborî ve teng bûye. Herçiqasî Sûr bi rûyekî xwe cihên dîrokî, muze û bircên xwe hesteke nostaljîk bi mirovan re çêbike jî bi rûyê xwe yê ji aliyê civakî-aborî ve hejarî û di çarçoveya mafê bajêr de jî bêpariyê nîşan dide. Li gor Bauman, “hejarî tê wê wateyê ku li wê civakê mirov ji hemû îmkanên ‘jiyaneke bextewar’ bêpar bê hiştin û ‘ya ku jiyan mecbûr e bexş bike’ bi dest nexe ku ev jî bi kîn û hêrsê encam dide û bi awayê mirov qîmetê bi xwe nede û reftarên hişk û şidetê xwe dide der.” (1999: 60). Sûr, bi îhmalkirin û nebînayiya xwe ‘sirek e ku her kes pê dizane’. Encama hejarî û îhmalkirinê ya herî girîng jî ew e ku veguheriye cihekî wisa ku sûcdariya li bajêr herî zêde li wir tê dîtin.

Di vê beşê de li ser wê tê rawestin ku nemaze piştî pevçûnên 2015-2016an li Sûrê, hinekî jî bi sedema giranbûna pirsgirêkên civakî û aborî, kolanên cihê lîstika zarokan çawa veguherîne.Gava ji aliyê zaaarokan ve em binirxînin rewş xerabtir e. Avahiyên terkkirî/kavil ku zêde bûne, bo wan zarokan talûke ne ku kolan cihê lîstîka wan e. Saziyên rûniştî yen mîna komele û kooperatîfan ku berî pevçûnê xebatên civakî-çandî û perwerdeyî bi rê ve dibirin, “Bi Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de yên derbarê Tedbîrên di Çarçoveya Rewşa Awarte de” hatin girtin û qadên civakîbûnê yên zarokan li wan hatin tengkirin.

**Tabloya 22.: Tabloya derbarê parkên li kolanan**

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 54 | 47,0 |
| Na | 61 | 53,0 |
| **Tevahî** | 115 | 100,0 |

Ji %53yên beşdaran diyar kiriye ku li taxa wan park nîne, ji %47ê wan jî diyar kiriye ku li taxa wan park heye.

### Tabloya 23.: Tabloya komên lîstikê yên parkê

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 13 | 24,5 |
| Na | 40 | 75,5 |
| Tevahî | 53 | 100,0 |

Ji %75,5 beşdarên ku gotine li taxa me park heye, diyar kiriye ku li parka wan taximên lîstikê nînin; ji %24,5ên wan diyar kiriye ku li parka wan taximên lîstikê hene .

### Tabloya 24.: Tabloya derbarê bikaranîna parkê de

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 22 | 42,3 |
| Na | 30 | 57,7 |
| Tevahî | 52 | 100,0 |

Ji %57,7 beşdarên ku gotine li taxa me park heye ,diyar kiriye ku parkê bi kar nayînin, ji % 42,3yên wan diyar kiriye ku parkê bi kar tînin.

### Tabloya 25.: Sedema bikarneanîna parkan

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Malbata min destûrê nade | 4 | 18% |
| Ji ber ku hilweşiyaye/xera bûye | 10 | 46% |
| Ewle nabînim | 6 | 27% |
| Ji ber şewba pandemiyê dernakevim | 2 | 9% |
| Tevahî | 22 | 100,0 |

Gava em li wan sedeman dinêrin ku herçiqasî li taxa wan park hebe jî û bi kar nayînin, em dibinin, ji %46ên beşdaran bi sedema hilweşiyayibûnê, ji %27ên wan bi sedema neewlehiyê, ji 18ên wan bi sedema destûra ji malbatê û ji %9ên wan jî ji ber şewba cîhanî naçin qadên lîstikê yên parke.

### Tabloya 26.: Tabloya wextderbaskirinê li derve

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 94 | 81,7 |
| Na | 21 | 18,3 |
| Tevahî | 115 | 100,0 |

Ji %81,7 beşdaran diyar kiriye ku li derve wextê xwe derbas dikin, ji % 18,3 yên wan jî naçin derve.

### Tabloya 27.: Tabloya derbarê wextderbaskirina li derve de[25]

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Bi hevalên xwe re lîstikan dilîzim | 40 | 41% |
| Bi hevalên xwe re bi gogê dilîzim | 47 | 48% |
| B i hevalên xwe re digerim | 31 | 32% |
| Diçim parkê | 6 | 6% |
| Bisîklêtê diajom | 36 | 37% |
| Yên din | 32 | 33% |
| Tevahî | 192 | 198% |

Ji %48 beşdarên ku wextê xwe li derve derbas dikin diyar kiriye bi gogê dilîzin, ji % 41ên wan bi hevalên xwe re dilîzin, ji %37ên wan bisîklêtê diajon, ji % 32yên wan bi hevalên xwe re digerin, %6ên wan jî diçin parke. Beşdarên me ku “yên din” îşaret kirine jî diyar kiriye ku gelek caran lîstikên çekdarî û pevçûnê -ew wisa bi nav dikin- dilîzin; bi patenan xwe dişemitînin, çavgirtînkê û lîstikên mîna survivor dilîzin.

### Tabloya 28.: Tabloya derbarê qadên ajotina pisqilêtan de

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Li kuçeyan | 12 | 33% |
| Li taxê | 12 | 33% |
| Li kolanan | 7 | 19% |
| Li hewça dibistanê | 3 | 8% |
| Yên din | 2 | 6% |
| | 36 | 100% |

25-) Di vê pirsê de ji ber ku rêbaza bersivên pirhejmar hatiye bikaranîn tevahî % 100 derbas dike.

Zarokên ku gotine em bisîklêtan diajon, diyar kiriye ku bi sedema ku li taxa wan park nînê û li yên heyî jî rêya ajotina bisîklêtan nîne ew bisîklêtên xwe li taxê, li kuçeyan, li kolanan û li hewşên dibistanan diajon. Gelek ji beşdaran dibêjin ku ew bisîklêtên xwe kirê dikin, bisîklêt ne yên wan in.

### Tabloya 29.: Tabloya çeprast a wextê li derve ya li gor zayendê

| | | | Zavend | | Tevahî |
|---|---|---|---|---|---|
| | | | Qîz | Law | |
| | | Hejmar | 35 | 59 | 94 |
| Tu di derve wextê xwe derbas dikî? | Erê | Sedek | 37,2% | 62,8% | 100,0% |
| | Na | Hejmar | 18 | 3 | 21 |
| | | Sedek | 85,7% | 14,3% | 100,0% |
| Tevahî | | Hejmar | 53 | 62 | 115 |
| Jî sedi | | 46,1% | 53,9% | 100,0% | |

Ji 94 beşdarên ku gotine em wextê xwe li derve derbas dikin %62,8 ji wan law in, ji %32,7jî qîz in. Ji 21 beşdarên ku gotine em dernakevin derve %87,7 ji wan qîz in, %14,3 ji wan law in.

### Tabloya 30.: Sedemên nekarîna wextderbaskirina li derve[26]

| | Number | Percentage |
|---|---|---|
| Ez derve ewle nabînim | 12 | 57,1% |
| Ji ber şewba cîhanî dernakevim derve | 9 | 42,9% |
| Di karên malê de alîkariya diya xwe dikim | 4 | 19,0% |
| Bo alîkariya malê di karekî de dixebitim | 3 | 14,3% |
| Cihên ku qîzên zarok lê bilîzin nînin | 5 | 23,8% |
| Yên din | 3 | 14,3% |
| Total | 36 | 171,4% |

26-) Ji ber ku di vê pirsê de rêbaza bersivên pirralî nehatiye bikaranîn tevahiya wan weke %100 derbas dibe.

Ji beşdarên ku gotine em nikarin li derve wextê xwe derbas bikin, % 57,1ê wan diyar kiriye ku derve ewle nabînin, % 42,9ên wan bi sedema şewba cîhanî dernakevin derve, % 23,8ên wan bi sedema ku cihê lîstika qîzên zarok nîne, %19ên wan ji ber ku di karê malê de alîkariya diya xwe dikin, %14,3yên wan ji ber ku bo alîkariya malê dixebitin û %14,3yên wan bi sedemên cuda nikarin li derve wextê xwe derbas bikin.

### Tabloya 31.: Tabloya çeprast a wextderbasnekirina li derve li gorî zayendê

| Sedemên derneketina derve | | Zayend | | Tevahî |
|---|---|---|---|---|
| | | Law | Qiz | |
| Ez derve ewle nabînim | Hejmar | 12 | 0 | 12 |
| | Ji sedî | 100% | 0% | 100% |
| Ji ber şewbê dernakevim derve | Hejmar | 8 | 1 | 9 |
| | Ji sedî | 89% | 11% | 100% |
| Di karên malê de alîkariya diya xwe dikim | Hejmar | 4 | 0 | 4 |
| | Ji sedî | 100% | 0% | 100% |
| Bo alîkariya malbatê li cihekî dixebitim | Hejmar | 1 | 2 | 3 |
| | Ji sedî | 33% | 67% | 100% |
| Cihên ku qîzên zarok lê bilîzin nînin | Hejmar | 5 | 0 | 5 |
| | Ji sedî | 100% | 0% | 100% |
| Yên din | Hejmar | 3 | 0 | 3 |
| | Ji sedî | 100% | 20% | 100% |

"Ji ber ku em ji Sûriyeyê hatine zarokên derve hez ji me nakin.Em jî dernakevin. (Qîz,Temen 14, Taxa İskender Paşayê)

**Xuya dike hemû zarokên ku gotine "Ez derve ewle nabînim; "Di karên malê de alîkariya diya xwe dikim; "Cihên ku qîzên zarok lê bilîzin nînin" qîz in. Qîzekê û lawikekî gotiye "Bo alîkariya malbatê li cihekî dixebitim" û ji ber vê em nikarin derbikevin derve.** Xuya dike ji 9 zarokan 8 jê qîz in ku diyar kirine bi sedema şewba cîhanî nikarin derbikevin derve.Girls explained the reasons why they do not go outside:

*Qîzên zarok sedemên derneketina derve wisa rave kirine: "Ji ber ku em ji Sûriyeyê hatine zarokên derve hez ji me na kin.Em jî dernakevin." (Qîz, Temen 14, Taxa İskender Paşa)*

Gava em lê dīnêrin ku qîz çima wextê  xwe li derve derbas nakīn, em dibînin ku sedem pêşhikmiyên qalibî yên girêdayî normên zayendî yên civakî

*"'Ji ber ku em penaber in ez dernakevim derve..Tenê bo nan bikirim dikarim derkevim derve." (Qîz, Temen 10, Taxa Cevat Paşa)*

*"Gava em derdikevin derve lawik tên li qîza dinêrin, gava birayên me jî vê dibînin destûrê nadin ku em derbikevin derve." (Qîz, Temen 13, Taxa Ziya Gökalp)*

*"Gava em dilîzin mezin henekên xwe bi me dikin û dibêjin, tu li qama wan binêr û li halê wan." (Qîz, Temen 1 2, Taxa İskender Paşa)*

Gava em lê dinêrin ku qîz çima wextê xwe li derve derbas nakin, em dibînin ku sedem pêşhikmiyên qalibî yên girêdayî normên zayendî yên civakî ne. Ger ev ji aliyê wan zarokan ve bê nirxandin ku bi sedema şerê li Sûriyeyê welatê xwe terk kirine, ji bilî newekheviya zayendî ya civakî cudakerî jî dibe sedema wê ku mafê wan ê derketina derve û lîstikê bêhtir bê binpêkirin.

Dêûbavên ku naxwazin zarokên wan li derve wextê xwe derbas bikin, derbarê sedeman wisa dibêjin:

"A rastî bavê wan nahêle zarokên min derkevin derve. Çi dibe çi nabe...'qîz in bila dernekevin derve, bi lawikan re nelîzin.' Bi hezaran mirovên nebaş hene li kuçeyan...Mirov nizane bi kê bawer bike. Ji b er wê zilamê min dixeyide lê dîsa jî qîza min derdikeve. Lê tenê devê derî, ne gelekî dûr devê derî.Li kuçeyan xortên hene ku sixêfan dikin,bi pev diçin. Lawê min ji niha ve li wan dimeyzîne û ew jî sixêfan dike. Ji ber wê naxwazim derkeve derve." (Jin, Temen 35, Taxa Ziya Gökalpê)

"Hema bêje li hewşên hemû xaniyên kevin ên Diyarbekirê (yên tescîlkirî) bîr hene. Devê bîrên nav kavilan vekirî bû, mirov di derenceyan re bi hewa diket û diçû qata duyan, di her malê de sê çar ode hene. Deriyên van kavilan dizîn û birin, kevirên derenceyan jî birin, hinekan xaniyên xwe ji nû ve çêkirin, hatin ew kevir jî rakirin û birin,kevirên derenceyan, derabeyan derenceyan derxistin û birin.

Ji ber vê jî hemû xanî eroînman hene, esrarkêş hene, yanî mirov hene ku destdirêjiiyê bêxwedî man. Gava val jî man li zarokan dikin. Min bixwe dîtiye, li xaniyekî xerabe 20-30 zarokan zarokek tacîz dikir, min bi çavê xwe dît. Min pê re da qîran, zilamê min çû nav kavil, hemû zarok reviyan.

Wan ew zarok teslîmî xwediyan kir.Bibexşînin, keran jî tînin û bi dor wan dikevin. Em li ber poli san gilî dikin, ew jî dibêjin 'wan kesan bînin.'Ew kes kî ne? Ê ez ji ku zanim ew kî ne? Heta em digihin nav kavil ew direvin. Me ji muxtar re jî got. Piştre ji şaredariyê hatin, deriyên kavilan bi betonê girtin. Bi vê jî çareser nebû lewra aliyên pişt kavilan vekiriye.Dîsa dikarin ji aliyên paş ve derbas bibin û bikevin hundir.

Ji ber ku em penaber in dernakevim derve. Tenê ji bo nan dikarim derkevim.(Qîz, temen 10, Taxa Cevad Paşayê)

Gava em derdikevin derve lawik tên li qîza dinêrin,gava birayên me jî vê dibînin destûrê nadin ku em derbikevin derve.›› (Qîz,Temen 13,Taxa Ziya Gökalpê)

*Yên ku vê dikin ne zarokên taxê ne, çend kuçe li pêş dijîn, ji derdorê tên. Tên li vir vir eroînê, esrarê dikşînin... **Û yên ku li taxê esrarê difroşin, hene. Polis pêncî caran hatine, derî şikandine û ketine hûndir, li wan dane, li GBTya wan nêrîne û berdane. Xwedê neke ku zarokêkî min bikeve vê rêyê ez çi bikim ?** Ma bibim qatil?" (Jin, Temen 51, Taxa Lalebeyê)*

"Lawekî min heye ku bi erebeyê qeza derbas kiriye. Ew talûke heye ku zarok madeyan bi kar bînin û bikevin nav wê derdora dizan. Gava dixwazin bilîzin jî dûçarî şideta/ heqareta taxê dibin." (Mêr, Temen 45, Taxa Ali Paşayê)

Dêûbavan diyar kiriye ku naxwazin kuçe bo qada lîstikê bên bikaranîn lewra bo zarokan talûkeyên xerab vedihewînin. Li Sûrê piştî qonaxa pevçûnê ya 2015-2016an ku li taxan avahiyên kavil zêde bûn û ev kavil ji aliyê kesên xerîb ve nemaze bo bikaranîna madeyan hatin bikaranîn tirs ket dilê dêûbavan. Ji ber ku rayedar qet hewl nadin rê li ber bikaranîna bi nebaşî ya kavilan bigirin, kavil bûne ev cih ku made lê tên bikaranîn, dizî û tacîz lê çêdibe û sûc lê zêde dibin. Muxtarên ku têkildarî mijarê hevdîtin bi wan re hatiye kirin jî derbarê talûkeya bo zarokan a kavilên li taxê wisa gotine:

*"Bo zarokan talûkeya herî giran kavil in. Ji ber ku zarok in, aqilê wan her tim li ser lîstikê ye. Yek dikeve piyê xwe dişkîne; yek sere xwe, yek derdikeve ser dîwêr, dîwar dihêrive. Ji bilî vê her tişt li wir dibe:Ji madeyên hişbir bigire heya diziye her tişt li wir dibe. Berî qonaxa pevçûnê jî ev hebû lê piştî wê zêdetir bû. Li Taxa Ziya Gökalpê zêdetir ji 38 avahiyên kavil hene. Ev kavil du cure ne: Yek ên tescîlkirî ku tên parastin, yên din ên netescîlkirî. Tu bi tu awayî nikarî dest bidî yên tescîlkirî, ne qaymeqam ne walî dikare tiştekî bike. Tu dibêjî, 'ez ê dîwarekî li vir (bo yên tescîlkirî) bikim' dibêje 'ceza ye, sûc e' tu dibêjî were tu bike.' Ew jî nayê çênake. Ev hemû talûke ne. **Berî niha bi çend salan li kuçeya me dîwarek bi temamî hêrivî ji Xwedê tiştek bi kesî nehat. Tecawizî çend zarokan kirin li nav wan avahiyên kavil. Rûdana dawî jî ew bû ku zilamekî pîr gava bi tesadifî di wir re derbas dibe zarokekî xelas dike.** Erê gava em dibihîzin em bi pey dikevin lê em nikarin wan bigirin." (Muhsin, Muxtarê Taxa Ziya Gökalp)*

*"Kavil bo zarokan gelekî bi talûke ne. Zarokek zêdeyî saetekê li derve bimîne jixwe hem eqlaq hem reftar diguhere. Delime sixêfan,har dibe, kê bibîne dixwaze bişibe wan.Heke zarok bi destûr û kontrola malbatê derkeve ne pirsgirêk e lê gava kontrola malbatê li ser tune be teqez diguhere. Gava demeke dirêj li derve bimîne digihe mirovên xerab. Edî wextê xwe bi mirovên xerab re derbas dikin. Min berê jî got li kuncan çete hener 10-12 salî ne. Tu li wan dinêrî çixare di devê wan (qesta wî esrar e) de." (Abdullah, Muxtarê Taxa Lalebeyê)*

*"li gor ku me ji şêniyên taxê bihîstiye li gelek kavilan madeyên hişber tên bikaranîn, bengiyên madeyan diçin li wan deran hin tiştan dikin. Tew li kuçeykê maleke weqfê heye. Min jî jê re got,*

> Kavil bo zarokan gelekî bi talûke ne. Zarokek zêdeyî saetekê li derve bimîne jixwe hem eqlaq hem reftar diguhere. Delime sixêfan,har dibe, kê bibîne dixwaze bişibe wan.Heke zarok bi destûr û kontrola malbatê derkeve ne pirsgirêk e lê gava kontrola malbatê li ser tune be teqez diguhere. Gava demeke dirêj li derve bimîne digihe mirovên xerab. Edî wextê xwe bi mirovên xerab re derbas dikin. Min berê jî got li kuncan çete hener 10-12 salî ne. Tu li wan dinêrî çixare di devê wan (qesta wî esrar e) de." (Abdullah, Muxtarê Taxa Lalebeyê)

*'ji ber ku mifte bi me re nîne em havînê nikarin kavilan derman bikin (dermanê kurmûkêzan, pêşiyan, mişkan û hwd)'. Ji ber ku em nikarin bikevin wir min ji berpirsiyarê weqfê re got mifteyekê bide min. Mala wî ava mifteyek da min. Hefteyek di ser re derbas nebû, zarokên li kuçeyan ew mifte şikand û yeke din çêkirin, bi wê miftê dikevin hundir. Tiştekî wisa ye ku tu dibêjî ew der ya wan e. bi wî rengî xwedî lê derdikevin. Edî li wir çi dibe, em wê jî nizanin. Lewra derî girtiye, ji derve xuya nabe. Ez dixwazim bibêjim ku ji ber vê divê xaniyên terkkirî bên hilweşandin -li taxa min ji 40î zêdetir avahiyên terkkirî hene- înşele biryarê bigirin ku van avahiyan hilweşînin.Jixwe van paqij bikin û bikin qadên lîstikê înşele em ê ji gelek tiştan xelas bibin. Q aymeqam Beg jî li ser van mijaran disekine û dibêje, 'em van deran bikin malê taxê, paqij bikin...Qenebe bila bibin qadên lîstika zarokan'." (Mehmet, Muxtarê Taxa Cevat Paşayê)*

Muxtaran diyar kiriye ku ji ber li taxên wan qadên lîstika zarokan nînin dixwazin avahiyên terkkirî yên vala bo qadên lîstikê bi kar bînin lêbelê ev avahiyên terkkirî/kavil veguherîne qadên ku sûc lê dibin. Herwiha muxtaran diyar kiriye ku bo hilweşandina van kavilan an jî paqijkirina wan bo veguhastina qadên ewle serî li rayedaran dane lê hê tu encam bi dest nexistine.

**Tabloya 32.: Tu di kîjan saetan de derdikevî derve**

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Sibehan | 6 | 5,2 |
| Nîvroyê | 63 | 54,8 |
| Her roh destûrê didin mi bo ku derkevim derve | 15 | 13,0 |
| Destûrê nadin min ku bi tenê derkevim | 9 | 7,8 |
| Îşê xwe ji derketina min nayînin | 15 | 13,0 |
| Tevahî | 108 | 100,0 |

Ji beşdarên ku gotine em dikarin li derve wextê xwe derbas bikin %54,8an jê gotiye em nîvro derdikevin, %13an jê gotiye her roj bo me destûr nîne û %13ên din jî gotiye tu kes îşê xwe ji me nayîne. %7.8an ji wan jî gotiye destûr bo me nayê dayîn ku em bi tenê derkevin derve. Hemû zarokên ku gotine “Ez nikarim bi tenê derkevim derve” qîz in û hemû zarokên ku gotine “Tu kes îşê xwe ji min nayîne” law in.

### Tabloya 33.: Tu tim li vir dilîstî

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 97 | 83,5 |
| Na | 18 | 16,5 |
| Tevahî | 115 | 100,0 |

Ji %83,5 beşdaran gotiye qada me ya lîstikê neguheriyê, ji %16,5 beşdaran diyarkiriye ku qada wan a lîstikê guheriye. Beşdarên ku gotine qadên wan ên lîstikê guherîne, sedem wisa nîşan dane:

### Tabloya 34.: Sedemên guherîna qadên lîstikê

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Min taxa xwe guhert | 9 | 53% |
| Cihên em lê dilîstin hilweşiyan | 3 | 18% |
| Êdî ne ewle ye | 1 | 6% |
| Yên din | 4 | 24% |
| Tevahî | 17 | 100% |

**Ji beşdarên ku gotine qadên me yê lîstikê guherîne %53yan jê gotiye me tax guhertiye, % 18an jê gotiye cihên ku em em lê dilîzin hatiye hilweşandin, %6an ji wan jî gotiye ji ber ku ne ewle ne em bi kar nayînîn.** Di nav yên din de jî 2yan gotiye me ji Suriyeyê koç kiriye, 2yan jê jî gotiye ji ber ku em mezin bûne em qadên lîstikê yên berê tercîh nakin.

> Ji %84 beşdaran diyar kiriye ku kuçe, %18an jê hewşa dibistanê û malê, %16an jê hewşa mizgeftê, %12an jê jî avahiyên kavilbo lîstikê bi kar tînin. «Yên din» jî gotine ku serê ban bo lîstikê bi kar tînin.

### Tabloya 35.: Tabloya qadên ku lê dilîstin[27]

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Hewşa dibistanê | 17 | 18% |
| Hewşa malê | 17 | 18% |
| Hewşa mizgeftê | 16 | 16% |
| Avahiyên kavil | 12 | 12% |
| Kuçe | 81 | 84% |
| Yên din | 8 | 8% |
| Tevahî | 151 | 156% |

Ji %84 beşdaran diyar kiriye ku kuçe, %18an jê hewşa dibistanê û malê, %16an jê hewşa mizgeftê, %12an jê jî avahiyên kavilbo lîstikê bi kar tînin. “Yên din” jî gotine ku serê ban bo lîstikê bi kar tînin.

Gelek sedemên wê hene ku beşdar parkan bo qadên lîstikê bi kar nayînin. Hinek ji van sedeman ew in ku li her taxê park nînin, li taxên ku hene jî taximê lîstikê şikestî ne û talûkeyan vedihewînin ku rê li ber qezayên giran vedikin.

Hevdîtinên bi dêûbavan û muxtaran re jî, daneyên rapirsiyan jî heman tiştî dibêjin. Muxtaran têkşldarî qadên lîstikê wisa gotiye:

*“Qadên lîstikê yên zarokan nav taxan e. Havînê (Hewzê xemlê ku di nav Anzeleyê de ye29)tên vir, dikevin hewz. Yanî ev der bo zarokan hinekî Antalyaya duyem e. Ev der qada hevpar a du taxan e. Ku hûn havînê bên vir, meyzînin belkî hûn 300-400 zarokan di avê de bibînin.”(Cengîz, Muxtarê Taxa Camî-î Kebîrê)*

> Gelek sedemên wê hene ku beşdar parkan bo qadên lîstikê bi kar nayînin. Hinek ji van sedeman ew in ku li her taxê park nînin, li taxên ku hene jî taximên lîstike şikestî ne û talûkeyan vedihewînin ku rê li ber qezayên giran vedikin.

27-) Di vê pirsê de ji ber ku rêbaza bersivên pirhejmar hatiye bikaranîn tevahî® % 100 derbas dike.

“Zarok li ku derê cihekî rast, fireh vala hebe, diçin li wir dilîzin. Li her kuçeyê kavil hene jixwe. Berê zarokan dikarîbû li hewşa mizgeftê bilîzin lê ji ber ku li derdorê yên kal û pîr rûdinin gelekî aciz dibin û nahêlin zarok li wir bilîzin. Gava cihekî fireh dibînin dixwazin bilîzin. Bo mînak, gava diçin parkê derdorê sûrê gava li wir pêl zûçik dikin, dixeyidin û dibêjin “hûn zererê didinê” û rê li ber wan digirin. Li wan kuçeyan , li wan kavilan, li wan valahiyan dê zarok çi fêm bikin, dê çi kêfê bikin ji lîstikê xwe. (Abdullah, Muxtarê Taxa Lalebeyê)

“Bo zarokan metrek jî cih bo lîstikê nîne. Zarok di kavilan de dilîzin, li kuçeyan bi gogê dilîzin. Milet aciz dibe, bi wan de dixeyidin, “çima hûn bi gogê dilîzin, me aciz dikin “ dibêjin. Dê zarok enerjiya xwe bi ku ve xerc bikin, ew jî nîne. Carinan gava li cem min bixaran dilîzin serê min dibin, ez bi wan de dixeyidim lê piştî 10 deqîqeyan poşman dibim. Dibêjim jixwe ku qadên wan ên lîstikê hebûna dê çima li vir bilîstana.”(Muhsin, Muxtarê Taxa Ziya Gökalpê)

“Li vir ji bilî parka piçûk qadên lîstikê nînin ku zarok lê biîzin. Berî pevçûnê li vir parkek jî nebû. Berî pevçûnê zarok li kuçeyan dilîstin. Jixwe zarokên di jiyana xwe de tiştekî wisa dîtin, ewqasî kêfa wan hat. Li dora mizgefta Hz. Silêman qadeke şînkayiyê hat çêkirin, li wir taximên lîstikê yên bo zarokan nînin. Mê dê li cihekî din çêkira, ji ber ku li wir jî karê restorasyonê hebû nehat çêkirin. Lewra kevirên sûrê bi talûke ne , em gelekî li ser wir disekinin. Ji ber ku ew der mezin e dê li wir taximên lîstikê yên bo zarokan dewlemndtir bûna. Em li bendê ne ku restorasyona sûran biqede, Qetnebe me li vir koma lîstikê a bo zarokan çêkir” (Abdullah, Muxtarê Taxa Dabanoğluyê )

“Jixwe dê li vir zarok çi lîstikê bilîzin? An ben in an gog e, an jî xêzik e. Deydik (hêlekan) nîne, şemîtonk nîne, cihên ku sporê lê bikin nînin, ji ber ku qadên wan ên lîstikê nînin. Lîstika herî mezin ku zarokên li vir dikarin bilîzin an heftqûleya bi keviran e, di nav xwe de maçan dikin, xwe di ser benikan re diavêjin an jî xêzik e. Yanî sosyalîteyeke mezin li vir nîne.” (Azayê Muxtar ê İskenderpaşa)

Muxtarên taxan diyar kiriye ku qadên lîstikê yên ku zarok bikaribin lê bilîzin nînin û herwiha zarokên ku li hewşa mizgeftê û kuçeyan dilîzin ji aliyê şêniyên taxê ve tên azirandin. Herçiqasî li Sûrê xaniyên kavil ku piştî pevçûnên li Sûrê zêde bûne, bi talûke bin jî û şêniyên taxê ji vê aciz bin jî, zarok bi sedema ku qadên lîstikê nîn in mecbûr in van kavilan bi kar bînin. Di hevdîtinên bi muxtaran re tenê yê Taxa Dabanoğluyê gotiye piştî pevçûnan qadeke şînkayiyê ava kiriye ku bo zarokan kemekê lîstikê tê de heye. Lêbelê ji ber ku cihê koma lîstikê bi kolanê ve ye bo zarokan gelekî bi talûke ye.

> Jixwe dê li vir zarok çi lîstikê bilîzin? An ben in an gog e, an jî xêzik e. Deydik(hêlekan) nîne, şemîtonk nîne, cihên ku sporê lê bikin nînin, ji ber ku qadên wan ên lîstikê nînin. Lîstika herî mezin ku zarokên li vir dikarin bilîzin an heftqûleya bi keviran e, di nav xwe de maçan dikin, xwe di ser benikan re diavêjin an jî xêzik e. Yanî sosyalîteyeke mezin li vir nîne.»
> (Azayê Muxtar ê İskenderpaşa)

### Tabloya 36.: Tabloya bê ka gava li derve lîstikê dilîzin qeza derbas dikin an na

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 73 | 63,5 |
| Na | 42 | 36,5 |
| Tevahî | 115 | 100,0 |

Ji %63.5ên beşdaran diyar kiriye ku gava li derve dilîzin qeza kirine û ji %36.5ên wan jî qeza derbas nekirine. Gava li cûreyên qezayên beşdaran tê nêrîn:

### Tabloya 37.: Tabloya cureyên qezayan ku li derve dikin

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Qezayên bisîklêtan | 11 | 15% |
| Qezayên motorsîkletan | 5 | 7% |
| Qezayên erebeyan | 5 | 7% |
| Ketina erdê | 46 | 63% |
| Yên din | 6 | 8% |
| Tevahî | 73 | 100% |

Qeza ji ber hûrekevir û camên li erdê dibin." (Qîz, Temen 11, Taxa Lalebeyê)

**Ji beşdarên ku li derve qeza derbaskirine %63yên wan ketiye erdê, %15an qezaya bisiklêtê, %7an jê qezayên motorsîklet û erebeyan kiriye. Di nav "yên din" de jî ew kes hene ku li qadên lîstikê bizmar an cam ketine laşê wan, torpîl bi xwe de teqandine û deydik li serê wan ketiye.**

Xebateke qadê ya têkildarî "ketin"ê ku gelekî behs dikin, nîşan dike ku xwarbûna kevirên erdê, tûjbûna kevirên ku ji erdê rabûne, tunebûna qepaxên rogaran an jî bilindbûna wan ji erdê hin sedemên qezayan in. Herwiha hûrekevirên di kavilan de, parçeyên camê ku li her dorê belav bûne û parçeyên kevirên ku dikin bikevin bo zarokan bi talûke ne.Beşdaran derbarê qezayên ku zarok di lîstikê de rû bi rû dimînin ragihandine: "Qeza ji ber hûrekevir û camên li erdê dibin"

*(Qîz, Temen11, Taxa Lalebeyê)*

28-) Bo wêneyên ku rewşa parkan nîşan didin li pêvekê binêrin.

29-) Heta salên 1950an ji sê kaniyên avê yên li Sûrê bû. Anzeleya ku li Çift Kapı ye û berê bo awayê avahiya dagirtina avê ya agirkujiye dihat bikaranîn niha bûye park. Di seyehatnameya Ewliya Çelebî de efsanê û stranên li ser ava Anzeleyê hene, Bnr. İhsan Işık, Diyarbakır Ansiklopedisi, 1.cilt,2013

> "Gava em bi gogê dilîzin ji ber ku er ne baş e em dikevin û birîndar dibin."
>
> (Law, Temen 13, Taxa Alî Paşayê)

"Gava em bi gogê dilîzin ji ber ku er ne baş e em dikevin û birîndar dibin." (Law, Temen 13, Taxa Alî Paşayê)

"Qadên me yê lîstikê ne gelekî baş in. Bo mînak gelekî kevir hene. Gava em dikevin binêr(destê xwe nîşan dide) çi bi me tê. Kavil hene lê hemû cam in. Gava em li gogê dilîzin goga me diteqe"(Ji xebata koma navendî ku me bi lawan re kiriye)

"Bo mînak gava zarok li kuçeye bazda ket ser camê û tiliya xwe birî. Tiliya wî dirûtin. Gava dilîst bazdida...Ew jî zêdeye willehî, sedema herî mezin ew e ku kuçe ne rast in: Kevirên kevin, tûj, kortal..." (Jin, Tmen 30, Taxa Lalebeyê)

> Bo mînak, zarokên 10-12 salî hene. Ew bi bisîklêtan derdikevin, li kolanan diajon. Ji ber ku cih nîne bisîklêtan lê biajon carina qezayan hatûçûnê çêdibin.
> (Bülent, Azayê Muxtar ê Taxa İskender Paşayê)

*"Li taxa me avahiyên kavil hene, zarok her tim li wir dilîzin, carina ji kavilan kevir bi serê zarokan dikevin. Me çend caran ji xwediyê wan re got, guh nedan me. Lê bo zarokan gelekî talûke ne. Gava em dibînin em dixeyidin destûrê nadin ku bilîzin lê gava em nabînin..."*

*( Jin, Temen 35, Taxa Ziya Gökalpê)*

*"Li avahiyên terkkirî dûpişk û maran gelekî bi wan zarokan veda ku li wir dilîzin. Ji ber ku avahiyên terkkirî gelek in bivênevê kêzik û mêzik jî çêdibin."(Mehmet, Muxtarê Taxa Cevat Paşayê)*

"Li Anzeleyê ji ber parçeyên camê yên di nav avê de zarokên ku birîndar dibin, hene, an jî dişemitin serê xwe li erdê didin. Tew çend caran min gazî ambulansê kir. Hema li vir kolan heye, gava derbasî rêxê din  dibin, erebe li du zarokan dixe. Bo mînak heke bergirî neyê kirin dê di wan xaniyên terkkirî de jî qeza çêbibin, ji ber ku hilweşiyane."

(Cengiz, Muxtarê Taxa Camî-î Kebîrê yê Bijartî)

Zarok, dêûbav û muxtaran diyar kiriye ku qadên lîstikê, qadên şînkayiyê kêm in Zarok gava dilîzin qezayan derbas dikin. Li kuçeyên bo qada lîstikê, bi sedema ku kevirên erdê tûj in û ji cihên xwe derketine û dîsa li cihên nêzî kavilan li erdê kevir, moloz û parçeyên camê

> Ji beşdarên ku diyar kirine ku li taxa wan kurs/kargeh hene; %69an gotiye kursên Qur›anê, %10an ên muzîkê, %8an ên şetrencê û %5an jî gotiye kursên şanoyê hene.

hene, zarok birîndar dibin. Tê gotin, zarokên ku li nav kavilan dilîzin bi wan talûkeyan re rû bi rû dimînin ku ji avahiyan kevir bi ser wan de tên û dûpişk an mar bi wan vedidin. Ji ber ku li Sûrê hewz nîne hewzê xemlê yê Anzeleyê bo sobariyan(nemazê zarokên li taxên Melîk Ahmet û İskender Paşa) tê bikaranîn. Lêbelê parçeyên camê yên ku avêtine hewz dibin sedem ku zarok birîndar bibin. Dîsa ji ber ku li Sûrê rêya bisîklêtan nînin, zarokên ku kolana mezin bo bisîklêtê bi kar tînin, bi qezayên hatûçûnê rû bi rû dimîni qezayên hatûçûnê rû bi rû dimînin.

### Tabloya 38.: Tabloya bê ka li taxê qurs/atolye hene yan na

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 86 | 74,8 |
| Na | 29 | 25,2 |
| Tevahi | 115 | 100,0 |

Ji beşdaran %74,8an diyar kiriye ku li taxa wan kurs/kargehên ku tevlî bibin hene, % 25,2yên wan jî gotiye nînin.

> XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX XXXXX

### Tabloya 39.: Tabloya qurs/atolyeyên heyî[30]

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Qursa Qur'anê | 57 | 69% |
| Qursa Setrencê | 7 | 8% |
| Muzîk | 8 | 10% |
| Şano | 4 | 5% |
| Yên din | 34 | 41% |
| Tevahî | 110 | 133% |

Ji beşdarên ku diyar kirine ku li taxa wan kurs/kargeh hene; %69an gotiye kursên Qur'ane, %10an ên muzîkê, % 8an ên setrencê û %5an jî gotiye kursên şanoyê hene. Gelek ji beşdarên

30-) Di vê pirsê de ji ber ku rêbaza bersivên pirhejmar hatiye bikaranîn tevahî % 100 derbas dike.

ku "yên din" nîşan dane, diyar kiriye ku tevlî kargehên Komeleya Hêviyên Rengîn(Rengarenk Umutlar Derneği) bûne ku berî şewba cîhanî li dar xistine, Navenda Civakê ya Pirarmanc (ÇATOM) û Kitêbxaneya Zarokan a Şaredariya Sûrê û Mala Zanyariyan jî hinek ji wan sazgehan in ku zarok tevlî kurs/kargehên wan bûne.

### Tabloya 40.: Tabloya beşdariya di qurs/atolyeyan

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 55 | 67,9 |
| Na | 26 | 32,1 |
| Tevahî | 81 | 100,0 |

Ji beşdarên ku gotine li taxa me kurs/kargeh hene %67,9an jê diyar kiriye ku tevlî kursan bûne, %32,1ên ji wan diyar kiriye ku tevlî kursan nebûne

### Tabloya 41.: Mekanîzmayên gilîkirinê

| | Hejmar | Ji sedî |
|---|---|---|
| Erê | 26 | 23,4 |
| Na | 85 | 76,6 |
| Tevahî | 111 | 100,0 |

**Gava me ji beşdaran pirsiye ku tiştek bê serê we kesek an sazgehek heye hûn serî lê bidin, %76,6ên wan gotiyê kes an sazgeheke em serî lê bidin nîne, %23,4an ji wan gotiye kes û sazgehên em serî li wan bidin hene.** Gava agahiyên derbarê kes û sazgehên ku serî li wan bidin hatiye pirsîn jî hemû beşdaran diyar kiriye ku ji dêûbavên xwe re dibêjin.



### 3.3.1. Nêzîkahîtêdanên Şêniyên Taxan ên derbarê Wê ku Kuçeyan bi Awayê Qada Lîstikê Bi Kar Tînin

Li Sûrê, kêmasiyua qadên lîstikê, tunebûna çareseriya li cem mezin û rayedaran a têkildarî mijarê, zarokan mecbûr dike ku cihên ne ewle bo qada lîstikê bi kar bînin. Di nav van qadan de; kuçe, kavil, hewşên dibistan û mizgeftan hene. Li gel ku kuçe û kavil bo ewlehiya zarokan talûke ne, carina ji aliyê şêniyên taxê ve dûçarî şideta devkî û fizîkî dimînin.

*Mafê lîstikê boz arokan mafê herî bingehîn e. Beşdaran derbarê wê rewşa ku gava dixwazin bilîzin rastî çi tên û çi diqurpînin nêrînên xwe wisa anîne zimên:*

*“Em diçin ku derê hinek berdidin me. Bo mînak, em dilîzin gava goga me li dîwêr dikeve ji me re dibêjin, “herin ji vir, em ê we bikûjin”. Carina jî gava em dilîzin zarokên ji me mezintir goga me, me dibin û direvin (Ji xebata komnavendî ya bi zarokan re)*

*“Bo mînak, wê rojê zilamekî serê xwe di sibakeyê re derxist û got, ‘Li vir nelîzin, heke hûn bilîzin bêdeng bilîzin’. Em jî bêdeng leyîstin, gava hevalekî me dengê xwe bilind kir, pace vekir û tif kir me. Ji bilî kuçeyan qada me ya lîstikê nîne”(Ji xebata komnavendî ya bi zarokan re)*

*“Em nikarin rehet derkevin derve, gava em derdikevin ji me re dibêjin, tu me aciz dikî. Ez ê ji diya te re bêjim.” (Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)*

*“Qata me ya 2yan heye, ez hez jê nakim Zû radikevin, gava em dilîzin bi me de dixeyîdin, “dengê xwe nekin, dengê xwe nekin” dibêjin. Gava bi me de dixeyîdin em jî ji eksê wan bêhtir dengê xwe bilind dikin.(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)*

*“Ku kavilan bikin qadên lîstikê jî dê gava em bilîzin bi me de bixeyîdin(şêniyên taxê) ji ber ku nêzî kavilan xanî hene.(Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*

*“Ez hez ji avahiyên kavil nakim. Cihekî tu lê bilîzî nîne. Ji ber ku kuçeyên navê teng in şêniyên taxa dixeyidin ku em bilîzin.(Lawik, Temen 12, Taxa Cevat Paşayê)*

“Kevir li ber me asteng in, em nikarin bilîzin, em dikevin û gava em li kuçeyê dilîzin kêfa min nayê ku jin her tim bi ser me de didin qîran.”(Lawik, Temen 15, Taxa Ali Paşayê)

*Malbat naxwazin zarokên wan biçin nav avahiyên kavil lêbelê gava li kuçeyan dilîzin jî şêniyên taxê nerazîbûna xwe nîşan didin. Dêûbav helwestên zarokên xwe wisa rave dikin ku gava dilîzin rû bi rû dimînin:*

*“Zarok carina li ber derî gogê dilîzin. Li derve dilîzin, lê kuçe jî teng in. Ê milet derbas dibe, pehînekê li gogê dixe, gog tê li zarokan dikeve, ji ber ku cih nîne. Ji ber ku bi gogê dilîzin, jixwe park nîne, tiştek nîne, li kuçeyên tengik dilîzin, cîran aciz dibin. Ê gava aciz dibin jî tên malê . Xanî jî yek qat e, diçin serê bên. Li ser bên jî kulîlkên min hene, ez bi wan de dixeyîdim ji ber ku dilîzin. Ê gava tên malê jî ji televizyonê pê de tiştek nîne. Weke tu zanî di rewşeke berbat de ne. (Jin, Temen 51, Taxa Ali Paşayê)*

*“Li taxê qet park nînin, li ber derî dilîzin. Xwezî hebûna, zarok tene li kuçeyan dilîzin. Gava li kuçeyan dilîzin cîran gelekî bo gilî tên: Dibêjin ‘Zarokên te gelekî deng derdixin, bi gogê dilîzin. Ez jî ji tirsan, gelek caran gava devê deriyê xwe dimalim yên cîranan jî dişom. Gava zarok derdikevin dilewitînin, ji ber vê ez devê deriyê wan jî paqij dikim. Dixeyidin ha!”*

*(Jin, Temen 35, Taxa Ziya Gökalpê)*

Zarok li malê ji ber şert û mercên malê, li kuçeyan ji ber tengbûna kuçeyan gava dilîzin derdorê aciz dikin û ev jî qadên lîstikê ku jixwe kêm in, sînordar dike. Şêniyên taxê li hember dêûbavan wan zarokan ku li derve dilîzin jî nerazîbûna xwe nîşan didin û ev rewş bandorê li cîrantiyê jî dike. Muxtaran jî, nerazîbûna şêniyên taxê yên têkildarî wan zehmetiyan ku zarokan wan bi sedema ku qadên lîstikê nînin û kuçe kirine cihê lîstika xwe bi heman awayî rexne kiriye.

*“Zarok tên cem nin dibêjin ‘apê muxtar ji me re parkekê çêbike’, zarokên piçûk. Tew ji ber ku parkeke piçûk li vir hat çêkirin çend zarok hatin vir gotin “apê muxtar, mala te ava, te park ji me re çêkiriye.” Niha biçin li parkê binêrin 20-30 kes bo şemîntokê di dorê de ye, biçin wênyên wan bigirin. Ji ber ku têra wan nake, hildikişin jora wê. Ew der dê bişike di demeke kurt de. Bo mînak zarokek ji wir ketibû û piyê xwe şikandibû. Tiştên ku nabin dikin. Derdikevin jora taximên lîstikê, zarokên me ji ber ku bi salane qadên wisa nedîtine bêşensiyên wisa çêdibin.( Mehmet, Muxtarê Taxa Cevat Paşayê)*

*“Zarok jî tên ji min dixwazin, dibêjin, “muxtar tu çima ji me re parkê çênakî”. Ji min re dibêjin “apo, tu dibêjî li kuçeyan nelîzin wî çaxî tu ji me re parkekê çêbike.” Em jî ji xwe re li wir bilîzin û tu kesî aciz nekin; tiştek ji destê min nayê ku ez vê bigihînim rayedaran, digihînim jî. Çima tu kes cewabê nade. Runiştim giriyam. Zarokekî 3-4 salî ev ji min xwest, min nikarîbû tiştekî bikim. Heqê wan e lê tiştek ji destê min nayê. Ne tiştekî mezin e li cihekî 100-200 m2 qetnebe du bankan, du deydikan biavêje wir, dê ew zarok li wir bilîzin, rehet bibin. Malbat jî vê daxwazê dikin, malbat jî dibêjin “qetnebe parkek hebe em ê bizanibin zarokên me diçin ku derê, kîjan taxê”(Muhsin, Muxtarê Taxa Ziya Gökalpê)*

*“Ê ji xwe zarok dixwazin bilîzin. Nemaze gava li vir qelebalixê dikin û em bi wan de dixeyidin dibêjin “ma em herin bi ku ve.” Yanî dibêjin “qadeke lîstikê nîşanî me bidin em herin wir. Ev jî daxwazek e. Kîjan zarok naxwaze qadeke lîstikê bo wan hebe; gava ket neêşê, rehet lîstika xwe bilîzê... Bo mînak gava li vir (kuçe) dilîzin -ji ber ku mirov diçin û tên- hewceye gava bi gogê bilîzin baldar bin da ku gog li tu kesî nekeve, lewra gava gog li hin kesan bikeve dizanin ku dê lêdanê bixwin. Nîne yanî... Derfeteke zarokan a wisa nîne. Ne tenê li taxa me tu hemû Sûrê bînî ser hev çend park hene an tune ne . Mafekî wisa hebe jî li Sûrê nehatitiye cih. Li Sûrê tenê 5-6 tax mane jixwe.”( Bülent, Azayê Mûxtar ê Taxa İ skender Paşayê)*

*Zarok di ferqa wê de ne ku ji ber tunebûna qadên lîstikê zehmetiyan dibînin û daxwazên xwe gihandine muxtarên taxan. Muxtar jî di ferqa wê de ne ku zarok ji ber tunebûna cihên ku wextê xwe lê derbas bikin, hêrsdar in. Ji ber vê bi awayekî fermî bo çêkirina qadên lîstika zarokan serî li Walî û Qeymeqaman dane. Muxtar vê qonaxê wisa rave dikin:*

"Berî niha ez bi HDPyê (PDG = Partiya Demokratîk a Gelan) re, bi serokê Sûrê re rûniştim, piştre Qeyûm[31] hat, bi wî re jî çend caran rûniştim, gelek caran. Min di hizûra muxtaran de jî ji walî re got. Min nivîskî pêşkêş kir hem nivîskî hem devkî min serî li wan da. Li çepê nexweşxaneyê (Nexweşxaneya Dewletê ya Selaheddîn Eyyûbî li Dağkapı) berî niha cihekî me hebû ku bi awayê parkê hatibû avakirin. Me bi taybetî xwest ku wê derê xelatî taxa me bikin. Hem qada sporê hem qada lîstikê... Yanî gelekî başbû qadeke lîstikê li taxa me hebûya. Ew der jî ji ber Sûrê ku talûkeye nehat çêkirin. A rastî gava bi hesin bê dorpêçkirin tu talûke li qismê din tune ye. Yanî ku çêbibe tiştekî miezeme bo taxê. Lewra rizgar bikin. Bo mînak, li Sûra qerase qadeke sporê nîne." (Mehmet, Muxtarê Taxa Cevat Paşayê)

"Derbarê wê em wê rojê bi qeymeqam re rûniştin. xezîneyê Wî jî ji me re got, "herin erdekî xezîneyê bibînin, em wê derê bikin park. Lîsteya malê xezîneyê li ber te ye, ez ji ku dizanim. Yanî niha xebatêk heye lê dê çiqasî bi ser kevin, nizanim Niha ez malê kê bibînim lê ew dikarin îstîmlak bikin. Hem serdema Qeyûm hem a HDPyê tu kesî nedigot na lê tiştek nedikirin. Divê parkên zarokan hebin, nemaze bo zarokan tiştek nîne. Tenê berê, di dema serok Abdullah de mihrîcanên zarokan dihatin sazkirin. Wî jî çi dikir, dihat zarokên vir dibirin, di nav sê- çar rojan de xwe li wir rehet dikirin  û dawiyê diqediya. Gotineke me kurdan heye, "dibên pekî, diçe sal û mehkî", yanî kes û ne kûs, tu kes napirse. (Muhsin, Muxtarê Taxa Ziya Gökalpê)

" Heke bixwazin qadên ku bikin park hene. Berî niha jî gava çûbûn Qeymeqamtiyê û me pirsîbû bê ma hûn dê bo zarokan parkê ava bikin, gotin "em ê ava bikin, em ê ava bikin" lê ji me re "cih bibînin". Tu şaredar î, tu nizanibî ez dê ji ku bizanibim . Kîjan cih ê kê ye, tapo heye an nîne, terkkirî ye, cihekî vala ye, xwediyê wî heye an nîne? Hûn hemû tiştan dizanin. Berê şaredariye -di dema Abdullah Demîrbaş de- şahî saz dikir[32]. Zar û zêç em hemû diçûn. Her roj li taxê çalakiyek hebû. Rastî mirov rojên xweş dijîn, diçûn sînemayê, şanoyê, konseran. Wan rojan zarok di çalakiyên wisa de dibûn xwedî exlaq û bi aqil dibûn.( Abdullah, Muxtarê Taxa Lalabeyê)

Muxataran, derbarê qadên lîstikê hem li cem Walî hem li cem Serokên Şaredariyê yên bijartî hem li cem qeyûmên tayînkirî daxwazên xwe anîne zimên. Gava serî li cihên têkildar dane derbarê daxwazên xwe tu bersivên neyînî negirtine lê têkildarî qadên lîstikê yên zarokan tu kesî hewl hewl nedaye. Ew a ku têkildarî veguhestina qadên lîstîkê ji muxtaran hêviya agahiyan dikin, dide nîşandan ku berpirsyar berê kar nedin zorê jî berpirsyariye nagirin ser xwe.

### 3.3.2. Nirxandina Qadên Lîstikê di Çarçoveya Zayendiya Civakî de

*Li Sûrê li gel daneyên xebata me ya çavdêriyê ya têkildarî "Mafê Lîstikê", çavdêriyên qadê, hevdîtinên kûr ên bi dêûbav û muxtaran re wêneyên ku li parkên lîstikê yên heyî derdixin holê ku derbarê qadên lîstikê yên zarokan binpêkirinên mafî yên giran hene. Ji ber ku qadên lîstikê nînin zarok berê xwe didin kuçe û kavilan. Talûkeyên cihên qadên lîstika zarokan û tevgera mezinan a li hember wan di beşa berî vê de hatibûn ravekirin. Lê gava em cihên bo qadên lîstikê tên bikaranîn di çarçoveya zayendiya civakî de dinirxînin newekheviyên girantir derdikevin pêşberî me. Di rapirsî û xabata komnavendî de ku me qîzên zarok re kiriye, derbarê pirsgirêkên lîstina li derve wisa tê gotin:*

“Em ji lawikan aciz dibin. Me ji cihê me radikin û ew tên dilizîn.”(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)

“Li kuçeyê em herî zêde can dilîstin lê niha hem ji ber koronayê hem ji ber ku li derve gelek lawik hene destûrê nadin em bilîzin”(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)

“Lawik tên li me dinêrin, gava birayên me dibînin destûrê nadin em derkevin derve” (Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)

“Li taxê ez hez ji bengiyên madeyan nakim. Tax bo zarokên qîz ne gelekî ewle ye.”(Qîz, Temen 12, Taxa Lalabeyê)

“Qadên lîstikê kêm in. Qadên ewle nînin. êvaran jî ji ber pirsgirêkênronahiyê em dernakevin.”(Qîz, Temen 14, Taxa Cevat Paşayê)

“Li taxê sixefan dikin. Gava lawik li kuçeyê dilîzin bo me destûrê nadin. Û esrarkêş jî hene. Diz jî hene.”(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)

Di serê pêkerên girîng de ku rê li ber bikaranîna qadên lîstikê bo qîzên zarok digirin, qalibên zayendî yên civakî tên. A ku lawik nahêlin qîzên zarok li derve wextê xwe derbas bikin ji wê tê ku lawik mafê bikaranîna kuçeyan bo xwe dibînin. A ku lawik kuçeyan gelekî bo qada lîstikê bi kar tînin sînordarkirina qîzên zarok ji aliyê birayên wan ve bi pejirandina zayendî yên civakî ve girêdayî ye. Lewra di serê rolên sereke yên lawikan de parastina “namûs”a xwişkên wan heye.

Dêûbav derbarê sedemên ku naxwazin qîzên wan li derve bilîzin û talûkeya qadên lîstikê bo qîzan wisa dibêjin:

“Ez qet nahêlim qîza min derkeve derve, ji ber ku lawik li derve dilîzin (Jin, Temen 32, Taxa Dabanoğluyê)

Ez gelekî destûrê nadim qîza xwe. Li derdorê bengiyên madeyan hene, ditirsim ku zererê bidin qiza min.”(Jin, Temen 35, Taxa Dabanoğluyê)

*““A rastî di navbera zaerokan de cudakarî nîne lê qîzên zarok hinekî din, bo çi? Bo qîz in. Yanî li hember lawikan jî li hember jî fasiqtî tê kirin lê di mijara fasiqtiyê de berê me li qîzan e bêhtir. Yanî li hember her duyan jî fasiqtî heye.”(Jin, Temen 40, Taxa Ziya Gökalpê)*

*“Em ji nûçeyan dibihîzin ku tiştên xerab dibin, em gelekî ditirsin ku dê birevînin”(Jin, Temen 35, Taxa Cevat Paşayê)*

*“Fasiqekî ewkê xwe nîşanî qîza min daye. Qiza min bo EBAyê çû ber deriyê cîranan û bi qîrîna wê ez derketim lê zilam reviyabû. Ez ê çawa destûrê bidim bi tena serê xwe derkeve. Li vir kavil hene û li wê derê madeyên hişber dikişînin, ditirsim. Fasiqek li taxa me raselitiye.*

*(Jin, Temen 36, Taxa Ziya Gökalpê)*

*“Di nav kavilan de mirovên ku em wan nas nakin madeyan bi kar tînin. Berê nebû lê niha dizî gelekî zêde ye. Me bihîstiye li van nêzîkan zarokan jî direvînin, ji ber wê em gelekî ditirsin.”(Jin, Temen 45, Taxa Lalabeyê)*

*Dêûbav, sedema ku destûrê nadin qîzên wan li derve wextê xwe derbas bikin, weke bikaranîna kuçeyan a ji aliyê lawikan ve nîşan didin. Sedemek e din jî ew e ku bûne şahidên rûdanên îstîsmarê an jî bihîstine û ji ber vê ji bo parastina wan qîzên xwe yên zarok ji kuçeyan dûr xistine. Dêûbavan gotiye ji ber ku qadên ewle nînin zarokên wan lê bilîzin, naxwazin ji malê jî derkevin.*

*Cihê ku pêşî newekheviyên zayendî yên civakî tevna lê dideyînin mal e, herwiha mal ew cih in ku rolên zayendî yên civakî û wezîfedarkirin jî lê pêk tê û tê xweyîkirin . Bi zarokan re nemaze di qonaxa kamilbûnê de bi guherînên fîzîkî re rolên zayendî û kardabeşî jî zelal dibe. Ji qîzan tê hêvîkirin ku dikarê malê de alîkariya dêya xwe bikin lê ev bo lawikan ne derbasdar e ji wan tê hêvîkirin ku berpirsyariyên têkildarî xwişkên xwe hilgirin milê xwe. Li Sûrê li gel şert û mercên cihî/fîzîkî binyata civakî-aborî û çandî jî hilberîna rolên zayendî yên civakî de bandorker in. Mafê lîstikê yê hemû zarokên li Sûrê tê binpêkirin lê qîz bi sedema newekheviya zayendî ji lawikan bêhtir ji mafê lîstikê bêpar dimînin.*

### 3.3.3. Tiştê Li Taxa Xwe Herî Zêde Hez Jê Dikim

Zarokên li Sûrê dijîn li gel sînordariya qadên şînkayiyê û qadên lîstikê ji ber talûkeya kuçe, kavil, hewşên dibistan û mizgeftan ku bo lîstikê bi kar tînin, dûçarî zexta kesên malbatê û şêniyên taxê jî dimînin. Zarok tevî hemû zehmetiyan girêdayîbûna xwe ya bi taxê re bi van hevokan ravê dikin:

“Bi çêbûna min diya min gurcika xwe winda kir. A ku şîr da min ev tax bû. Ji ber vê gelekî hez ji taxa xwe dikim. Kêfa min tê ku bi hevalên xwe re dilîzim.”(Lawik, Temen 14, Taxa Ali Paşayê)

“Zaf kêfa min tê ku li taxê herkes hevdû nas dike. Êz hez ji çanda kuçeyan û sazgeriya kuçeyan dikim. (Qîz, Temen 15, Taxa Camî-î Kebîrê)

“Cîranên xwe, alîkarî û germahiya dilê wan...”(Lawik, Temen 14, İskender Paşayê)

“Ez li vir xwe baş hîs dikim. Hez ji kuçeyan dikim. Hez ji suran dikim. (Qîz, Temen 14, Taxa Cevat Paşayê)


“Kêfa min ji taxa min re, ji alîkarî û piştevaniya me re tê”( Lawik, Temen 11, Taxa Ziya Gökalpê) “Ez hez ji hevalên xwe û ajalên li kuçeyan dikim. Li ser banê hemberî me pisîk hene, em wan xwedî dikin. (Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)

“Li vê taxê tiştê ku herî zêde hez jê dikim; maleke me heye di wê malê de em bi hemû xizmên xwe re dijîn”(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)



Li gel hemû şert û mercên neyînî ku bandorê li jiyana zarokan dikin, li Sûrê cih û hestên piştevaniyê ku bi ya têkildar cih û rewşejiyana rojane re geşdibin bi zarokan re hesta aîdiyetê ava dike. Li gor ku Küçükkırca jî dibêje, herçiqasî em nikarin bibêjin xelkê Sûrê jiyaneke kolektîf dijîn jî, li Sûrê têkiliyên piştevanî ku ji hejariyê xwedî dibin rengê(cihê) malekê dide Sûrê. (2018:38)

**Tabloya 42.: Tabloya tiştên ku li taxê herî zêde hez jê dikim**




Zarok hezjêkirina taxa xwe bi têkiliyên hevaltiyê, kuçeyên ku bi awayê qadên lîstikê bi kar tînin û çanda alîkarî/piştevaniyê ve girê didin.

### 3.3.4. Ku Min li Taxa Xwe Qadên Lîstikê Ava Bikirana

*“Min dixwest sehayekê basketbolê ava bikim. Min dê kavil bo zarokan bikirana qadên lîstikê “(Qîz, Temen 12, Taxa Cevat Paşayê)*

*“Min nedihişt çopê biavêjin erdê. Min ê rêyabisiklêtan çêkira” (Lawik, Temen 9, Taxa Dabanoğluyê)*

*“Min ê rê li ber destdirêjiya li zarokan bigirta. Minê kamera danîna kuçeyan, gazî polîsan bikira. Min ê parkên zarokan, yên rûniştinê çêkirana. Li vir qadên vala hene; min ê bikirana sehayên futbolê”(Qîz, Temen 13, Taxa Ali Paşayê)*

*“Min dê her der xweşik saz bikira. Min ê xaniyên kavil ji nû ve ava bikirana. Min ê parka zarokan û seheya basketbolê çêkira” (Qîz, Temen 13, Taxa Ali Paşayê)*

*“Min dixwest xaniyên mezin yên bi baxçe û ajal hebin. Li parkê deydik, şemîtonk û zirnezîq hebin.”(Qîz, Temen 10, Taxa Camî-î Kebîrê)*

*“Min ê park çêkira. Bi zarokan bişêwiriyama. Alîkariya astengdaran, a hemû kesan bikira. Min ê gog belav bikirana. Min nedihiş taxa me xera bibe, bo ku madeyên hişber nekevine “(Lawik, Temen 14, Taxa Ali Paşayê)*

*“ Dar, bêhna axê, perperînk… parkeke birêkûpêk.” (Lawik, Temen 13, Taxa İskender Paşayê)*

*“Qadeke lîstikê  ku her kes bikaribê lê bilîze. Parkên şînkayiyê, hewz lê bila avahiyên dîrokî bimînin. Bila di nav parkê de pêlîstok hebin. (Lawik, Temen 12, Taxa Lalebeyê)*

*“Min dê xaniyê hilwelşiyayî ava bikirana. Min dê xaniyên hilweşiyayî ava bikirana. Min dê sehayên futbol û basketbolê… Mizgeft ava bikirana. Min dê diz û ersrarkeş biqewiranda. Min dê li taxa xwe sîrk çêkirana, ez dixwazim herkes bi kêf û şahî bijî.”(Lawik, Temen 13, Taxa Ziya Gökalpê)*

*“Min dixwest li taxa me kitêbxane hebe. Ji ber ku li taxa me tenê parkek heye, her kes diçe wir bi hev diçin”(Qîz, Temen 14, Taxa Cevat Paşayê)*

*Taxa me êvaran ne ewle ye, min dixwest ewletir be”(Qîz, Temen 12, Taxa Dabanoğluyê)*

***"Min dê bo her taxê înternet girê bida, tablet belav bikirana , dibistan çêkirana. Min dê park, hewz çêkirana."(Qîz, Temen 12, Taxa Ziya Gökalpê)***

***" Bila hewz lê hebe, bi hewş be û deriyê wê hebe ku yên xerîb neyên xera nekin. Bila mifta deriyê parkê jî bi me re be (......)***

***"Min dixwest li parka me şemîtonk, zirnezîq, hespik û ew geredolab hebin. Bila lûnaparkeke me hebe"(......)***

*"Bila van kavilan hilweşînin, cihê wan bikin park. Bila xerîb neyên"(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)*

*"Heke em parkekê çêbikin bila pisîk jî lê hebin. Bila cihê pisîkan kûçikan lê hebe"(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)*

*"Bila parkên me mîna lûnaparkekê gelekî mezin be. Bila li ber deriyê wê bekçî hebe ku tu kes xera neke û bila hewz hebe."(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)*

*"Bila bekçiyekî wê hebeku kesên xerîb zererê nedine. Bila qadên sporê hebin. Bo mînak, bila zirnezîq, şemîtonk, deydik hebe"(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)*

*"Bila parkeke me hebe û di nav de sehayên futbolê, voleybolê; hewz û langirt hebin."(Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*

*"Berê me ji we (Komeleya Hêviyên Rengîn-Rengarenk Umutlar Derneği) bisîklêt werdigirt, hefteyekê diajot, ew gelekî xweş bû. Ji ber ku rêya bisîklêtan li vir nîne, bisîklêtên me zû xera dibin. Bi sedema ku em di taxê de diajon, em nikarin xurt biajon. Ku rêya bisîklêtan hebûya kî dizanê mê de çawa xurt biajotana." (Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*

*"Bila bisîklêt hebin. Hewz hebe."(Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*

*"Ez gelekî dixwazim li taxa me havînê hewz, zivistanê cihê mirov xwe lê germ bike, bihêwire hebe. Milet e ên ku maleke wan nîne- havînê li kuçeyan îdare dikin, lê zivistanê? Ku cihê mirov lê bihêwirê hebûna dê yên bêkes zivistanê li wir bi cih bûbana. Bo mînak, dikarin kavilekî ji van bikin sitargeh. Bo mînak bila bo ajalên li kuçeyan j3i kozikan çêbikin. Bo mînak hin dewlemend hene dil nakin pereyên xwe xerc bikin, nikarin kûçikekî jî xwedî bikin"(Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*

*“Min dê parka li taxa me bikira taxeke normal, bo mînak, min dê deydik, şemîtonk, cihê lîstikê, baxçeyê qûmê, qadên lîstikê çêkirana”(Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*

*“Bila di nav parkê de malek hebe, di wê malê de jî lîstik, bo mînak, monopolî… Lîstikên bêzere. Li derveyî parkê sehaya futbolê, basketbolê… Bila parkê jî bekçî biparêzin. Bila bekçî hebe ku ji derveyî taxa me zarok neyên. Lewra ku ji derve bên dê tarûmar bikin. Diz hene mirovên xerab hene ji ber ku”(Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*

*“Bila bekçî hebin, alavên alîkariyê destpêkê, agirkuj, hebe ku pirsgirêk derketin midaxele bikin. Êdî zarok ji ku derê tên bila bên, kêf û şahî mafê wan e jî”(Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*


Beşdaran diya kiriye ku dixwazin li taxên wan sehayên futbol, voleybol, basketbolê hebin da çalakiyên sporê pêk bînin û rêya bisîklêtan jî ji daxwazên wan e ku bikaribin bi ewlehî biajon. Paqijkirin û veguhestina kavilan bo qadêmn lîstikê ku li nav wan dilîzin; hewzên sobariyê bo havînê, bo kêf û şahiyê lûnapark û parkên xwedî taximên lîstikê jî ji daxwazên wan in ku wan diyar kiriye . Zêdekirina bergiriyên ewlehiyê yên mîna avakirina mekanîzmeya kamerayê li kuçeyan û sazkirina ronîkirina kuçeyan li qadên bo ewlehiya zarokan bi taluke ji bo rêlibergirtina rûdanên îstîsmar û îhmalê ji wan daxwzan in ku beşdaran aniye zimên.

Herwiha sedema ku nemaze li Sûrê li nav xaniyên kavil, bikaranîna alkolê, bengîtiya madeyan û ji bilî van dizî jî metirsiyên civakî ne ku beşdar gelekî dixwazin ev rewş biguhere. Hin zarokan jî bi xemgînî diyar kiriye ku dixwzin bo bêkesan sitargehan ava bikin û ajalên li kuçeyan jî ji bîr nekirine û xwestine bo pisîk û kuçikan jî kozikan çêbikin. Bi sedema ku derbarê qadên lîstikê yên li bajêr û xebatên têkildarî zarokan bi wan naşêwirin û beyî wan biryaran digirin, hatiye diyarkirin ku mafê zarokan ê beşdarbûnê tê binpêkirin. Hem di rapirsiyan de hem di hevdîtinên komnavendî de peyva “yên xerîb” çend caran hatiye dubarekirin, pirsa “Bo çi hun dibêjin bila yên xerîb neyên û xerîb kî ne?” hatiye kirin.Zarokan derbarê vê aniyê zimên ku gava diçin qadên lîstikê yên taxên din li hember wan bi cudakerî tevdigerin û ew hemû zaerokên derveyî taxê qest dikin.

“Ez , birayê min û pismama min li Sûrê bi hev re çûn perkekê. Li wir qîz û lawik hebûn. Birayê min xwest bikeve deydike. Me jî got “Ma em dikarin bikevine?”, gotin, “Na hûn nekevine, malên we ne li vir in, hûn herin malê xwe”. Ji ber ku wan ji mira wisa got, em jî naxwazin xerîb bên parkê.”(Ji xebata komnavendî ya bi qîzan re)

*“Mafê lîstikê tê wê maneyê ku mafê herkesî yê lîstikê heye. Alavên me yên lîstikê yan ben an gog in. Bo mînak gava em bi gogê dilîzin dixeyidin, dibêjin”Nelîzin”. Destûrê nadin em bilîzin, û ji xwe nahêlin em biaxivin jî. Ez çûm cem mala meta xwe, nêzî mala wan perkek hebû, gava bo lîstikê çûm wir, nehiştin ez li wir jî bilîzim. Ev çawa “mafê lîstikê”ye nizanim.”*
*(Ji xebata komnavendî ya bi lawikan re)*

Bersivên pirsa hûn li taxa xwe qadên “çawa” dixwazin , derbarê rewşa qadên lîstikê yên heyî jî agahiyan didin me. Gotinên zarokan ên derbarê vê didin xuyakirin ku qadên lîstikê ji ewlehiyê dûr in û bo zarokan ne sûdwer in. Techîzatên ku divê li qadên lîstika zarokan hebin, bi qasî di televizyonê de temaşe dikin an di serdana xizmekî derveyî Sûrê de bibînin, nêzî wan in. Mafê lîstikê yên zarokên Sûrê bi rengê xwe yên niha ji rêgeza wekheviya fersendî dûr e û mafek e ku bi temamî tê binpêkirin.



# ENCAM Û PÊŞNIYAZ

Hejariya bajêr ne tenê têkildarê dahatê ye, dibe sedema gelek pirsgirêkên civakî jî. Zarokên li taxên bajêr yên hejar dijîn, girêdayî guherbarên mîna temen, zayend, nasnameya etnîk ew beş e ku bi talûkeyan rû bi rû dimîne li gel mafên pênasekirî îroroj li cîhanê îstîsmara li hember zarokan didome, zarok di şer de dimirin, mecbûr dimînin koç bikin û ne pêkan e rê li ber karkeriya zarokan bê girtin (Stearns, 2018:7). Jiyana di xaniyên bikêrnehatî de, vederkirina civakî, xwedîbûna nesazkar/kêm û sûdwernegirtina ji mafê lîstikê û xwenegihandina perwerdehiyê çend newekhevî ne ku mirov dikare rêz bike.

Daneyên xebata qadê ya di çarçoveya mafê lîstikê de didin xuyakirin ku rêvebiriyên heremî bi awayekî gelekî eşkere wezifeyên xwe, berpirsiyariyên xwe nayînin cih.

Li gor daneyên 2019an tevahiya nifûsa 15 taxên li Sûrê 38156 e û tevahiya firehiya van taxên jî 1500 donim e. Li cihekî wisa fireh ku tene çend taximên lîstika zarokan hebin û ji van taximan tene sê bên bikaranîn, girîngtirîn nişane ye ku qîmet bi zarokan û mafê zarokan nayê dayîn. Li gel vê, daneyên bidestxistî nîşan didin ku veguherîna bajarî û pevçûnên çekdarî bi bandorên mezin yên li qada jiyana zarokan re di çarçoveya mafê lîstikê de jî bandorên curbicur kirine. Di serî de, meseleya ku zarok mecbûr mane taxa xwe biguherînin jî, pirsgirêkên mîna elimandina derdoreke nû û hînbûna qadên lîstikê yên nû bi xwe re anîne. **Ji ber vê, gava pêşî ew e ku mezin û zarok hemû welatî bi hev re biryaran bigirin.**

Di vê çarçoveyê de bo ku rêvebiriyên herêmî mafên zarokan bi cih bikin, divê;

- Di seri de bo zarokan, bo yên ku xizmeta lênerîne dikin û hemû aktoren herêmî, têkildarî bicihkirina mafên zarokan xebatên agahdarî û lêhaybûnê bên kirin.
- Rêgezên xebata Bajarên Dostên Zarokan ku ji aliyê UNICEFê ve hatiye destpêkirin li Dîyarbekirê bên guherîn û bicihkirin.
- Girêdayî rêvebiriyên hêrêmî "Rêvebiriya Mafên Zarokan" bê damezirandin ku xebatên derbarê mafên zarokan bike û bo wê têra xwe budçe bê veqetandin.
- Girêdayî revebiriyên herêmî meclîsên zarokan bên damezirandin û rêziknameyên têkildarî mecbûriyata biryarên meclîsên zarokan bên amadekirin
- Nexşerêyên stratejîk û çalaki aresteyî zarokan bin û bi wî awayî bên amedekirin ku li zarokan bên.
- Li her navçeyê alîkariya rêxistinên civakî yên sivîl bê kirin ku derbarê mafên zarokan xebatê dikin, hevkariya bi van saziyan re bê xurtkirin û komîsyonên mafên zarokan bên damezirandin ku rêvebiriyên heremî pêşengiya wan dikin.
- Lijneya Koordînasyonê ya Parêzgehê ya Parastina Zarokan bi wî awayî bê sazkirin ku bo rêxistinên civakî yên sivîl û beşdarbûna zarokan a bi dilxwazî vekirî bin.

- Li her taxê, li gor nifûsa zarokan kitêbxaneyên pêlîstokan bên avakirin.
- Li gor temenê zarokan kursên civakî-çandî û hunerî bên zêdekirin ku bo geşedana wan dibin alîkar, behreyên wan didin der û hûnerweriya wan bi pêş dixin.
- Ji aliyê rêvebiriyên heremî ve, di her çalakiyên rasterast têkildarî zarokan de xebatên pîvan-nirxandinê bên kirin da ku bandora çalakiyan bê ferqkirin.
- Bi daneyên xebatên qadê tê xuyakirin ku di 10 salên dawî de, nemaze di qonaxa veguherîna bajarî de biryarên hatine girtin, di çarçoveya mafên zarokan de bandoreke neyînî li zarokan dikin.

**Divê biryarên di vê çarçoveyêde di ber çawan re bên derbaskirin:**

- Divê biryara Gelemperîkirina Lezgîn bê betalkirin û ji aliyê welatiyan ve bê niqaşkirin.
- Projeyên veguherîna bajarî yên plankirî bên betalkirin, bo sazkirina avahiyên bitalûke modelên veguherînê yên alternatîf bên sepandin
- Divê di Qanûna Avadaniyê ya bi hejmara 3194an û rêziknameya derbarê esasen plansaziyê de, mafê zarokan ê lîstikê bi zelalî bê penasekirin û standartên derbarê çekirina cihên lîstikê li gor rêjeya nifûsa zarokên taxê bên sazkirin.
- Divê qadên şînahiyê yên ku KAİPê (Plansaziya Avadaniyê a bo Parastinê) diyar kirine bikaribin bên bikaranîn û di nav van qadên şînahiyê de taximên listikê yên zarokan bên çêkirin.
- Zarok, bi sedema ku qadên lîstikê kêm in, bêewle û bêxwedî ne, nikarin wextê xwe gelekî li parkên lîstikê derbas bikin. Ên ku diçin parkan jî bi gelek talûkeyan ve rû bi rû dimînin, li herêma Sûrê ku me li 7 taxên wê xebata çavdêriyê kiriye, divê qadên lîstikê bi lez bên sazkirin û başkirin.
- Li gor daneyên bidestxistî, şaredarî gava ku plansaziya parkên lîstikê bikin, divê;
- Di serî de li gor standartên Enstîtuya Standartên Tirkî tevbigerin.
- Di nav şînahiyê de parkên lîstikê bên avakirin ku zarok bikaribin bi wan kesan re jî biçin ku li wan dinêrin.
- Cih bi wî awayî bên sazkirin ku hemû zarok, yên li kuçeyan, koçber, yên Ji etnîsîteyên cuda ku pêdiviyên wan ên cihê hene, jê sûd werbigirin.
- Bo ku taximên lîstikê yên li parkan bi kêrî hemû zarokan bên, plansazî li gor komên temen bê kirin.
- Parkên zarokan li qadên kolanên mezin neyên çekirin, li parkên nezî kolanên mezin peyarê û ronahiyên hatûçûnê berî kêliyekê bên dabînkirin.
- Park nêzi cihên xerabûyî neyên avakirin, ev qad bên tesbîtkirin û lewhayên hişyarker bên danîn û dora wan bê sênckirin.
- Parkên lîstikê bi wî awayî bên sêwirandin ku zarok bi dê û bavên xwe re an jî bi yên li wan dinêrin re bikaribin biçinê.

- Girîngî bi ronîkirina parkan bê dayîn,
- Mekanîzmayên agahdarî û îxbarê bên sazkirin ku mafê wan hat binpêkirin bikaribin serî li meqamên têkildar bidin.
- Avahiyên terkkirî/kavil ên li Sûrê veguherin qadên lîstika zarokan an qadên çand, huner û sporê.

Cihek ji yên ku zarok dikarin lê bilîzin jî mal in. Lêbelê daneyên xebatên qadê didin nîşan ku hema beje nîvê zarokan gava li malê dilîzin, qezayan dikin. Tê zanîn ku her sal gelek zarok ji ber qazayên nav malê jiyana xwe ji dest didin. Ji ber vê, divê bo ewlehiya fîzîkî ya zarokan li malê jî standartên mîna parkên lîstikê bên bicihanîn. Divê neyê jibîrkirin ku mirov dikare rê li ber van binpêkirinan bigire û derbarê vê, dewlet berpirsiyar e ku mirovan agahdar bike.

Zarok, bi sedema ku bo lîstikê weke cihekî alternatîf kuçeyan bi kar tînin ji aliyê şêniyên taxê ve tên azirandin. Ji ber ku hem li malê hem li derve/ kuçeyan qadên lîstikê tên sînordakirin, zarok mecbûr dimînin avahiyên kavil bi kar bînin. Weqayên li nav avahiyên kavil ku di xebata qadê de gelekî hatine ragihandin ne tenê zarokan, hemû şêniyên taxê ditirsînin. Sazkirin, kontrolkirin û ewlehiya avahiyên terkkirî/kavil ku piştî pêvçûnên çekdarî yên di navbera 2015-2016an de zede bûne, lezgin e

**Di vê çarçoveyê de;**

1. Divê pêşniyazên zarokan ên têkildarî avahiyên terkkirî/kavil bên bicihkirin.
2. Divê rê li ber bê girtin ku tu kes nekeve avahiyên terkkirî/kavil.
3. Divê derdora avahiyên terkirî/kavil yên li ber xerabûnê bê sênckirin an jî lewhayên hişyarker bên danîn.
4. Berî kêliyekê têkoşîna li hember bengîtiya madeyan ku şêniyên taxê jî behsa wê dikin bi awayekî rasteqîn û hêjariyê jî li ber çavan digire, bê plankirin.
5. Divê li îdîayên şideta zayendî ya li hember zarokan bê vekolîn.

**1. Berpirsiyarîya pêşane ya van cureyên cudakeriyê aîdê dewletê ye û encama polîtîkayên dewletê yên kêm in.**

**Ji ber vê,**

Li gel ku bo ewlehiya kuçeyan xebat bên kirin, li Sûrê sazkirina xebatên derbarê wekheviya zayendî ya civakî jî berpirsiyariya pêşane ya qada giştî ye.

Avakirina qadên lîstikê bo zarokên astengdar û herwiha jinûvesazkirina hemû herêmên her bajarî li gor astengdaran berpirsiyariyek e ku divê dewlet di çarçoveya qedexekirina cudakeriyê de gavekê bo vê biavêje.


Divê tekildarê cudakeriya li hember zarokên koçber xebat bên sazkirin ku jiyana bi hev re derdixin pêş.

Gava em bên ser xeleka berpirsayariyê ya derbarê encam û pêşniyazên li jor rêzkiri, divê em bêjin berpirsiyarî, pêşî ya Wezareta Malbat, Xebat û Xizmetên Civakî ye ku koordinasyona parastina zarokan li ser wê ye û em gazî sazgehên herêmî yên girêdayî wezaretê dikin ku bo bicihkirina berpirsiyariyên koordînasyonê wezîfeya xwe bikin. Herwiha ji ber rola xwe ya plansaziya bajêr berpirsiyariya Parêzgariya Diyarbekirê jî gelekî zede ye. Di vê çarçoveyê de gelekî girîng e ku parêzgarî bi rêxistinên civakî yên sivîl re hevkariyê bike. Medya jî di wî warî de ku mafê lîstikê yê zarokan bêhtir bixe rojevê û lêhaybûneke mafî pêk bîne û hişsaziyeke civakî diyar bike xwedî berpirsiyariyeke mezin e. Ji ber vê jî gelekî pêwîst e ku medya, têkildarê mafên lîstikê yên zarokan naverokan hilberîne û zimanekî mafparêz bi kar bîne.

Li gel vê, em dizanin, xebatên hevpar yên gelek rêxistinên civakî yên sivîl ku di qada mafên zarokan de çalakiyan li dar dixin, bi tayînkirina qeyûman bo şaredariyên Diyarbekirê hatin betalkirin. Ji ber vê, sazkirina qanûnan da ku xebatên mafparêz yên derbarê mafên zarokan ji aliyê rayedarekî ve bi awayekî keyfî neyên rawestandin pêdiviya herî pêşî ye û di heman demê de berpirsiyariya dewletê ya girêdayî Peymana Mafê Zarokan e.

PMZ, şîrovekirina keyfî ya xebatên ku bingeha xwe ji fêdeya mezin a zarokan digirin weke binpêkirineke eşkere pênase dike. Ev rewş, xalên 17,29 û 30. ku di PMZyê de mafê zimanê zikmakî nîşan didin û Tirkiyeyê îhtiraz li wan kiriye jî vedihewînin. Divê Tirkiye guh bide bangewaziyên derbarê paşvekişandina îhtîrazan yên ji aliyê Komîteya Mafên Zarokan û îhtîraz berî keliyekê bên rakirin.

Divê rêxistênên civakî yên sivîl, sendîka, odeyên pîşeyî û lêkolînerên xweser yên li Diyarbekirê jî mafê zarokan bixin rojeva xwe, derbarê windabûna maf û newekheviyên têkildarî mafê zarokan ku mafê herî girîng e di jiyana zarokan de, bi armanca bibîrxistina berpirsiyariyan zextê li otorîteyen qada giştî bikin.



# Fotoyên Qadên Lîstina Zarokan Li Nava Sûran: Park û Kuçe

Fotoyê 8.: Koma lîstikê ya zarokan a Taxa Camii Kebirê



Fotoyê 9.: Koma lîstikê ya zarokan a İskender Paşayê



Fotoyê 10.: Parka lîstikê ya Taxa Dabanoğluyê



Fotoyê 11.: Parka lîstikê ya Taxa Ali Paşayê



Fotoyê 12.: Parka lîstikê ya Taxa Melik Ahmetê



Fotoyê 13.: Parka lîstikê ya Taxa Lalebeyê



Fotoyê 14.: Kuçeyek li Taxa Dabanoğluyê



Fotoyê 15.: Kuçeyek li Taxa Ziya Gökalpê



Fotoyê 16.: Kuçeyek li Taxa İskender Paşayê



# Pêvek

## Tabloya 43.: Nifûsa tevahî ya li gorî salan a taxên nava sûran


| Tax | 2010 | 2011 | 2012 | 2013 | 2014 | 2015 | 2016 | 2017 | 2018 | 2019 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Abdaldede | 1.189 | 1.127 | 1.126 | 1.096 | 981 | 896 | 881 | 811 | 781 | 715 |
| Ali Paşa | 4.981 | 4.563 | 4.184 | 3.567 | 3.285 | 2.985 | 2.963 | 2.324 | 1.711 | 1.481 |
| Cami Kebir | 1.907 | 1.813 | 1.680 | 1.458 | 1.380 | 1.265 | 1.218 | 1.129 | 1.004 | 897 |
| Cami Nebi | 2.899 | 2.804 | 2.796 | 2.624 | 2.562 | 2.437 | 2.273 | 2.157 | 1.970 | 1.961 |
| Cemal Yılmaz | 2.845 | 2.780 | 2.580 | 2.476 | 2.393 | 2.104 | 2.084 | 1.976 | 1.822 | 1.595 |
| Cevat Paşa | 4.200 | 4.034 | 3.740 | 3.418 | 3.350 | 3.256 | 3.297 | 3.070 | 2.754 | 2.639 |
| Dabanoğlu | 4.456 | 4.484 | 4.361 | 3.968 | 3.964 | 3.705 | 3.908 | 3.735 | 3.452 | 2.940 |
| Fatih Paşa | 7.640 | 7.005 | 3.557 | 6.135 | 5.989 | 5.153 | 5.096 | 4.829 | 4.590 | 3.879 |
| Hasırlı | 8.208 | 7.844 | 7.361 | 6.879 | 6.712 | 5.696 | 5.599 | 5.416 | 5.128 | 4.267 |
| Iskender Paşa | 8.135 | 7.864 | 7.627 | 7.298 | 7.101 | 6.720 | 6.459 | 6.059 | 5.769 | 5.179 |
| Lalabey | 4.737 | 4.279 | 3.765 | 3.425 | 3.300 | 3.000 | 2.853 | 2.493 | 2.120 | 1.951 |
| Melikahmet | 8.214 | 7.983 | 7.418 | 7.231 | 6.985 | 6.793 | 6.427 | 5.906 | 5.592 | 5.787 |
| Savaş | 3.358 | 3.330 | 3.162 | 2.934 | 2.776 | 2.409 | 2.402 | 2.295 | 2.178 | 1.861 |
| Süleyman Nazif | 697 | 678 | 656 | 599 | 568 | 514 | 513 | 450 | 421 | 397 |
| Ziya Gökalp | 4.364 | 4.262 | 4.102 | 3.947 | 3.681 | 3.408 | 3.260 | 3.052 | 2.865 | 2.607 |
| **Tevahiya nava sûran** | **67.830** | **64.850** | **58.115** | **57.055** | **55.027** | **50.341** | **49.233** | **45.702** | **42.157** | **38.156** |

Çavkanî: Daneyên ku di tabloyê de cî digirin, ji adresa https://www.nufusune.com hatine wergirtin û li gorî salan hatine sererastkirin. Taxên ku di çarçoveya lêkolînê de xebata qadî lê hatine meşandin, rengîn hatine nîşandan.

## Tabloya 44.: Lîsteya kontrolê ya qadên lîstikê

| BERNÎŞANE | Erê | Na |
|---|---|---|
| Li nêzîkî parka lîstinê kolaneke sereke yan rêyek ku erebe zêde tê re derbas dibin, heye? | | |
| Li ser rêya parka lîstinê derbasoka peyayan, îşaretên rêya peyayan yan lembeya trafîkê heye? | | |
| Raxera zemîna parke kauçuk e? | | |
| Li derdora parkê, ti avahiyek ku talûkeya wê ya xerabûnê heye? | | |
| Heke li nêzîkî parkê tesîsata elektrîkê hebe, rîska ewlehiya canî dihewîne? | | |
| Park ji bo xwegihandin û kêfûşahiya zarokên ku ji aliyê dîtinê, bihîstinê û fizîkî ve berasteng in, guncav e? | | |
| Park ji bo lîstina bi hev re ya zarokên qîzîn û lawîn derfetan û qadan dabîn dike? | | |
| Park, li gorî zarokên lawîn hatiye verastkirin? | | |
| Park ji bo ku malbatên zarokan jî ligel wan wext derbas bikin derfet û qadên rûniştinê dihewîne? | | |
| Li derdora parkê ji bo pêdiviyên weke tiwalet û ava paqij a vexwarinê xizmetin hene? | | |
| Li parkê li hemberî binpêkirinên mafine zarokan, mekanîzmayên gilîkirinê(ewlehî, qutiya gilîkirinê, xeta îxbarê û wd.) hene? | | |
| Li nêzîkî parkê çal an înşaat hene ku bibin rîsk? | | |
| Heke li nêzîkî parkê çal an qada înşaatê ku bibe rîsk hebe, bi şirîdên ewlehiyê û bariyeran hatiye dorpêçkirin? | | |
| Yekeyên komên lîstinê yên li parkê da ku nebin rîsk û rewşeke awarte dernexin holê, bi awayeke birêkûpêk hatine montekirin? | | |
| Komên lîstinê yên li parkê, bi awayek ku zarok ji jor ve nekevin hatine danîn? | | |
| Di malzemeyên lîstinê yên li parkê de navberên cax an valahiyan li gorî ku zarok serê xwe, çîpên xwe, milên xwe û wd. nexinê hatine çêkirin? | | |
| Park li qadeke şênkehî hatiye avakirin? | | |
| Park, bi rêyên meşê û pisqilêtê hatiye destekkirin? | | |
| Li parkê sîbereke bi têra xwe heye? | | |
| Li parkê ronahiyeke têra xwe heye? | | |
| Malzemeyên li parkê paqij in? | | |
| Li parkê amûrek xerabûyî yan divê bê temîrkirin heye? | | |
| Park, malzemeyên ku xîtabî temenên cuda bike dihewîne û têra xwe mezin e? | | |
| Bilindahiya amûrên li parkê, guncav e ku zarok gava ji jor ve bikevin, bi awayeke cidî birîn nebin? | | |
| Li parkê, qoqiz û quncik hene gava ku zarok lê biqelibin û pê birîn bibin? | | |
| Li parkê, zemîna ku zarok ji jor ve bikevin ser, xwedî wê taybetmendiyê ye ku derbeyan nerm bike? | | |
| Li ser dereceya zoriyê qadên lîstinê yên li parkê û li ser temenên ku xîtabî wan dike, lewhayên agahdariyê hene? | | |
| Li nêzîkî parka lîstinê qereqol an avahiyek ku hêzên ewlekariyê bi awayeke aktîf bi kar tînin, heye? | | |
| Li hundirê parkê, wesaîtên zirxî timî hene? | | |


Xerîteya 1. Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê ya ku piştî pevçûnan ji bo hatine revîzekirin



Xerîteya 2. Plansaziya Îmarê Ya Bi Armanca Parastinê - Xerîteya qadên şênkahî



## Xerîteya 3. Xerîteya taxên nava sûran



# Çavkanî


1. Bauman, Z. (1999). *Çalışma Tüketicilik ve Yeni Yoksullar.* İstanbul: Sarmal Yayıncılık.
2. Birleşmiş Milletler Çocuk Hakları Komitesi. (2013). *Devletin Yükümlülüklerinin Niteliği ve Kapsamı,* Genel Yorum. Çev: Uluslararası Çocuk Merkezi.
3. Çakırer-Özservet, Y. (2018). Çocuğa Yerelden Bakmak ve Çocuğu Yerele Katabilmek Mekanda Adalet ve Çocuk. *Mekanda Adalet ve Çocuk.*
4. Dereli, M., & Uludağ, G. (2015). Bir Hak Olarak "Oyun": Çocukların Oyun Hakkı. *Çoluk Çocuk Anne Baba Eğitimci Dergisi, 26-27.*
5. Dolu, T. (2014). Katılımcı Yerel Yönetimler ve Kent Konseyleri. E. İ. İzci içinde, *Katılımcı Yerel Yönetim.* İstabul: Kalkedon.
6. Ed:İhsan Işık. (2013). *Diyarbakır Ansiklopedisi.* Ankara: Elvan Yayınları.
7. Enşici, B. A. (2018). Çocuk Dostu Kentler İçin Mekansal Yaklaşımlar. *Mekanda Adalet ve Çocuk* .
8. Güneydoğu Anadolu Bölgesi Belediyeler Birliği. (2016). *Sur'da ilan Edilen Sokağa Çıkma Yasakları ve Yaşanan Sürecin Kadınlar ve Çocuklar Üzerindeki Etkisine İlişkin Gözlem ve Tespit Raporu.* GABB.
9. Korkmaz, N., Gündoğdu, F., & Yaklav, G. (2020). *Sur'da Göç Sonrası Ebeveyn Çocuk İlişkisi.* Diyarbakır: Lotus Genç Alan Derneği.
10. Küçükali, A. (2015). Çocukların Oyun Oynama Hakkı ve Değişen Oyun Kültürü. *Erzincan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi,* 1-14.
11. Küçükkırca, İ. A. (2018). *Suriçi'ni Ev Mekanı Üzerinden Düşünmek.* Diyarbakır: DİSA.
12. Sarıaslan-Senyen, H. M., & Erdoğan, E. (2019). Kamusal Çocuk Oyun Alanlarında Güvenliğin Avrupa Standartları Üzerinden Değerlendirilmesi. *Bartın Orman Fakultesi Dergisi.*
13. Severcan, Y. C. (2019). Kent Araştırmaları ve Çocuk Dostu Şehir Girişimlerinde Çocuk Katılımı. *Mekanda Adalet ve Çocuk.*
14. Stearns, P. N. (2018). *Çocukluğun Tarihi.* İstanbul: Dedalus Yayınları.
15. Tandoğan, O. (2014). Çocuk İçin Daha Yaşanılır Bir Kentsel Mekan: Dünyada Gerçekleştirilen Uygulamalar. *MEGARON,* 19-33.
16. Temur, N. (2017 Temmuz). Türk Kültür Dünyasında Kudhurçuk'tan Kovırsak'a: Kazak Kukla Sanatı. *Eskişehir Osmangazi Üniversitesi Türk Dünyası Uygulama ve Araştırma Merkezi Estüdam Eğitim Dergisi.*

17. TMMOB Diyarbakır İl Koordinasyonu. (2016). *2015-2016 Yıkılan Kentler Raporu.* Diyarbakır: TMMOB Diyarbakır İl Koordinasyonu.

18. Türkiye İnsan Hakları Vakfı. (2019). *Çatışma Dönemlerinde Çocuk Hak ihlalleri Raporu.* Ankara: TİHV.

19. Uluslararası Çocuk Merkezi. (Nisan 2006). *Birleşmiş Milletler Çocuk Hakları Komitesinin Çocuk Haklarına dair Sözleşme'ye İlişkin Genel Yorumları.* Ankara.

20. Yılmaz, S., & Bulut, Z. (2002). Kentsel Mekanlarda Çocuk Oyun Alanları Planlama ve Tasarım İlkeleri. *Atatürk Üniversitesi Ziraat Fakültesi Dergisi,* 345-351.

## Çavkaniyên Elektronîk

1. https://www.researchgate.net/publication/274964141_Cocuk_Dostu_Belediyecilik https://www.researchgate.net/publication/312497150_Cocuklar_Icin_Katilimci_Yerel_Yonetimler

2. https://www.researchgate.net/project/Cocuk-ve-Kent

3. https://www.researchgate.net/publication/312497433_Istanbul_Butununde_Yerel_Yonetimlerin_Stratejik_Planlama_Anlayisinin_Cocuk_Uzerinden_Irdelenmesi

4. https://www.researchgate.net/publication/282322535_Cocuklarin_Sehre_Katilimi_Bursa_Yerel_Yonetimleri_Uzerinden_Bir_Okuma

5. https://www.researchgate.net/project/Yerel-Yoenetim-ve-Katilim

6. https://ailevecalisma.gov.tr/chgm/haberler/cocuk-haklari-izleme-ve-degerlendirme-kurulu-toplandi/

7. https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/68588

8. http://www.sp.gov.tr/tr/stratejik-plan/s/2662/Sur+Belediyesi+_Diyarbakir

9. https://www.researchgate.net/publication/331258331_STRATEJIK_YONETIM_YAKLASIMI_VE_ISTANBUL_BUYUKSEHIR_BELEDIYESI_STRATEJIK_PLANLARI_UZERINE_BIR_INCELEME_THE_APPROACH_OF_STRATEGIC_MANAGEMENT_AND_A_REVIEW_OF_STRATEGIC_PLANS_OF_ISTANBUL_METROPOLITAN_MUNI